



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ

Kovara Dumehane
Sal: 7 Hejmar - 38
Tîrmeh - Gelawêj 2011

Xwedî û Berpirsiyariya Nivîsaran
Mehmet Aydın ALÖKMEN

Edîtor
Elixan LORAN

Redaksiyon
Serwet DENÎZ, Feratê DENGİZÎ, Omer FÎDAN

Mizanpaj û Berg:
Elixan LORAN

Wêneyê Bergê
Pira Mala Badê

Şewirmendê Hiqûqê
M. Nuri DENÎZ

Çapxane: Berdan Matbaası:
Davutpaşa Cd. Güven Sanayi Sitesi
C Blok No: 239 **Topkapı/İSTANBUL**
Tlf: 0 212 613 12 11

Navnîşan
Kalem Sk. No: 32/4 Huzurevleri
Kayapınar/DİYARBAKIR

Tel & Faks: +90 412 237 43 16

E-Mail
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

ISSN: 1309-1476

Şertên Abonetiyê
Nava Welat, salek: 30 TL
Welatên Dereke, salek: 70 EURO

Nimroya Hesabê IBAN'ê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakır

TL: TR190006400000183002114889

EURO: TR420006400000283000737070

USD: TR520006400000283000737084

Nimroya Hesabê PTT'ê
Mehmet Aydın ALÖKMEN
590 24 36

- Ji edîtor / 2
- Hevpeyvîn bi Ehmed Huseynî re- **Elixan LORAN** / 3
- Ji Seamus Heaney sê helbest - **Kawa NEMIR** / 9
- Ji te dûr im lê bi te heme - **Enwer EHMED** / 12
- Xwenasîn - **Hecî NEHSAN** / 13
- Payîz- **Fatma OZALP** / 14
- Sê helbest- **Emer YAMAN** / 15
- Awir - **Şêxo FÎLÎK** / 16
- Manîk-depresîf - **Nazê YERLÎKAYA** / 18
- Nêrînen te niqutîn çavên min - **Xezal DÊRIKÎ** / 18
- Helbest û ziman - **Kamran Simo HEDILÎ** / 19
- Serdema Xwedayên serpêl- **Seydo OZKAN** / 26
- Boça kutikî - **Azîz NESÎN** / 27
- Zarok û cejn - **Fahrî KARAKOYÛNLÛ** / 30
- Tîştonek - **Zekî AKDAG** / 31

- Dosye - **Silîva / Farqîn** / 32
- Farqîna zaroktiya min - **Zana FARQÎNÎ** / 33
- Hevpeyvîn bi Şaredar Fadil Erdede re- **Janbijan AR** / 37
- Rûşenî û dilgeşiya Silîva - **Omer FÎDAN** / 39
- Farqîn: cayê zafkultûr û medenîyetî - **Mehmûd NÊŞITE** / 43
- Ne Farqîn, Silîva- **Feratê DENGİZÎ** / 45
- Dînen Farqînê - **Osman PLATÎN** / 47
- Payîtexta efsaneyan Farqîna Ziliyan - **Ayhan MERETOWAR** / 49
- Farqîn - **Şêrgo FÎDAN** / 54
- Sal çûn dem bihurî - **Kîbar OZBEY** / 54
- Îsa Şans û rojnameya "Silvan Sesî" **Rojen BARNAS** / 55

- Xwarineke bi xawên - **Zerzeng** / 57
- Lêgerîna peyvên wînda - **Rojhat ŞAXÎ** / 58
- Tîrs sar e - **Omer DILSOZ** / 60
- Berdêlî - **Îsmail DÎNDAR** / 61
- Pembûreş - **Gulistan BARAN** / 62
- Dehla gilyasan - **Ehmed TARÎ** / 63
- Evînen dijîtal - **Berfo BARÎ** / 67
- Du helbest - **Şabeddîn YEŞÎLMEN** / 71
- Jin di helbestên Cegerxwîn de -II- - **Mehmûd BADILLÎ** / 72
- Dostanî - **Cihan ROJ** / 77
- Şev e - **Dilşêr BÊWAR** / 77
- Kurtedosye - Peyv, biwêj an jî mamikên zaroktiya nivîskar / 78
- Seglawî - **Barana NÛR** / 79
- Xaçepirsa Sînemaya Kurdî - **Ozgur AMED** / 80

*Nivîsên ku ji bo weşanê ji kovarê re tên şandin, li xwediyên wan nayên vegerandin.
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

Dostoyewskî dibêje ku “her mirov, li hemberî her kesî/ê ji her tiştî berpirsiyar e.” Îro di vê geremola holbûna sermayedariya ne bi xwêya eniyê, etnosantrîka ji nava xwe têr (yên ku neteweya xwe wekî navenda her tiştî dibînin), mehdxelîna exlaqî, bejnkurtiya cihanî, keysbaziya ji bo key û keybanûtiya gerdûnê dike ku toqa derdorên din ji têkeve stûyê me kurdan. Van xir û ciran kirine ku em kurd, birayê biçûk ê cîhanê, wekî birayê biçûk ê çîrokên kurdî rastiyê, bedewiyê, dadweriyê, dilpakiyê nîşanî birayên xwe yên din bidin! Ev, a derveyî konê me bû...

Di ya hundirê kon de ji ev yek bê ronî xwe li devê deriyê rûyê me dixê ku em ji xal û xetên peyvê, ji rewanbêjiya hevokê, ji xamoşiya 28 darbestên helbestî, ji xeberoşkên wekî teniyeke dehwa mehê li eniya me didan, ji devokên devliken, ji zaravayên mîna zavayan, ji dengdaniya ku li Kurdistana me diçe, ji kevirên Gever, Wan, Amed, Nisêbîn, Bazîdê ku dişibin kevirên kuçeyên Fransaya 1968'an ku wan ji digotin “kevirên peyarêyan rakîn di dewsa wan de hûn ê riya ku diçe peravan bibînin”; ji perperik, pelîtank, pinpinîk, perwane, minminîk, baperik, îdîdok, belîtang, bilbilitank, belatînk, perperok, firfirok, pepûle, mînmînik, pînpînik, pelpelîsk, pilpilîng, pinpinî, sîperik, belbelitanîk, pîrpîrînk, pîtanok, mînik, pîrik, perpereng, papelîskê, ji “bilinmeyen dil”ê, ji Morcela, miclewri, mijlewri, mijloli, miclor, miclol, mijlor, mijlori, mijlowri, mijmewli, mîyercila, mocla, mojla, muejla, mojle, molcela, molcila, morcila, muercela, muerceli, mercueli, merjueli, morzela, mijlewreki, mijloki, mîlorçike, mîloçike, muloçike, muleçike, ji benda hîlbijartinê, ji serbilindiya Ehmedê Xanî, ji sewdaseriya Melayê Cizîrî, ji kezepperitandina ji ber neteweperweriyê ya Hecî Qadirê Koyî, ji qendîl û Qendîlosa Ehmedê Huseynî, ji sindoqa boyaxê ya Seyîdxanê Boyaxçî, ji qesîdeyên Hafîz Menduh, ji qereqolên gir û serê rîyan, ji her heft çîrokên hîrçê yên bi kurdî; ji Xerzanî, Xilpanî, Bablekan, Eyşokê, Delîlo, Du ling, Bazkî, Çepik, Sê ling, Kîçe, Keçikî, Hildanî, Şêxanî, Dûzo, Giranî, Dîko, Koçerî, Ziravkî, Tûra, Qerecor, Tîr kevan, Sînanî, Sivikî, Giranî, Şûndekî, Qertel, Temir axa berpirsiyar in. Ev spartin kostekqetandina rihê me ye da ku di govenda azadiyê de serbestî bi destê me bigire.

Ji her kesî ve eyan e ku Eniya Ked, Azadî û Demokrasiyê şev û roj li xwe haram kirin, ji bo azadî û serbestiyê xebitîn û 36 parlementerên hêja şandin Enqereyê. Hêjayî gotinê ye ku divê mirov vî gelê ku bendavan dîteqîne pîroz bike, spas bike. Ev dixuye ku, êdî azadî gelekî nêz e, serbestî di belîka guhên me de ye û li hemana ye ku tarîti bibe ronahî. Dê bibe jî!

Ev bangewaziya me ji xwendevanên li girtîgehan e ku, dema ku hevalên li girtîgehan ji bo şandina kovar û pirtûkan name û faksan ji me re dişînin, em ji di warê bicihanîna xwestekên wan de dikevin tengasiyê. Ji ber ku du saziyên me hene ji bo piştgirî û alîkariya hevalên li girtîgehan. Ji ber wê jî heval dema ku pirtûk û kovaran dixwazin bila ji “TUHAD-DER” an jî ji “TUHAD-FED”ê bixwazin û bi riya “TUHAD-DER” an jî ji “TUHAD-FED”ê daxwazên wan bigihêjin me.

Ji ber kêşeyeke fermî û hiqûqî ev hejmar mehekê dereng derçû. Ango me ji ser meha Pûşperê gav kirin û ev hejmar dê wekî hejmara Tîrmeh-Gelawêjê derkeve.

Û rojnameya Azadiya Welat dîsa girtin, ma qey hê hîn nebûne ku şêr di qefesan de hîlnayên? Ma qey hê hîn nebûne ku em kurd, em ji bo azadiyê çavsorî bûne, em ji bo gel û netewe û zimanê xwe ketine govenda azadiyê. Azadiya Welat dibistana ziman û wêje û huner û siyaset û roj û rojname û çapemeniya kurdî ye. **AZADÎ YA WELAT E!**

YSK'ê mafê parlementeriyê yê Xetîp Dicle betal kir. Lê divê YSK baş bizanibe ku “Feyza me şubhê Nîl e em Xetîp û Dicle ne”. Ji îro pê ve kurd dê benîştê xwe ji li vî pergala har û barbar nezeliqîne.

Dosyeya Rezber-Kewçêrê jî wê “Tu ji bo kê û ji bo çi dinivîsi” be. Bi vî dosyeyê em dixwazin hîn bibin ku li welatê ku şer û pevçûn û qir û qiyamet lê heye, nivîs dikare bi kêrî çî bê? Û heke Kurdistan azad bûya dê nivîskar dîsa ji binivîsiya? Nivîskar dema ku dinivîse, gelo dixwaze kî nivîsa wî bixwîne? Ji bo çi bixwîne? Gelo nivîsandin nexweşî ye, îbadet e, deydan e, serîhildan e, stûyê xwe çemandin e, rastkirin e, şaşkirin e, rexnekirin e, nîrxandin e, dagirtina valahiyê ye, valakirina hebûnê ye, qewartin e, qeşartin e, veşartin e, pêdivî ye, qidam e, erk e, fantezî ye; yan jî ji xeynî van tiştên ku me rêz kirin, tiştêkî din e gelo?

Heta hejmareke dîtir, ligel peyva kurdî bimîne di xweşiyê de...

“Di hemû jiyana xwe de qet min hêvî nekiriye ku xatir bixwazim”



Elîxan Loran: Ku helbest paceyek be, pêşgotina ku helbestkar weke dûrikekê diavêjî ser xwe, dibaceyek e. Berî ku ez pirsên derbarê helbesta te ji te bikim, ez dixwazim çend pirsan ji nav “Pêşgotin” a te hîlbijêrim. Te di pêşgotina “Dîwan” a xwe de gotiye “Gerek cara pêşîn û ya dawîn be ku beşdarî vê pêkenîna dişwar a jê re jiyan dibêjin, bûme” Gelo di vê pêkenîna dişwar de te pêkenîn çawa kir pêkanîn?

Ehmedê Huseynî: Helbest ne felsefe ye, ne ol e, ne zanist e jî wek ku Oktavio Paz dibêje, lê dema ku helbest helbesta rastîn be, dikare wan têgehên hemûyan bi derbirîna xwe watedar bike. Ji kêlîka dişwar û seretayî ya mirovatîyê, ango ji dema ku hizirîn û têramandin peyda bûn, ji kêlîka ku mirovatîyê xwest xwe ji xwezayê cuda bike, ji wê kêlîka ku ne gengaz e mirov bawer bike; mebesta min kêlîka ku helbest tê de ji dayik bû û hetanî kêlîka ku dê helbest tê de bijî, her û her bi pirsên jikuvehatinê, bikuveçûyînê, bi çarenûsa mirovan û bi rasteqîniya hebûn û tunebûnê ve mijûl e. Gilgamêş û hewldanên wî ji bo bidestxistina gihayê nemiriyê, xilmaşîya wî, marê ku gihayê nemiriyê dizî tên bîra me gişan, ma ne wisa ye? Îcar bi qasî ku helbest tijî helbestvanî, hest û nîgaş û hêma û dînbûn û tijî nakokî ye; wisa jî ne dûrî alavên derbirîna felsefeyê ye. Di kêlîkên bêhûde-

yiya req û tund de, di kêlîkên gerînê de; gera li qiblenameyên bersivan, yê helbestvan bi hezaran pirsan der barê wateyên hebûna xwe diafirîne û bi hezaran serçavkan jî ji ser rûyên bersivan hiltîne. Pêwîst e em tu carî ji bîr nekin ku dîroka felsefeyê, dîroka dudilî, velerzîn, mijbarî, lêgerîn, vedîtin û dîroka lêpîrsîna li sedemên heyînê ye û di dawîn de jî hewldana zeftkirina rastiya ku nayê zaftkirin e. Em ji bo çi hatine? Em ê bi ku ve herin? Dê çi bi serê me were? Ma li vê jiyanê tiştekî rasteqîn e, bê guman û sedîsed rastîn heye, yan jî em ji rewrewk, serav û bêhûdeyîyê hatine û ber bi wan ve diçin? Di dîroka xwe de, her gav mirovan hin wate pêşkêşî jiyanê kirine, xwestine bahaneyekê ji hebûna xwe re peyda bikin û xwe jî li bin sîwaneya wê bahaneyê ji bûnewerên din cuda bikin û kêfxweşîya xwe bi hebûna xwe bînin; bi taybetî dema ku ji xwe bawer bikin ku êdî mirov in, ne meymûn, ker, seg an jî pisîk in; di gel ku ew jî di pîrsa bûneweriyê de pîsmamên me yên herî nêzik in. Pêkenîn jî dikare di peyva Nîçe (Nietzsche) de zelaltir bibe, gelo hebûn bi tenê gotinek e yan jî çewtiyek e? Di bawerîya min de çewtiyek e, hema hema pêkenînek e. Ji destpêka singê dayikê û hetanî ber bi gorê ve çûyîn, di heman pêkenînê de, di heman çewtiyê de berceste û bi gewde dibe. Bi kurtî, em bi peyrewrewkê ve dibezin. Schopenhauer çi dibêje? Em deyndarên xwezayîya mirinê ne û em bi tîrs di

© Mehmet Masum SÜR



vî deynî de dihezirin: gelo mirin ne bahaneyek be, da ku jiyana me gunehbarî, tawan û çewtiyek be? Jixwe berî ez bibêjim ku pêkenîneke dijwar e Voltaire bi xwe jî gotibû ku jiyana pêkenîneke giran e. Ma ger ne ev pêkenîna dijwar bûya çawan mirov dikare ji sextekarî, bêbextî, derew, keysperestî, xapandin, bejnîkurtî, nîzmahî, durûtî, telaqreşî, reşekujî, pêxwasî û guhlivîyê bawer bike?

Li xwe, li derdora xwe, li jiyana xwe, li xewnên xwe, li şikestin û têkçûnên xwe, li canbazî û sextekariyên xwe, li serçavk û dirûtiya xwe binîhêrin da ku hûn bizanibin ku girêdana bi jiyana jî ber tîrsa jî mirinê pêk tê, ez bawer im Hamlet jî tiştêkî wisa digot. Dîsa bi kurtî, da ez serê te pir neêşînim, pêkenîna dijwar di serê me de teqîya, em nizanin çima em hatin, çima em ê herin, armanc çî ye? Kê wisa kir û kî li pey vê hebûnê ye?

Jixwe ger em vê pêkenînê di çarçoveya bindestiya xwe de şîrove bikin, dê ji bilî sosretên mezin, êşên mezin û dojhên mezin tiştêkî din li holê nemîne.

E. L.: Qedera Amûdiyan her tim şûştina bi êgir e? Fesîhê Seyda, Kesrayê Ebdê û Sî-nema...

Ehmedê Huseynî: Min bi xwe çavên xwe di şewa-

tan de vekirin. Li ber serê miriyan û li ser keviya darbestan pêrgî zaroktiya xwe hatim, di şevpest û sawîran de, hetanî ku dilê Xwedê qet bi min neşewitî, jiyam. Min qet berbangek, rojhilatek, ronahiyeke rasteqîn nedît, di serav û rewrewkê de keştiya temenê min ber bi nediariyê ve, hetanî vê kêlikê jî, bi lez diçe û qet perav di asoyan de naxuyin. Çêja şewatê di giyanê min de asê maye, tûj û tehl, gawirane û bêbext, çêja Amûdê jî, ger ne di naveroka şewatê de be, bêwate, kelê, tehmsar û serjêkirî û di peyvê de asê dimîne.

Peyivîna der barê şewatên Amûdê de, wek meşa li ser devê kêrê ye.

Bajarê min ê ku dê heta bi hetayê bi çavine vekirî xew bike.

Pênc salî bûm, êvar bû, li mala me xirecira jinan û zarokan bû, ji nişkê ve gotin û galegal li ser lêvan zuha bûn, bi tenê peyveke bi mezinahiya êşê li hewşê, li derveyî hewşê, li kolanan û li gorepanan, li çayxane û dîwanxaneyan belav bû, agir bi sînemayê ket.

Ji wê rojê û vir ve, Amûdê serê xwe datîne ser balgîfa bîra xwe ya ji komir û pîşo û xweliyê, dergûşa şewatên xwe dihejîne, lorîkên bêrîkirinê ji felekê re, ji Xwedê re û ji bindestiya xwe re dibêje û dilorîne.

Goristana wê, di navbera şev û rojekê de, şên, geş, berfireh û mezin dibe. Li ser keviya kêlên spî yê gorên zarokên spî, agirekî şîn dîroka xwe di hişê Amûdê de nivîsand.

Bajarekî biçûk, li beriya Mêrdînê, ji toz û kelpîçan, bi ser asoyên êşê de vekirî, bi şewatan û di şewatan de mezin dibe. Toza Amûdê, şewata sînemaya Amûdê, bi me re mezin dibin, hêviyên me, xewnên me, şikestin û têkçûnên me, wijdan û nêrînên me, rewîşt û gerdîşeyên me, ken û giriyên me, hemû di bîra wan şewatan de geş dibin.

E. L.: Tu dibêji “Piştî êdî qonaxa bişaftina di aso û gêwîl û şewatên Selîm Berekat de dest pê dike” Tu dikarî ji hev veçirîni?

E. H.: Dostoyewskî gotibû ku em hemû ji sakoyê Gogol derketine, bi hêsanî ez jî dikarim bibêjim ku em jî ji sakoyê Selîm Berekat derçûne.

Zeftkirina rehên êşê, vegotina dijwar a trajedyayê, şewazên pêşkêşkirina têkçûn û xisaretên mezin ên kurdan, avakirina çeperên matmayîn û sêhrbaziye û li paş wan çeperan bicihkirina xewna kurd, gurmînên peyvê di eniyên derbirînên ku qet nehatine derbirin, xeyala kurd û taybetmendiyên bûnewerê bindest ê ku bi tenê dikare di naverokên sosretên mezin de mezin bibe, ji Mem û Zînê hetanî Mehabad, ji Berzanî hetanî Mele Selîmê Bedlîsî, ji Mîr Celadet hetanî bi Simkoyê Şîkakî, ji sînoren qederê hetanî bi rêvîngiyên dirêj ên hişê kurd, ev hemû û hin tiştên din jî, sîmayên afirandina Selîm Berekat in.

Di bawerîya min de, ji bo ku nivîskarê kurd bizanibe çawan behsa kurd bike, pêwîst e berî her tiştî bi ezmûna Selîm Berekat perwerde bibe. Lewre xala herî lawaz di berhemên bakuriyan de ew e ku, ji cîhana dahênan û afirandina Selîm Berekat bê par in.

Bi kurtî, Selîm Berekat, em hînî tiştêkî mezin kirin: nivîsandina der barê trajediya mezin a kurdan, pêdivî bi zimanekî mezin, xeyaleke mezin û westaneke mezin heye.

Reng e tu bibêji lê dahênanana Selîm Berekat bi erebî ye? Rast e, ez jî bi kurtî dikarim wisa bibêjim:

Para mezin ji afirandin û vegotin û ji berceste kirina êşa kurd, jixwe, bi zimanên dagirkeran hatiye nivîsandin. Êşa kurd jî ji bo ku di huner û xeyalê de bi cih bibe, bawer im, hewcedarî bi dehan zimanan e. Kî dibêje ku kurdî bi hemû zaravayên xwe têra vegotina wijdanî ya êşa kurd dike?

E. L.: “Helbestê ji bilî şikestinan û şewatê, tu kêfxweşî hetanî a niha nedaye min” Şikestin û şewat çawa kêfê didin te? Helbesta te kefa ku li ser vê kêfa şikestin û şewatê ye?

E. H.: Di sala 1991`ê de, li Swêdê, li bajarekî biçûk, li penagehekê dimam. Dostekî min ê ji derdora Amedê li heman bajarî kar dikir, xwarinxaneyeke wî hebû, carê ji min re kasêten Ahmet Kaya dianîn. Her cara ku dihat û hevalên min derî jê re vedikirin, an ez û pirtûkek em li ser text dirêjkirî bûn an jî min bi daktîloyê tiştêk dinivîsand.

Şevêkê ez û wî bi hev re vedixwin. Ji min pirsî, gelo dikarim şîreteke li te bikim?

Mîn got, fermo tu azad î.

Piştî kurtepêsgotinekê, ji min xwest ku ez dest ji pirtûkan û daktîloyê berdim û berê xwe bidim xwarinxaneya wî da ku fêrî çêkirina xwarinan û hostayîya Pîzayê bibim.

Di hundirê sê mehan de tu yê bibî hostayekî تمام. Piştî ku rûniştina te derkeve êdî tu dikarî ji xwe re Pîzaxaneyekê vekî û rewşa xwe baştir bikî, erê Ehmed tu nizanî qederê çi ji te re veşartî ye? Piştî şîreta wî ya min di ser guhê xwe re avêt, bi rastî jî, qederê dest bi govenda mirinê kir. Mîn di gava pêşîn de du hezar eûro deyn kirin da ku derziyekê, ji Kanadayê, ji birayê xwe yê sih salî yê nexweşê penceşêrê re bişînim.

Birayê min çû lê deyn di stûyê min de man. Hê konê birayê min li dar bû, birayê min yê bi du salan ji wî mezintir bi heman nexweşiyê ket. Min dermanê wî jî ji Emerîkayê, her bîst berik bi pênçsed dolaran dikirin.

Pişt re, wek ku nexweşî ne bes bin, Xwedê ji dest bi zuhakirina xwezayê kir û hetanî a niha jî dilê xwe bi qelş û terkên wê deştê û bi mirina giha û daran û bi tîbûna axê, mirovan û sewalan, neşewitandî ye.

Yê ku mir ji xwe re ji nexweşîyan, ji dewletê û ji Xwedê xelas bû, hinek ji yê mayî jî li her çar kenarên dinyayê belav bûn, ên ku a niha li wir in jî, çavekî wan li asîmanan e, çavek jî li çarenûsa wan e, destekî wan li ser dilê wan e, destê din jî di agirê nasnameyê de diperpîte.

Piştî van sosretên mezin, her gav gotina hevalê min ê ji derdora Amedê tê bîra min.

Ez bi pênçî hezar eûroyan deyndar, bi windakirina du birayên ku min mirina wan nedît, bi qedexebûna çûyîne, bi sedan bêbextî û derewên gawirane yê ku li min hatin kirin, ji vê hev kêşa ku navê wê helbestvanî ye, derketim.

Xwezîka min bi ya wî hevalî kiribûya. Bi kêmanî



min ê berî mirinê xaniyek ji zarokên xwe re li pey xwe bihiştû. Ne xem e, careke din ger ez vegeyriyam, sedî sed ez ê bi ya wî bikim!

E. L.: Berî ku ez qala hin peyvên te yên se-reke bikim, dixwazim tenê peyvekê ji bipirsim. Tu peyv û têgeha “hînkirin”ê gelekî zêde bi kar tînî. Gelo ev peyv û têgeh ji ber hubra Ehmedê Xanî ya ku dibêje “xudreste me ne perwerî me” mayî?

E. H.: Dema ku Ehmedê Xanî dest bi nivîsandina Mem û Zînê kir û biryara nivîsandina Nûbihara Biçûkan da, rolên nivîsandinê û bandora hînbûnê zeft kiribû.

Ev zeftkirin serencama têrmandin û hizirîn û vedîtîninê wî bûn. Îro dema ku em li xwe vegeyriyê û rastiya xwe berî her kesî ji xwe re bibêjin, em ê bizanibin çî bi serê me hatiye, çî valahî û çî qonaxên malkambax di navbera me û zimanê me de hatine dameziran-din?


Pirsa hînbûna zimanan, avakirina hevokan û bi avakirinê re têgihîştina wateyan û di navbera mêjî û peyvê de peyda kirina zemînên nerm û guncaw, peywendiya hevokan bi rêzimanan re, bi têrmandin û fikirînê re, cudahiya di navbera zimanên wergirti û zimanên ku bi şewazekî rêbazane tên perwerdekirin, ev giş bi felsefeya zanista derûnî ya zimanan girêdayî ne (Psycholinguistics). Li ser vê mijarê lêkolînên herî balkêş û serencamên herî ronak ên Jean Piaget, Karnab, Lakof û Chomsky in.

Ji bo yê em bikaribin sosretên mezin ên giyan û hest û hizirîn û têgeh û têgihîştinên xwe têbigihêjin, bê guman em hewcedarî lixwemikurhatinê ne, em hewcedarî xwenasîn û xwezeftkirinê ne.

Bi zimanên serdestan xwendin û perwerde, di zimanên xelkê de hînbûn û naskirina xwe û naskirina derûdorên xwe, pirseke mezin pêşkêşî çîhana rewşenbîrî ya neteweya bindest dike.

Ji bo çî em heyranên dagirkerên xwe ne? Ji bo çî em ji çand, ziman, kultûr, hişmendî û rewîştên serdestên xwe hez dikin?

Ji bo çî di şûna dîroka xwe de em ya dijminê xwe, di şûna erdnîgariya xwe de em ya serdestê xwe, di şûna xeyala zimanê xwe de em xeyala zimanê dibistan û hînbûnê bi kar tînin û dinasin?



Ji bo çî nimûneyên me yên herî mirovane, dilpak û destpak, xweşmêr û bîrtûj serdestên me ne?

Bê guman, ji bo yê xwenasînê zimanê perwerdehiyê, zimanê hînbûnê, zimanê dibistan û pirtûkê, zimanê rêbazan û mamosteyan pêwîst in. Derz û velerzîn û têkçûnên kurmanciya me ya îroyîn serencamên herî ronak ên perwerdehiya di zimanên biyanî de ne. Hemû sextebaz û keysperest û nezan û pêxwasên ku îro hewl didin di vê ava şêlû de avjeniyê bikin û çanda serdestên xwe bi awayekî malkambax pêşkêşî xeyala kurmanciyê bikin, serencamên zimanekî wergirti ne. Zimanê kolanê, yê taxê, yê malbatê, yê gund û yê bajaran û yên êlan xwe di derbirîn û alavên derbirîna kurmanciyê de bi cih dikin, laş û giyanê kurmanciyê ji bi xwe re talan dikin.

Ji bo yê zelalkirina van pirsan, pêwîst e yê bindest, bi bîrtûjî nêzî pirsên giyanê xwe bibe. Pirsê bingeşê ji çarenûsa zimanê wî ye û ji ku hatina hişmendî û bîra wî ye?

Lewra, ger em bixwazin asoyan li ber pirsgerêkên xwe yên ajiyanî, giyanî, şaristanî û çarenûsane vekin, pêwîst e em ji xwe bipirsin ka em ji ku hatine kurmanciyê?

Li vir, pirsên hînbûnê, perwerdehiyê û avakirina hest û mêjiyên ku di zimên de dadimezirin, tên holê.

Hînbûn û perwerdeyî jî, wek têgehine felsefeyane, dikarin rê bidin kesayetiye da ku di zimanê xwe de geş bibe, rewîşt, gerdîşe, taybetmendî û sîmayên xwe biparêze.

E. L.: Te ji folklorê kurdî bigire heta Feqiyê Teyran, Rilke, Melayê Cizîrî û ji gelek nivîskarên din hin hevok bi kar anîne. Lê ez ê ji nav van jêwergiranan a Arthur Rimbaud a ku dibêje “Ez ji wan xelka me yên ku di êşê de distrên” ji te bipirsim. Çima te xwe ji êşê nesitirand û di êşê de strand?

E. H.: Zingîna wê hevoka Rimbaud hê ji di asîmanê helbestê de deng vedide. Renckêşan, azar û êşbarî, westana di keseran de, rawestana di agirê bende-wariya mijbar de, xewnên şikestî, têkçûn û xisaretên dijwar, radestiya li pêşberî bêhûdehiyê, bêzariya ji kevir, ev giş yeko yeko û bi hev re, hin çavkaniyên dahênan û afirandinê ne.

Di hewldanên zeftkirina kêlikên reviyayî yên jiyanê de, di hewldanên guvaştina ewrên xeyalê de, ne bi tenê mirov nikare xwe bisitirîne, lê her wisa, tîp, peyv, wêne, nîgaş û derbirîn, deq û bîr, kaxiz û

pênûs ji nikarin hem xwe ji êşandinê û hem jî ji şewatê biparêzin.

E. L.: Vê “serdema Madona û Maradona” wê qûceke çawa ji me re ava bike?

E. H.: Me bûyer û rûdanên pir mezin dîtî. Em di vê jiyana xwe de bûn govayên gelek serkeftin û têkçûnan, em; ên ku nevî û mînakên bindestiya sed-sala bîstê û destpêka sedsala bîstê û yekê ne.

Me, li pêşberî çavên vê şaristaniya mirovane ya nûjen, mirinên mezin, xwînên mezin û reşekujiyên mezin dîtî. Şaristaniya ku roj li pey rojê hewl dide ku parastina berjewendiyan bike exlaqê gerdûnî. Em jî qurbanîyên herî ronak ên vê gerdûna ku piço piço genî dibe, ne.

Doh, Sedam Husên mirovekî wan ê mêşinî, baş û sernerm bû, bi çekên kîmyeyî kurd qir dikirin, enfal li dar dixist, goristanên komkujiyên xwe li seranserê Iraqê ava dikirin, wê çaxê tu kesî jê re nedigot Sedam Husênê îblîs.

Doh, Bîn Ladîn perwerde dikirin, navê wî kiribûn şervanê azadiyê, ji nişkê ve bû dijminê wan ê yeke-mîn.

Dîroka teror û kuştinê ya rojava ku beşek e ji hişmendiya emperyalîzmê, îro nema di ragihandinê de, di medyayê de behs dibe, kes jî nema diwêre behs bike.

Ma kî êdî behsa “Îngilîstan û Emerîkayê dike û dibêje ku bûn sedemên kuştina milyonan mirovan, di dema Soharto de, li Endonezyayê?

Edward Seîd navê wê dike “Emperyalîzma kultûrî” Lewra dema ku îngilîzan nîv milyon Malewî di welatên wan de bi terorê qir kirin, wek nûçeyêke biçûk jî di rojnameyan de derneket.

Em jî serê sed salan, wek mirovên ji hesin, ji xwe re li kuştina xwe dinihêrin, axa me, ava me, jiyana me tê talan kirin. Zimanê me zuha kirin. Xeyala me hişk kirin, saman û gencîneyên me vala kirin, di bîr û hiş û hest û gîyanên me de kavlên mezin li pey xwe hiştin.

Îcar dema ku em jî bixwazin biqîrin, dengê êşa xwe bigihînin, bibêjin êdî em nema dikarin, di cîh de, geh bi hev re, geh jî li bin sîwaneyên hev û geh jî yeko yeko me bi cihêxwaziyê, bi terorê, bi şûndemayînê, bi dijberiya mirovatî û şaristaniyê sûcbar dikin.

Serdema ku behsa wê dikim nêzî vê dîmenê ye.

E. L.: Ku mirov bala xwe bide zimanê te mirov vê dibîne ku, hevoksaziya te hema bibêje qet û qet neguheriye lê zimanekî te yê zayok, zimanekî te yê ku tunebûnê jî dikare

ji xwe re bike haveyn û bibêje “va ye êdî ez heme!” heye. Li ser vê dixwazî çî bibêjî?

Berî çend salan, min lêkolîneke T. S. Eliot xwend. Dema ku min cara pêşîn xwend, bawerîyeke wisa li ba min çêbû ku Eliot lêkolîna xwe ji bo kurdan nivîsandiye. Lewra, bi kêmanî, min şeş, heft caran xwendina wê lêkolînê dubare kir. Navê lêkolînê “Rola civakî ya helbestê” bû. Xwezîka hemû nivîskarên kurd hewl bidin wê lêkolînê bixwînin.

Eliot behsa gelek tiştan dike, lê ya herî girîng, ya herî ku bandora xwe li min kir ev bû: ger tu bixwazî helbesteke serkeftî binivîsî, pêwîst e tu çêja xwe, rengê xwe, dengê xwe, taybetmendiya xwe, derbirîn û hêmayên xwe, nîgaş û xeyala xwe, wêne û amajeyên xwe, hest û vegotina xwe biafirînin. Ango pêwîst e tiştên tu dibêjî, di heman zimanê ku xelkê berî te pê gotiye, tiştên te bin. Kesî dubare neke, awayê kesî neke, şewaz û hevoka xwe vehûne, li hinavên xwe guhdarî bike û di hundirê zimanê xwe de xwe bibêje.

Eliot tiştine wisa dibêje!

Mîn jî ji xwe re got ka bila ez ez bim ne kesekî din bim.

Mîn wisa dest pê kir, wisa jî berdewam dikim.

Bila hevok hevoka min be, vegotin vegotina min be, wêne û hêma û nîgaş ên min bin, hestiyarî û derbirîna hestan ên min bin, bila bîna min, tîna min, birîna min û dûmana gîyanê min ên min bin, bi tenê wê gavê mirov dikare xwe di hinavên peyvê de sermest, di xelwetxaneyê zimên de sersom û surdar bibîne.

Lê pêwîst e em palpişt û paşxane û çavkaniyên xeyalê jî ji bîr nekin.

Her wisa ji boyî bidestxistina taybetmendiya jî, pêdiviya bindestekî bi zimanekî di çêsnê zimanê serdestan de jî nîn e. Ya herî girîng hestiyarî û behremendiya rasteqîn in.

Dema min “Gava ku masî tî dibin” a Helîm Yûsiv xwend, bawerîya ku kurmanciya bindest dikare hunerên mezin biafirîne bi min re çêbû.

Lê dîsa jî ya herî girîng zeftkirina çavkaniyan û gencîneyan e û hewldana ajotina peyvê ber bi qadên ku nayên derbirîn de ye.

Lewra mirov di vê çarçoveyê de dikare vê yekê bibêje: di nivîsandina helbestê de, zimanê derbirînê ne alav e, lê mebest, armanc, bingeş û çarenivîs e. Kesên ku di derbirîna helbestê de vê yekê tenegehîjin dê di xelekên vala de herin û werin.

Bi kurtî, wek ku çawan di şano û govendê de laşê mirovan ziman e, di şewekariyê de jî reng ziman e, di helbestê de jî peyv ziman e.

E. L.: Ez dixwazim van pirsên jêr tu bi kurtasî şîrove bikî.

Zaroktî?

Gencîneya bê guneh a helbestvên. Şewata ku nakuje lê birînên mezin li pey xwe dihêle. Çavên xemgîn ên dayika min!

Kenekî ji dil û can. Dema zêrîn a berî bindestiyê. Ango dema ku em serdest bûn.

Penaberî?

Dê kî ceger bike û ji wan re bibêje ku hûn nayên ji bîr kirin; em ê heta hetayê bêriya we bikin.

Evîn?

Xunav be yan jî bahoz be, tehl be yan jî şîrîn be, dê her û her xweşiktirîn rûyên jiyanê be. Raperîna dil û serî-hildana hestan.

Bayê bakur?

Volkana ku di bêrika giyanê min de asê maye. Ne haş dibe, ne sar dibe, ne jî vedimire!

Temen?

Şanoya ku bi girî dest pê dike û bi girî jî bi dawî dibe. Têgeha ku qet ji bendemanê hez nake.

Ken?

Dermanê sererastkirina çewtiyên jiyanê. Carinan jî şeweyê kenê mirovan alîkariya me dike ku em ji nêz ve wan nas bikin.

Girî?

Derbirîna neçar a giyanan, çûkên kesk ên ku nikarin di hêlînên xwe de zindankirî bimin. Destnîmêja herî rasteqîn a çavan.

Kovan?

Diyariya herî pîroz a Zagrosan. Ji Medyayê, ji Keyaksarî dest pê kir, Mezlûm û Egîd bi xwe re birin, di nav destê Ocalanos de xeniqî. Tiştê ku gelek caran bûye welatê me. Kovan!

Nivîs?

Parzemîna herî tirsna. Bidestxistina mercine xweşiktir ji boyî bûneweriyê. Piço piço mirin.

Peyv?

Spardeya dilsojiyê. Şevçiraya wijdanan. Di kurmanciyê de henasa Cizîrî.

Xwedê?

Endazyarê bêhûdeyiyê.

Poşmanî?

Nasnameya jixwebaweriyê.

Helwest?



Dema ku sêv ji darê ket, hemûyan bang kirin: sêv ji darê ket. Lê bi tenê yekî ji wan pirsî: Çima sêv ji darê ket?

Bindestî?

Gotina ku baweriya serdestan pê nayê. Bîrtûjî, sirûdên kavilbûyî û xewnên serjêkirî. Hişên ku bi bîranînên dijarwar re mezin dibin. Yanî li jor hovîtî û li jêr jî hestiyarî!

Gotina xatirxwestina ji vê dinyayê?

Da ku gotinên xatirxwestinê hebin, pêwîst e kêlikên xatirxwestinê jî hebin. Û kêlika xatirxwestina dawîn nayê zeftkirin, lewre gotinên ku bikaribin vê kêlikê dagirin tune ne.

Di hemû jiyana xwe de qet

min hêvî nekiriye ku xatir bixwazim.

Nivîsên min jî nîşan in ku tu carî xatir naxwazim. Lê nakokiya jiyanê wisa ye, ez û te, em dikarin xatir ji hev bixwazin lê bêtî ku em bizanibin em xatir ji hev dixwazin an jî em xatir ji hev dixwazim. Ji ber vê yekê jî, qet nabêjim bi xatirê we, yan jî ji jiyanê re nabêjim.

Ji Seamus Heaney sê helbest

Wergera ji îngilîzî û amadekirin: Kawa Nemir

Seamus Heaneyê helbestkar, wergêr û rexnegirê Îrlandî, ku piştî mirina William Butler Yeatsê gewre jê-hatîtirîn helbestkarê Îrlandî tê hesibandin, di 13'ê Avrêla 1939'an de, li Bakurê Îrlandê, li Castledawsona County Derryê ji dayîk bû. Heaney ji Joseph's Collegeê bawernameya mamostetiya Îngilîzî wergirt û di 1963'yan de, li heman dibistanê, dest bi dersdariya Îngilîzî kir. Wî di vê demê de dest bi nivîsînê kir, li gel helbestkarên navdar ên Îrlandî, Derek Mahon, Michael Longley û çendekên din, beşdarî kargeha helbestê bû, ya ku bi rêberiya Philip Hobsbaum ve bûbû wargehê helbestê. Heaney di 1965'an de bi Marie Devlinê re zewicî, bi salekê piştî zewaca xwe jî, diwana xwe ya bi navê *Death of a Naturalist* (Mirina Xwezaparêzekî) da weşandin.

Ji wê hingê ve ye, di warên ciyawaz de, bi dehan berhemên Heaney hatine weşandin. Ji ber berhemdariya xwe û dengê xweser ê helbesta xwe ya berfireh, Heaney bi *Xelata Nobelê ya Wêjeyê ya 1995'an* hat perûtkirin. Her wiha, Heaney *Endamê Biyanî yê Amojgeha Huner û Wêjeyê ya Emerîkan* e û bi payeya Profesorê Helbestê, li Oxfordê, di navbera salên 1989 û 1994'an de cî girt. Ev helbestkarê ku îro yek ji navdartirîn helbestkar û wergêrê cîhanê ye, ji 1976'an û vir ve ye li Dublina paytextê Îrlandê dijî, lê ji 1981'ê û vir ve ye her sal demekê li Zankoya Harvardê hindekariyê dike, di 1984'an de wekî *Profesorê Boylstonê yê Rewanbêjiyê* hat hilbijartin. Wî her wiha *Xelata T. S. Eliot* jî wergirt, ku di cîhana wêjeya Anglo-Sakson de xelateke xwedî prestîj e.

Heaney, bi qasî helbestkarî û rexnegiriya xwe, wergêr û nivîskarekî xwedî hêz û şîyan e. Wergera wî ya *Laments: Poems of Jan Kochanowski* (Zêmar: *Helbestên Jan Kochanowski*, 1995, li gel Stanisław Baranczak), berhevoka bendan a bi navê *Homage to Robert Frost* (Rêz Li Robert Frost, 1996, li gel Joseph Brodsky û Derek Walcott) û wergera wî ya bi navê *Beowulf* (Beowulf, 2000) girîng e, ya ku *Xelata Salê ya Pirtûka Whitbreadê* bi dest ve anî.

Berhemine wî ev in:

Helbest:

- *Death of a Naturalist*, (Mirina Xwezaparêzekî, 1966)
- *Door into the Dark* (Deriyê Ku Bi Nava Tariyê De Vedibe, 1969)
- *Wintering Out* (Pêsiirtengî, 1972)
- *North* (Bakur, 1975)
- *Field Work* (Xebata Qadî, 1979)
- *Poems, 1965-1975* (Helbest, 1965-1975, 1980)
- *Sweeney Astray: A Version From the Irish* (Sweeneyê Averê: Guhertoyek Ji Îrlandî, 1983)
- *Station Island* (Dorgeya Rawestgeh, 1984)
- *The Haw Lantern* (Fenera Guhîj, 1987)
- *New Selected Poems, 1966-1987* (Helbestên Hilbijartî yên Nû, 1966-1987, 1990)
- *Seeing Things* (Çavdêrî Li Tiştan, 1991)
- *The Midnight Verdict* (Daraza Nîvê Şevê, 1993)
- *The Spirit Level* (Şaqûla Asoyî, 1996)
- *District and Circle* (Herêm û Çember, 2006)
- *Human Chain* (Silsileta Mirov, 2010)

Pexşan:

- *Crediting Poetry: The Nobel Lecture* (Helbesta Ciyê Baweriyê: Gotara Nobelê, 1996)
- *Homage to Robert Frost* (Rêz Li Robert Frost, 1996, li gel Joseph Brodsky û Derek Walcott)
- *The Fire i' the Flint: Reflections on the Poetry of Gerard Manley Hopkins* (Agirê Di Kevirê Hestem De: Hizrên Der Barê Helbesta Gerard Manley Hopkins De, 1975)
- *Preoccupations: Selected Prose, 1968-1978* (Mî-tale: Pexşanên Hilbijartî, 1968-1978, 1980)
- *The Government of the Tongue: Selected Prose, 1978-1987* (Şahînsahiya Zimên: Pexşanên Hilbijartî, 1978-1987, 1988)
- *The Place of Writing* (Meydana Nivîsê, 1989)
- *The Redress of Poetry: Oxford Lectures* (Sererastkirina Helbestê: Gotarên Oksfordê, 1995)

Şano:

- *The Cure at Troy: A Version of Sophocles' Philoctetes* (Dû-Dermanê Li Troyê: Guhertoyeke Philoctetes) Sophocles, 1991)

Ayînên mirîveşartinê

1

Mîn mil da ber texlîtekî mêraniya
ku tevî rakirina darbestên
kes û karên mirî dibû.
Ew anîbûn leva kiribûn

li jûrên bêhngenî,
palikên çavên wan dibirûsîn,
destên wan ên çîlqerqas
pabend bûyî li nava moriyên tizbiyan.

Movikên tilî û pêçiyên wan ên werimî
nequrçimîbûn, neynûk
reş bûbûn, zend
bi stûxwarî xwar bûbûn.

Kefenê soregîhayî yê gewr,
karoliyên zarokan ên seten î lihêfi:
Mîn bi kubarî çong veda,
hişmiraz mam li ber gişî,

her ku şima heliya
û rehên mûman xuya bûn,
pêt firikîn
ber bi jinên ku difirikîn

li pişt min.
Û tim û dayîm, li qorziyekê,
derxûna darbestê,
serên mîxên wê xemilandî

bi xaçên biçûk ên birqonek.
Rûpûşên hêja yên ji kevirê sabûnê,
ku maç dikirin birûyên wan ên fena xaniyên Eskîmo-
yan,
diviya qîm bikirana

beriya ku mîx bihatina kutan
û seholgeha reş
a her mirîveşartinê
dehf bidana, bibirana.

2

Êdî kîngê salix û silûxê her
kuştineke xerîbdost tê,
em dibin hesretkêşên ayînê,

kêş û teqlên bav û kalan:

pêjna gavên kotelê
ya hevsan, ku li ba dibû
di ber her maleke famkor re.
Min veçêdikir

dîwanên Boyneyê yên mezin,
gorek amade dikir
di binê kevirên mîna kûzan de.
Li dûrî piyên kuçeyan û rexên rîyan,

tirêmbêlên malbatan ên li xirexirê
berê xwe badidin nava rê,
welat pêk ve dibe hemawaz
li gel tingetînga dengketî

ya deh hezar motorî.
Jinên xewger,
ku xwe negihandine vê, diçin û tên
di kulînên vikîvala de her û her,

dihizirin serfiraziya me ya gavgiran,
a ku berê xwe daye girdolkeyan.
Karwan wekî marekî bê deng e
li kolana xwe ya di nava gîhê de xeriqî,

teriya xwe di erdê re dikişîne
li dûrî Qelşa Bakur,
her ku serê wê ji niha ve
dikeve derçeya zinarê binê zemanan.

3

Gava ku kevir ji nû ve
xistin devê wî,
em ê cardin biajon bakur,
derbas bibin di Strangê û fiyordên Carlingê re,

vêşangehên bîra mirov,
ku bo carekê hedar bûn, navbeynkariya
doza xwînê ya ku aş bûye,
gava ku mirov dihizire wanên di binê girdolkeyê de,

edilîne wekî Gunnarê
ku bi xweşikî radizê
li hundirê girdolkeya gora xwe,
tevî ku mir ji ber zordestiyê,

tola wî nehatiye hilanîn.
Mirovan digotin, wî helbestên
li ser rûmetê distrandin
û ew çar çira dişixulîn

li qorziyên dîwanê:
a ku wê hingê vebû, her ku qulibî
bi rûyekî geş
da ku binihêre li heyvê.

Havîngeh

1

Ew çi bû, qey ba bû bêhna papên genî dianî,
an na tiştêkî li ber germê mayî

dabû ser me wê havîna tîrş bûyî,
qey hêlîneke gemarî bû li ciyekî ketibû kurkê?

Ketim heyra wê yekê, şaşıya kê bû, lêpîrsînerê
hewayê şêt.

Pêhisana ji nişkê ve,
qamçîkirina kêzika

ku hê kurmik bû, dilivîya –
û xaşilîbû, xaşilîbû, xaşilîbû.

2

Bi dehfdana dêrî re, hembêza min tijî
bi gêlazên beyanî û gulên beyanî ve,
dibihîzim îskeîska wê ya dengketî ya nermenem
hêwan vegirtî, ku dizingîne û bi dengê ketî
dizikirîne navê min, navê min.

Axx delal, va ye gilî û gazin.

Kulîlken sist bûyî yên di navbera me de
komî hundir dibin, karê xwe dikin
ji bo pêşkêşgeheke Gulanê cur bi cur.
Ev kulîlkên rastgo yên ku diweşin
zû pîs dikin zeyteke pîroz î delal.

Li kar be. Melhem bike birînê.

3

Axx me konê birîna xwe çak veda
di binê mitêla sade de
û me pal da, te digot qey devê kêrekê ya sar û şayîk
li me hatibû hev.

Hê û hê bêtir rast diferzînim
pakhûnên tîr, her wekî niha

her ku tu xûz dibî li ber rijnebaranê,
av dide jibîrkirin tawana demên rimbaz ên çiçikên te.

4

Bi çûneke
nexweş a dawîn re
dexlên bejinbilind dest pê dikin
dibîşkivin û diderizin

li pêşiyê û careke din
em hildiweşînin

şiveriya çilmisî, eciqî
ya ku diçe dil.

5

Zarokên min bi ser şeva germ a biyanî de digirîn.
Em li ser raxerê dimeşin, devê min ê bê zirze sîravkê
Di serê te re derdixe, em wekî cendekan pal didin,
heta ku
Berbang hiltê li balgiyan, li garis û mêmên

Ku barê dagirtina ronahiyê hildigirin.
Duh, zinaran strandin, gava ku me fitik li
Zembelîlkên li nava tariya şikeftê ya pîr î bi çilkeçilk
da –
Dengê evîna me hûrik e her wekî şeneyeke newabar.

Bêberevanî

Li Wicklowê çileyê pêşî ye:
Li teraşan çilkeçilk e, heyzeran
Mîratgirên ronahiya dawî ne,
Benav sar e, mirov nake lê binihêre.

Stêrkeke bi dûvik a ku winda bû
Divê bi zerketavê re xuya bibe,
Ew bi milyon ton ronahî

Wekî îsîna guhî û gulan,

Û ez carinan stêrkeke ku dixurice dibînim.
Ku bikaribûma li kevirê esmanî pêkdar bibûma!
Li şûna wê yekê, dimeşim di nava pelên şil,
Qalikan, şabaşên payîzê yên mezaxtî re,

Di hişê min de, lehengekî
Li ser senceke bi herrî,
Şabaşa wî wekî kevirê kevkanîyekê
Virvirî ji bo bêhêvîyan.

Ez di kû re hatim bûm yekî wiha?
Gelek caran dihezirim şîretên
Rind û geş ên hevalên xwe
Û mêjiyên sindan ên hinekên ku ji min tê rikê wan,

Gava ku rûdinê, ro dikim û dipîvîm
Tristiaya xwe ya berpirsiyar.
Aya ji bo çi? Ji bo guhdariyê? Ji bo gel?
Qey ji bo tiştê ku li xewleciyan tê gotin?

Baran dibare, dikeve nava teraşan,
Dengên wê yên delîvedar
Dinehwirînin li ser gumanxeyirînan û ramalînan
Û hêşta her dilopek tîne bîra mirov

Vebiriyên alması.
Ez ne dîl im, ne jî sîxur im;
Penaberekî navxwe, por dirêj bûyî
Û sewdaser; gundiyeke kotikBaz dayî ji ber komku-
jiyê,
Ku rengê çerm, kîjan ku biparêze, werdigire

Ji herriyê û qalikan, hest dike
Bi her bayê ku radibe;
Ewê ku, dîteqîne van perengan
Ji ber kêmtîna wan, xwe negihande
Xeberguhêza ku di temenê mirov de carekê tê,
Gula stêrka bi dûvik a ku rehê wê dijene.

Ji te dût im lê bi te heme

Enwer EHMED

Bayê jiyanêke virnî berê aşopên min ên lal û bendewariya du çavên şikestî ber bi demsalên vîrek ve dibir! Erzêla xewnên 'bêber' û bêwext li ber koka xernûbekê westiyayî, bi striyên tîrsê hatibûn dor-pêçkirin. Lê bi firaza dengê te re min di nav sîtava xewnên baskokirî de hêvî li teşîya bîranînên xwe rê-sand, lê demsal bê reng di tûrikê jiyanêke virnî de her min dide ber pêla bayê xwe û min di nav pe-renga hesret û bêriyê de dişewitîne! Li vir demsal kordundeyê rengan e. Lewre zozanê xewnên min jî bi xwe re rût û tazî dike. Dem wînda, sal wêran û roj dilê xwedayên xêrnexwaz e! Ez jî bi nîfir, dek û weynê xwedawendan ve tême birajtin! Di nav bax-çeyê tîrsê de bûme şivanê stêrkên sêwî û wiha jî tîpên tîrsa xwe bêrawest di valahiyeke bê binî de bi ser deryaya hesret û bêriyê ve diherikînim. Îcar gelo pêlên deryayê wê karibe min bigihîne girava mirazan?

Axxx ax! Xwezî keriyê xeyalên min jî li dû berbûyê hêviyên min biçûna û li deryaya bêriyê bûbûya mêvan; bi çepik û dîlan, di kolanên xewnên min de daweta dîdariya rûyê bedew bigeriyaba. Belkî wê gavê li vir min jî şûrê tîrsonekan ji destê xwe bîavêta û bi yek carê hemû tîrsên xwe bikuşt! Lewra ku tu ne li cem min bî, her tişt serobino dibe û di bin sîberên westiyayî de lêgerînên min jî kor dibin. Li vir, peyv û gotin di çavên hêviyê de li rêgeha xwe û wate jî li hêlîna xwe digere. Bendewarî jî di rû-barê çavên miçiqî de agirê şahî û şadbûna bidawî-hatina veqetînen bi jan gur dike! Lê tevî her tiştî car din gurzê aşopên min ên lal di tenûra xezeba yezdan de dişewitî û yên mayî jî bi şîrqêşîrqî birûskên har diqurmişin.

Azadî, serbestî, ken, hêvî, evîn û jiyanê bi çêj a ku min di erdê beyarê mejiyê xwe xwedî kiribû; îro jî di bin xêveta aşopên xesandî de bi derbên celad û zebaniyan bûye nexweşê ber destê dûtî û veqetîna bîyom!

Bi bayê bêriyê re û di her şevên tenahiyê de dilê

xwe li ewrên bîranînên xwe siwar dikim û di kolanên hişê xwe de li do digirim. Li wan bîranînên ku di kewdana şînehatiyê de fetisî bûn vedigeriyam. Her çiqas di bîra bîrîkirina te de werdibim, ew aşopên ku di dawa rojên sêwî de zabûn; bi pêla bayê bendewariyê re ber digire û di himbêza hêviyê de şîr vedixwe. Wer jî ew bendewarî di çav û canê min de bûye kûrmên Eyubê kûrmexwarî û kavilê dîwarê dilê min didan ber qertan! Ma ez dê çawa teşîyên hêviyên xwe bi gîrnijîna çav û bi tîpên navên te nerêsim? Ji bo ku çavên xwe di kaniya dîtina te de bişom, ez stêrkan 'dîkujim' û reşîya şevê 'dîqewirînim' da ku werisê berbanga serê sibê bigirim û ji rojê malîka wê derînim. Wê gavê û bi zeraqa serê sibê re pepûleyên beriya min de, nûra wî rûyê te yê bedew tewaf bike! Ez ê jî bibim teşîya nav tiliyên te da ku ji te re senfoniya çîroka dûtîyê bi risê hesret û bêriyê birêsim. Bi firaz û newaya strana azadiyê re, ez ê rengê dilê xwe ji te re xêz bikim. Ez û tu bi hev re bibin du stêrkên birqok li ezmanê welatê min! Berbejnên ku navê te hatiya nivîsandin, bi rengê azadî û axa welatê min ve neqîşiyî; min di paxila sîberojên bi wate de, bi dilopeke heyvanê hêviyê di çavê heyvê de meyndiye da ku şevên min ronî bike û tîrsên min di gola hêza vîna xwe de bifetisîne! De were ku rengê rojên min di kaniya kenê te de bê şuştin. Were û hêviyên min bi heft rengan ji rengê keskesorê bixemilîne û wiha jî rojên min bi wate bike! Erê! Di rojên bi wate de hêviyên min 'ber' digire, dûtî nêz dibe, şîngerî rondikên xwe dispêre kenê ku li der lêvan bi şahî dizê! Perenga şer di paxila aşitiyê de vedimire; wê rojê hesret û bêriyên min berstûka henasa bextewariyê de dixeriqe û bendewariyên min li teşîya dîtina te tê rêsandin. Niha jî li vir û ji te dûtî di nav lepê gornebaşan wan xewnên xwe yê baskokirî bi firê dixim û wan li kavilê rêka kadîzan dikim rêwî û li diyarê bêriyê dikim mêvanê girava hêviyê! De were û dûtîyê bi wan reşguliyan bixeniqîne da ku hêvî geş bibe!

Xwenasîn

Hecî NEHSAN

Haya te ji bayê ku li kolana bêdeng, wekî roviyekî fenok bi şewqa lembeyan dilist, tunebû. Ne jî haya te ji reqsa darên kolanê, ku li ber ba sermest bûbûn hebû.

Heçko dilê te dixuriya; di nav aramî û bê aramiyê de diçû û dihat. Te xwest hinavên xwe ji toza xemgîniyê dawêşînî. Tu neçû kolanê. Lê pêdiviya te bi rêwîtiyekê, bi meşekê bi geştekê hebû.

Tu di kolana ruhê xwe re ketî rewîtiya giyanzelal. Bi dengê xwe û serboriya hestên kewandî derbasî nav nejbîrkirina rabirdûya qurifi bûyî. Car carinan di ber xwe re derbas dibûyî. Wekî ku tu nû li xwe rast hatibî, te ji xwe fedî kir. Tu li destên xwe geriyayî da ku silavekê bidî xwe.

Pir caran ji te re gotibûn, hin tişt nayên gotin, nayên dîtîn, lê tî jiyîn û nayên jîbîrkirin.

Ji te re gotibûn, her kesekî zimanekî wî yê pê neaxaftinê heye.

Çi gava siwarên nîqaşên xwe dibîne bi ser de digire. Pê bêdengiya dilê xwe diqetîne, pê zingîniya guhên xwe ditebitîne.

Bi kuxîn û bawîşînekê te xwe ji xwe yê nûdîtî bihurand. Te ji xewariya çavên xwe yên din tîrêja şermekê hilanî.

Tu çûyî da ku tu dîsa û dîsa li xwe rast werî. Te xwest di her rewşê de xwe bibînî. Te xwest fêr bibî bê ka demê tu kiriye çend parçe di vê kolana ruhê birîndar de, ruhê ku di siya azaran de xwe dike-wîne.

Tu carekê rastî girêdana dest û çavên xwe hatî. Di

nav lepên wawîkên sersor de diperpitî. Ji ber hilweşîna gewdeyê te zimanê te yê pê neaxaftinê rapelikî ser hestên te û tu qîriyayî.

Ev ez im! Ew zarok, ew ê bêgunehê ku li nav kolan didin ber cop û guleyan, ew ê ku wekî çêlçivîkekê basko dikin û diavêjin ber xopana demê. Ev ez im ê kul bi ciwantî wî bê serî dikin û diavêjin çol û

beyabanan, da ku heta hetayê li serê xwe bigere û bê hêvî, bê xwedîtin be. Ez im ê ku li qadên bajarên nîvşewitî, di berbangên xemrî de bi sêdarê ve kirine, da ji rûspîtiya min reng nemîne bo serdemên dahatûyê.

Ev ez im, ew gundê şewitî, ew rêya bê rêwî, ew xwîna li ser peyarê. Ev ez im, ew ê di şevên hîveron de winda kirin. Ew ê di cendekê keç û xortan de li xwe digere.

Û hîn çî û ne çî. Rêwîtiya te do-

mand. Her û her li xwe û li birîna ruhê xwe rast hatî.

Li derve ba dîn û har bûbû. Pûk û baranê li dara bajêr govend girtibû. Ji nişka ve dengê reqîniyekê hat, te xwe li ber derî dît. Te nizanibû kê kincên rêwîtiyê li te kirine û parçeyên te anîne nêzî hev. Tu di ber xwe de nihûrî; “Îcar dora xweberhevkirina xwe ye!”

Tu ji bajêr derketî, bi pûk û bahozê re ber vê bilindiya xwedîtinên din ve çûyî.

Bi hemû awayên xwe...



Payîz

Fatma OZALP

Demsaleke bi jan digevize di dilê min de
Ji bo te helbestekê bi bêrîkirinê dinivîsim
Şevreşk têrnexwar û çavbirçî
Hingî bîst û çar ji Pîlûmirê dizinge li vir
Wek feqîrekî li ser bêderan digere, li te digirim
Ya min ne ya fitr û zîkat e
Ya min di labîrenta çavên te de xwewindakirin e
Ya din jî
Xeyalên xwe yên platonîk
Bê dem û bê war bi te re par ve kirine
A niha dibim şivanên hêviyan
Di hewana min de xeyalên min
Ber bi bêderên payîzê ve dimeşim
Xeyalên min wek neynikê ye
Dibezim, dimeşim û difirim

Jokov jî ji yên ku di kenê xwe de pêşeroj meyndine
Diavêje nav lepên xwe, diricifim...
Qijbelekên bêderam qîr dikim
“çî kir bin bêderan kir”
Lê reqso bayên dînoke
Vedişîre dengê qijbelekên
Porê hêviyên min tîn belav kirin
Destê xwe ji şevreşkan dişom
Ji hebana xwe çengek beşîşîn
Û bilûra xwe derdixim
Êvar hîna nû şiyar dibe
Bi melodiya bilûra min
Kanî, rûbar û çem bi hev re
Bi dengê bilind diaxifîn ji êvarê re
Tu jî wek kaniyeke gur
Stranên êvarê ji rihê min re dibêje
Di xeyalên xwe yên platonîk de
Di kefa destê xwe de
Hişkehişk zarokatiya te digirim
Moriyên rengê rojê yên ku min dizîne
Lib lib didim ser çûnçika te ya çûr
Û te dixemilînim
Li ser hêlekana çavên min rûdinî
Bayê payîzê dihejîne hêlekanê
Her ku bi hewayê dikeve
Dibî Mizgîn, Evîn, Zîlan, Şîlan
Dibî Rozerîn, Evdila, Hesen, Nazdar
Dema ku çav qirpînî dibî Firaz Felat
Ev şev heyv hat girtin şeva zîz bû qîr
Ezmanan firmêzk rijandin
Û dan ser navmîlan
Ji bo kovanên min hatine dem girtin

Ew bûn hehecîk
Firiyan ber bi asoyên te ve
Wê bibûna deng
Wê bibûna reng
Lê di niha di şikeftên temenên xwe yên
Hilweşandî de dicemidin
Bi bêrîkirina salan wan hembêz bike
Li ba wan dev li ken
Tu yê zarokatiya min bibînî
Dixwazim singê min
A di nava sînoran de nîvcomayî re
Her tim bibî mêvan û dûr neçe
Ger tu dûr biçî
Wê hemû rojên min bê firaz bimînin
Nêz were kilameke şikestî
Ji xwişka xwe re bibêje
Bayê serê sibê wê bédeng bimîne
Ez ê berbangana bi awaza te kêmbikim
Xunavek ji barana payîzê
Dibare ser rûyê te
Keskesora dilê te
Li ser hemû demsalên min belav dibû
Bizanibe ku min tu caran dil neda
Da ku mirinê bidim kêleka navê te
Kezeba min diqermiçe
Di nava agirê ciwantiya te de
Û di besimînên zarokên îlonê de...
Dayika min...
Êdî bila qûrika mirinê vala bimîne
Vir pê ve ez ê ji gazinên xwe
Bihêlim ser baskên Qûbegazên
Koçber û heydok re...

Sê helbest

Emer YAMAN

Dîmena helbestekê

Destpêkê min raman ji hev cuda kir
Bêdengî bi rev û bazdan bar kir û çû
Destê min çûn xeyalên li nav ewran
Yek bi yek min herf ji wir derxistin
Dirûvkirin û bikeyskirin ma
Piştî di zewiyên peyvan de
Min dest bi berhevkirina peyvan kir
Sîngê xwe vekir axa comert ji min re
Ya ma jî, bicihkirina peyvan bû


Roja nû

Ref bi ref digerin pagerên şevê
Di şevên wiha de asîman bêdeng e
Xewnên nîvçe digere li hewayê
Ji paceyan roniyên zenûn dibare
Di destê min de wêneyê te
Li benda roja ku hil be disekinim
Tu raketiyî di nav nivînan
ji rûyê te besîmînek bilind dibe
Caxên hesinî tê ber çavên min

Tu hişyar dibî
Winda dibe hesin
Tîrêjên tavê li paceyê dixê
Siyên me hev maçî dikin
Rojeke nû dîsa dest pê kir...

Bajarê Amedê

Xeyîdî dimînin hemû gotin
Erş li xwe kiriye binevî
Li konan derketin celadên reş
Ev diyarê dişewite yê kê ye?
Çavên dibiriqê dibe efsûn
Jiyan tengav bûye
Di nava diranên hev de
Siyê xwe spartiyê axê
Saqî dagire şûşeya me
Ji meya avaheyatê
Mirin para her kesî/ê ye.
Heyv û roj li diyarê eşqê
Her nîqaş bûye penaber li çolistanê
Diperpîte hêviyên tarûmar
Mîna kevokeke birîndar
Hatiye kişandin perdeya evînê
Hêvî bi goşî goşî ye li hêvîstanê
Yara min di şevê de dibe asîman
Çav dişkîne min, mexsûs
Xem nake bajarê Amedê!
Bi çar deriyên xemgîn
Li xwe kiriye mertalê zêrîn.



Awir

Şêxo FÎLÎK

Ez, ne polîsekî nûgihayî me!

Ne polîsekî nûgihayî û bi ser de, ne xerîbê şênîyên vî bajarî me jî. Hindik nîn e, îsal deh sal in ku min dest bi vî karî kiriye û çar sal in jî li vî bajarî me. Min di van deh salan de, bi hezaran çalakiyên weke îro bi rê ve birine. Bê hesap xelat, bê hesap nişane û bê hesap diyarî... Gelek serkeftinên min hene. Mezinên min gelek pesnê min dane. Lê... Digel ku ew qas sekeftî û jêhatî bûm, digel ku polîsekî têrtêcrûbe û zîrek bûm, pepûk jî ez bûm îro, reben jî...

Serê vê sibê bû. Berî ku ez ji malê derkevim, diya min a ziravqetiyayî li pêşiya min geriya. Ji ser taştêya xwe rabû û revîrevî hat li ber min çong kirin erdê. Bi her du destan, hişka lingên min jidiya û bi min de giriya. Ji bo ku ez neçim çalakiya îro, bi devê xwe yê pariyê nên tê de, hezar carî got 'Ez gûyê te dixwim.' Bi dilşe-watî ji hewşê derketim. Baran hûr hûr dibariya. Ecêbek bû ya îro... Bêtar bû... Ew kêlîka tê bîra min hê jî pirça canê min gijgijî dibê. Axxx, ax! Heke îro ew bêyomî nehatibûya serê min û ez bi awayekî serkeftî ji vê çalakiyê jî derketibûma, dê payeya min bilind bikirina. Kî dizane, belkî jî ez ê bikirima komîser. Qet nebe wê careke din ez ê bi mehanyekê xelat bikirima. Bi wan pereyan jî em ê vê havînê bi malbatî biçûna ber behrê. Jixwe zarok li malê û li van deran aciz bûne. **Yeqbala** min nîn e, **yeqbala** min! Ku ez ne bêsîhûd bîm, tiştêkî bi vî rengî jî bilî min hatiye serê kê? Wa ye du mehên min man. Ku gotin 'îro serê mehê ye' peywira min li vî bajarî diqede. Wê min bi-şînin bajarekî din. Di van du mehan de divê teqez ez xelatekê wergirim. An na divê ez komîsertiyê ji ber guhê xwe bavêjim û wekî polîsekî ji rêzê malnişîn bibim. Ji polîstiyê malnişîn bûn û ji komîsertiyê malnişîn bûn ne wek hev in. Xwedayê mezin îro bextekî zêrîn ji min re şiyand lê ez ê ji ku bizanibim ew bêbav wê li min wiha bike.

Li derketinê, çilkên li ser devlingên min bi ber çavên min ketin. Hêsir bûn! Belê baranek hûr hûr dibarî û peşkên baranê pir dişibin hêsiyan. Lê ya li ser devlingên min ne şilahiya peşkên baranê bû. Lewre, ez hê-sîrên dayîka xwe baş nas dikim. Pariyê di dêv de,

porê wê yê spî û tîna germahiya singa wê ya li ser çongên min... Dil bêhtir şewitî. Û şerekî dest pê kir. Bû reqreqa şûr û mertalan, mêjî û dil pev çûn. Mêjî çûyîn ferman dikir lê daxwaza dil mayîn bû. Ziq li nava çavên min nihêrî û hew! Min dikarî li wê derê mêjiyê wî belav bikira lê... Wê li devê xwe bigerandina û bigotina 'disa zarokek kûştin' lê bila be. Ne xema min e. Bila zarok jî ji xwe re bihewiya! Yan jî bila xwediyê zarok lê xwedî derketibûna û neşandibûna çalakiyê. Ew ne sîcê zarokan e ku... Sîcê dê û bavên wan e. Jixwe divê pêşiyê çend ji wan bînin daliqandin. Bila çend bavên zarokên keviravêj li kolana bajêr bînin daliqandin, em ê hingê bibînin bê ka careke din li zarokên xwe xwedî derdikevin an na! Bê lome be, nizanin zarok şîretkirin çi ye! Qey me zarok nedîtine? Yekî me heye, bêyî destûra min naçe destavê jî. Offfff serê min! Ji wê bûyera îro û pê ve serê min dike biteqe... Min çi digot? Ev hemû listokên hêzên derveyî ne. Dikin dê û bavên bê berpirsiyarî û digel vê nîfşekî bê îtaet û serhildêr biafirînin. Bi vî awayî jî dixwazin welatê me parçe bikin. Ka dema Osmaniyan bînin bîra xwe. Çi listok li ser me gerandine? A niha jî heman listok li holê ne. Divê em baqil bin. Divê em nebin pêkenokên wan. Dewletên xêrnexwaz, dixwazin tim û daîm pevçûn û şer li vir hebe. Dixwazin bigihîjin armancên xwe yên ku di şerê cihanê de nikaribûn bi dest bixin. Armanca wan bes ev e. Lê ew çi dikin? Bêyî ku hişyar bin û bi tevdir tevbigerin, her roja xwedê, li deverêkê li hev kom dibin û qirika xwe diqetînin: 'azadî û azadî'. Yaw hûn hê çi dixwazin, hemû deriyên me ji her kesî re vekirî ne. Ma em we nakin mamoste, nakin parêzer, nakin karmend... We digot ziman û ziman. Wa ye me ziman jî daye we. Me destûr daye ku hûn ji xwe re kursên zimên jî vekin. Hûn hê doza çi li me dikin? Axir mêjî bi ser ket. Ji sedî sed bi fermana mêjiyê xwe -ne ya tu kes an jî kesên din. Bes bi fermana mêjiyê xwe- çûm qada çalakiyê. Ne jin mabûn li vî bajarî, ne mêr û ne jî 'zarok.' Tu kesê/a ku ne li wê derê tune bû. Di nav girseya qerebalix de diya min jî bi ber çavên min ket.

Armanca wan ne ziman e, ne jî tiştêkî din. Carekê mêjiyê wan hatiye şûştin. Tev nezan in. Bi ber bayê 'hinek'an dikevin û me wekî 'neyar' dibînin. Nizanim ku em ji bo xêra wan li vê derê ne. Weke mînak: Îro. Îro jî me ji bo xêra wan çend caran anons kir ku meşa wan derzagonî ye û divê belav bibin. Lê belê belavbûn li dera hanê, dengê xwe berztir kirin û bêtir li hev civiyan. Bêhtir qîriyan. Em jî neçar man ku bi avê, bi bombeyên gazê, bi copan û... Û bi guleyan wan belav bikin. Me nedît çawa kevir li me barandin. Di hundirê wê panzêrê de ji cingecinga keviran em gêj bûn. Di bîskekê de hezar kevir. Ji wê cingecingê, tu yê bibêjî ne panzêrê didin ber keviran lê mêjiyê me danîne ser kevirêkî û bi kevirêkî din mêjiyê me dikiştin. Xwedê kiriye ku dewlet her tiştî difikire û zirxên panzêran zexm dike. An na wê bi wê hêrsê li wê derê panzêrê parçe bikin û me hemûyan li wê derê daqultînin. Axir, me ji du saetan zêdetir bê navber av û bombeyên gazê li pey hev kêr nekirin. Bi vî awayî bi saetan dom kir, ku me hingê dît bi piranî belav bûn û çûn. Çend zarokên rûgirtî man. Me mertalên xwe hil-dan û em ji panzêran daketin. Wekî min got, em ne dewleteke bê hêz in. Em bê plansazî tevnagerin. Em bûn çar biran û me ew dorpeç kirin. Em bi 'ranêzik-bûna pêlingî' dimeşîyan. Di şer de zêdetirîn ev teqîk tê ecibandin. Ku bi rêk û pêk bê pêkanîn teqîkêkî pir serkeftî ye. Di wê demê de min dît ku yekî xwe di kuncikekî de veşartî ye û wekî haran keviran davêje. Haya wî ji min tune bû. Ez hêdî hêdî ranêzikî wî bûm û min bi stûyê wî girt. Armanca min ew bû ku ez wî li ser dev û rûyan li erdê dirêj bikim û pey re heqê wî bidimê. Lê di dest min de weke masiyekî şemîtok çawa çerx bû nizanim. Rûyên me hatin li hemberî hev sekinîn. Min tavilê li erdê dirêj kir û ez li ser zikê wî rûniştim. Halê wî yê gava dinê hat ber çavên min. Wexta ku bi awayekî har kevir li malê dewletê û li karmendên dewletê dibarandin. Min diranên xwe guvaştin û bi hemû hêza xwe kulmek li ser devê wî xist. Min ê ji ku bizaniya wê tola wê kulmê heft qat ji min hilîne.

Dayîk xwediyê derûniyeke çawan in, nizanim. Hema hema hemû dayîk jî wek hev in. Heke agir bi mala yekî bikeve û mal tev de bişewite, dayîk dizanin divê ew agir bê vemirandin. Lê naxwazin zarokên wan, kezêba wan wî agirî vemirînin. Lewre di encama agir vemirandinê de xetereya xweşewitandinê jî heye. Lewma qayil in ku ji dêvla zarokên xwe ve ew bişewitin. Min hê li ser vê helwesta dayîkan mêjiyê xwe têr newestandibû ku, bû gurmegurma bombeyan û qaj-evîja însanan. Gule li me hatin reşandin. Te digot qey ferman e û topa Sedam e. Bû kuxtekuxta girseya jin, mêr û 'zarok'ên bê çek. Ên dibeziyan... ên li hev diqelibîyan... ên gêrdibûn... ên bi keviran bersiv didan vê hovîtiyê... û... û hawar hawara jinan.

Çi heft qat, çi hefte qat... Wê kêliyê ne erdê ez qebûl kirim ne ezmên! Bi kulma ku min li ser devê wî xist,

devê wî xwînê bûbû. Min dît xwîna di devê xwe de tifi ser min kir. Û li nava çavên min nihêrî. Bêyî ku çavên xwe ji yên min veqetîne... Bibîkên wî geh mezin dibûn, geh biçûk... min destê xwe dikir qirika wî û diguvaşt. Wekî xêw, di destê min de ji dirûvekî diket dirûvekî din. Di wê kêliyê de ew zarok ket hezar dirûvî. Û ya sosret jî, digel ku min gewriya wî bi hemû hêza xwe diguvaşt, nedigot off! Te digot qey çavên wî di çavên min de asê bûne. Çi ecêb bû ku min jî nika-ribû çavên xwe ji yên wî veqetînim, ne jî peyvekî ji devê min derdiket. Em bûbûn wek çiroka 'diz û xwe-diyê malê' ez qayil bûm ku dev ji wî berdim lê ew ne qayil bû. Xwe li çavên min girêdabû û singê wî wek nexweşên tagirtî radibû û dadihat. Em çend saetan bi wî awayî man nizanim. Êdî bêhna min diçikiya. Min dikir ku bifetisim.

Nizanim çima lê ji mêj ve ez bi hawara dayîkan diêşem. Gava ku hawarekê dibihîzim, xwe wenda dikim. Ji ser hişê xwe diçim, dîn û har dibim û dibim yekî din. Çavsorî dibim û hew derdora xwe dibînim. Bi destê ser stûyê xwe hatim ser hiş û hemdê xwe ku ke-virek di desê min de û li derdora min kesek nemaye. Ew destê li ser stûyê min dikir ku min bi ser dev û rûyan li erdê dirêj bike. Lê min dil tune bû çeka xwe ya dawîn û ya herî mezin bêyî ku bi kar bînim wenda bikim. Lewma min di nav destên wî de çivek da xwe û çerxî pêşiya xwe bûm. Bi çerxbûnê re, rûyê wî yê bê rih hat ber çavên min. Ji rû û ûniformaya wî bêhtir, min di bêhna wî de ew nas kir ku polis e. Bêhna tir-şokiyê jê dihat. Behneke ecêb... Ez li erdê dirêj kirim û li ser zikê min rûnişt. Rûniştin û kulmek li ser devê min xistin yek bû. Bi lêxistinê, aveke şor û zeliqokî di devê min de peyda bû. Min wê hingê fêr kir ku devê min xwînê dibe. Min xwîna di devê xwe de tifi ser rûyê wî kir. Da ku ji xwînê têr bibe. Belê ez hatibûm girtin û niha ew polisê bêhtirşok jî li ser min bû. Lê ne xem bû. Ez li ber xwe nediketim. Dijberî wê ez kêfxweş bûbûm. Lewre dora gotinê ya min bû. Lewre şer û pisîk wê niha diyar bibûna. A niha ne tanq hene, ne top, ne jî tîfing... Ez û ew... Zilmxwar û zilmkar... A di wê kêliyê de te digot qey ruh ji canê min derketiye û li banî ketiye. Ew qas sivik ew qas azad. Xwedêyooo azadî çiqas xweş bû! Min valahî daqultandibû wê kêliyê, ez bûbûm valahî. Di bibîkên wî de 'ez' xuya dikirim. Zarokek! Zarokekî çar pênc salî. Ji ber agirekî sor direviya. Devê xwe dabû çiyayan, devê xwe dabû welatên xerîb, devê xwe dabû bajarên bi-yanî... Bêyî ku li paş xwe binihêre, bes direviya. Da ku bigihîje hevalên xwe yên dibistanê. Zengilê dibistanê lêdida û ew dikirin rêzê. Sond pê didan xwarin. Derew pê didan kirin. Berdilkî wî li wî, çenteyê wî bi kêleka wî ve. Na! Ew ne çente ye, sindoqa boyaxê. Diçû cihê xwe yê her car, ê binê pirê. Qey ew li wê derê solan boyax dike. Boyaxa xwe ji sindoqa xwe derdixe. Na! Ew jî ne boyax e, tiştêkî din e. Zarok li

binê pirê dibe kubar û difûre. Bi ezmên dikeve û difire. Bihar e... lorîna çol û çiyayan e... bi pêş ve diçe... bêyî ku pê li erdê bike... ling li erdê nakevin... ew qas sivik... Wekî 'xezal'an... 'Xezal'... Ne ji serxweşiya kubarê re, ne ji kêfxweşiya biharê re difire... ling tune ne lewma... ber bi ezmên ve difire.... difire û dibe ezman... 'Xezala' brîndar. Yek, du, sê, çar... heft... dozdeh. Dozdeh birîn! 'Oxir' be 'Xezal'! 'Oxir' û 'Xezal'... Sedsala bîst û yekemîn e dayêê!!! Ev çi ta-

riya qetranî ye dayêê... Ditirsim dayê... Çiraxê pêxe dayêê... Dayê ji tariyê ditirsim dayêê... Çima her der wiha tarî ye dayê...

Çawa çêbû nîzanim lê di kêliyê de peyva 'paçik' ji devê min filitî. Hevalan paçikê reş anîn û çavên wî girêdan ku ez ji wî xilas bûm. An na wî yê bi awirên xwe ez bikuştima.

"Dibêjin ji wê rojê û vir de, zilmkar berî ku zilmê li zilmxwar bike, çavan bi paçikê reş girêdidê."

Manîk-depresîf Nazê YERLÎKAYA

Zeman û mekan
Xeyal û raman
Û tenetî li her du aliyan

Di wexteke sikîsar de - ku dibejinê, *depresîf* -
Giyanê bêtirsîyê bi şarşeva reş xwe dipêçe
Sureke giran dadigire bûnewerê
Dibe tarî, dibe zarezareke axîniyê, nabe girî
Hilmekê diavêje ji xeyalên bê raman
Zemanê ku difire betalî ye bê mekan

- Û tenetî li her du aliyan -

Di wexteke germa havîne de - ku dibejinê, *manîk* -
Dilşadiya bê hesab bi ser hogiran de dipelişe
Belam qeşaya hişk belav nabe di dil de
Dibe ronî, dibe qîjewîja evînê, nabe saxî
Dil hênîk dimîne ji xeyalên bê raman
Zemanê ku difire betalî ye bê mekan

- Û tenetî li her du aliyan -

/Rastî ev e ku riyeke xeyalî ye ev jiyan/

Nêrînên te niqutîn çavên min Xezal DÊRIKÎ

Min ji xwe re gurzek nêrgiz stend îro

Bêhnê ji çavên te

Bi ber dilê min ve fûriya.

Min çavên xwe girtin,

Dengê te ket guhê min.

Bi kenê te tijî bûn kuçeyên vikîvala.

Min ji kenê te hilmekê kûr kişand kezêba xwe

Nêrînên te niqutîn çavên min,

Bişirînek li ser lêvên min ricifî

Dilê min der bû,

Êşiyam.

Zarokek di hundirê min de giriya

Min bi destên te girt,

Kolan bi kolan bi gavên te meşiyam.

Bi dengê te

Di ber xwe de nehvirîm:

"Xezal Xezal de hayê hayê..."

Oy cefayê...

Weeey li min, bihar hatiye !

Bi kêrî çi tê ?

Tu bû baranê ji janê,

Li ser keserên min de bariya .

Tu bû lehiyeke ji êgir,

Ber bi birînên min ve herikî.

Çilê zivistanê me her demsal,

Xeyalên min bi bayê kur ve aliqîn.

Helbest û ziman

Kamran Simo HEDILÎ



Rayên ziman di helbestê de ye
û zimanê helbestê ne zimanê rojane ye

Çawa helbestvan hestên xwe derbasî xwendevanên xwe dikin? Zimanê ku helbest pê tê nivîsandin û zimanê helbestê çi bandorê li hev dikin?

Berî ku bersiva van pirsan were dayîn pêwîst e ku mirov, li dema kesên helbestê dixwînin an jî guhdar dikin, li rewşa wan a ruhî binihêre. Ya duyemîn, têgihîştin, nêrîn, çavdêrî, şêwê, xeyal, derbirîn û bi hêzbûna derbirîna helbestvan hesab bike. Ya sêyemîn, bikaranîna zanîna ziman di helbestê de ye. Ku ev merc hemû bi cih hatibin, tabloyeke serkeftî tê pêşberî mirov. Ev hemû pêwîst in ku neyên jîbîrkirin û li ber çavan werin girtin. Piştî mirov dikare li bersiva pirsên jor bigere.

Giovanni Battista Vico, di der barê dîroka helbestê de dibêje: “Rayên ziman di helbestê de ye. Mirovên pêşîn ji bo êş û şadiyên xwe bibêjin, bi forma helbestî peyivîne. Ev peyvên pêşîn, ne peyvên ferhengê bûn, di nava xwe de derbirîna bişkiyîna helbestê bûn.”

Bi peydekirina ziman re helbest weke şêweyê nivîsa pêşîn hatiye dîtin.

Mirov dikare bibêje, temenê peydakirina deng û bi hev re peyvîna mirovan ji bo têgihîştinê û ya helbestê yek e.

Li ba zimanê rojane, xwezeya ku mirov lê difikirin ji bo bandora xwe lê bikin û dîtînen xwe bibêjin, zimanê sêhrî çêkin. Ev xisûsiyeta vî zimanî bû pêşengê zimanê helbestê. Helbest; watefirîna xeyalê ye û xeyal jî zimanê helbestê ye. Ev ziman e ku helbestê ji xebardana rojane cuda dike û ziman dike giyanê helbestê. Ku ziman nebe, helbest jî tune ye. Ziman e yê ku bi aheng û muzîkê nava helbestê dilivîn, ku livîn nebe, jiyana helbestê tune ye. Platon di danasîna helbestê de, gotina zimanê sêhrî bi kar aniyê.

Di helbestê de ne gotinên tevlihev û hevokên dirêj, gotinên kurt û hevokên derûnî bandora xwe zêdetir li ser mirov dihêlin.

Helbestvan û rexnegirê îngilîzî T.S. Eliot di nîrxandina hunera helbesta Dante de wisa dibêje, “Ku pêwîst be em behsa zanist û hunera helbestê bikin, tiştê em ji “Cehenema” Dante fêr bûne ew e ku helbesta herî mezin heta mimkun be, bi kêm gotinan hatiye pêşkêşkirin. Bi qasî ku mimkun be pûte (îhtimam) dayîne sade û derûniya afirandinê ye.”

Mewlana jî dibêje, “Bi kêmpeyv û derûnî bêje.”

Ji bo ku helbestvan karibin vê bikin, pêwîstiya helbestvanan bi naskirina hemû nazikî û aliyên ziman heye.

Helbestvanên ku ziman nas nekin û xezîneya wan a peyvyan lawaz be dikevin nav kêmasiya dubarekirina peyvyan.

Pirsa helbest çawa tê nivîsandin ji Raymont Queneau tê kirin, ew jî bersiveke wisa dide.

” Baş hîlbijêre baş bi cih ke

Yekîtiya çend peyvyan çêke.”

Helbest hêza xwe ji ziman digire, hevîr û hevîrtirşê wê jî ziman e. Çawa ku ziman ji hêmanên helbestê hêzê digire û digihê derbirînê, helbest jî li ku dera cîhanê hatibe nivîsandin bila hatibe nivîsandin, tu ferq nîn e. Helbesta ku bi naverok, xeyal, bi formê afirandinê, bibîrxistin, bi coşa honandina tevna dangan, eger bandora xwe li ser mirovan kiribe, di vê serkeftinê de para bi hostatî, bikaranîna ziman pir mezin e. Helbest bi xweşikirina raman, hest, xeyal û zelaliya nêrînê helbestvan, bê pasaport xwe digihîne hemû dilan.

Helbestvan xeyalan bi gelek cureyan dertînin pêş. Bi derûniya dirûvdanan, hostatiya gotinan û têgihîştinan, lêkanînê (pevanîn) ku ziman berê bikaranîn, an hê bi kar nehatine digire destên xwe û pêşkêş dike. Ya ku van hemûyan werdigerîne derbirînê, peyvok in. Yê nîrxandina deng bi hostatî nîşan didin û helbesta ku bandora xwe li me dike ew in. Zimanê helbestê, zimanê hemû cîhanê ye. Wê demê tiştê helbestê dike zimanê hemdem, dike zimanê cîhanê hûnandina zimanê helbestê ye. Ya ku di nav çalakiyên destpêka entelektueliya mirov de cih girtî, helbest e.

Di dîrokê de şewênivîsa pêşîn xwe nîşandayî helbest e. Dem bi dem bi xew ve çûbe jî, dem bi dem ji nedîtîne re hiştibe jî, heta gelek caran bi çavên biçûk lê hatibe meyzandin jî, xisleta ku karibû hebûna xwe bi hebûna mirovan re meşandî bikaranîna hostatiya ziman e.

Bêyî dirêjkirina mijarê divê ku bêjim ji serdema pêşîn, heta serdema me, hemû civakên mirovan li derveyî zimanê têgihiştina rojane zimanekî cuda afirandine. Ev ziman, zimanê helbestê ye û zimanê ku helbestê dike zimanê cihanê ev e.

Civakên ku helbesta wan nebin nîn in. Mîna ku em dizanin tiştên helbest ji wan pêk tê hest û raman in. Ya ku helbestê dike helbest jî, bikaranîna van amûran çalakiya afirandina berhema nû ye. Û amûra di vê çalakiyê de tê bikaranîn weke min li jor jî gotibû ziman e. Hestên mirov çiqasî pir dibin bila bibin, ramanên mirov çiqasî tûj û hêja dibin bila bibin, ya herî girîng bi zanîna ziman pêşkêşkirina wan hest û ramanan e.

Bi kîjan zimanî were nivîsandin bila were nivîsandin ji bo çi armancê dibe bila bibe, bi çi rêbazê dibe bila bibe, kîjan hestan, ramanan, xisûsiyetên kîjan formî nîşan bide bila nîşan bide, tiştê têgihiştina helbestê dike, şeweyê gotinê û ahenga dengên ku mirovan dilerizîne ye.

“Negirî dayê nelorîne
rondikên ziwa nebarîne.”

Ev hevokên helbestê dixwazê li Ewropa, an li Kurdistanê hatibe gotin, dîsa jî mirovan dihejîne. Ji ber ku zimanê helbestê ji zimanê rojane cuda ye, helbest dibe navenda pêşxistina ziman û xeyala mirovan. Ev ziman bi şeweyekî ku li guhên mirov xweş were û bi hevokên lihevkerina gotin û muzîkê tê gotin.

Helbest; çanda ku ziman xweşik dike ye. Ziman, bi zimanê helbestvanan xweşiktir dibin. Helbestvan bêjeyan zelal û peyvan sîpehîtir dikin. Helbestvan dangan dikin stran û ramûsan. Dengên ku helbestvan didine helbestê dengên sêhrî ne, di hest û ruhê mirov de dibin mîna gul û stiriyan gulan.

Helbest; ne komkirina qelabalixa peyvan e Yeko, yeko bi wijdan û bi şeweyekî dadwerî bicihkirina cihê ku mafê wan e. Her tîp, her peyv û her hevok di cihê wan de bicihkirin e. Zimanê helbestê bi peyvan, ronahiya pêşveçûnê pêdixê. Rengvedana hest û ramanê, hilpekandina mantiqê û di nav ziman de afirandina zimanê çêdike. Zimanê helbestê, qabiliyeta hevoksazî û fêrbûna hîlbijartina peyvan, ol û felsefeya zanîna ziman e. Zimanê helbest, peyva hêjayî gotinê, hunerê peyva ji dil û nazîkî jê tê xwestin e. Nivîsa bingehe nîrxandina xeyalê bi ramanê ye.

Hestdariya zimanê helbestê, balê dikişîne ser xwe. Bandorê li ser xwendevanên xwe çêdike. Pêwendiyên deng û wateyê hêzê didin hev û gazi xwendevanan dikin.

Form, deng, wate û peyama zimanê helbestê, di guhartina hest û baweriyên xwendevanan de dibe pira veguhartine.

Zimanê helbestê, bi hevoksaziyê tixûbên ku di nav rastiya naveroka mijarê û şeweyê ragihandinê de radike. Armanc ew e ku mebest were ragihandin. Ev taybetmendiya zimanê helbestê, di giyanê civatê de erdhejê çêdike.

Raman, hest û têgihiştina civatê bi pêş ve dibe. Ziman û helbest bi hev re sistemeke din ava dikin. Sîstema ku ew ji hev fêhm bikin û hêla balkêş jî ev e.

Zimanê helbestê zimanê civatan nû dike û bi pêş ve dibe

Jean Cocteau ji bo bikaranîna vî zimanî ji helbestvan re dibêje. “Ne ji bo gotina maseyê peyva maseyê, ne ji bo gotina çûkan peyva çûkan, ne ji bo gotina evînê peyva evînê di helbesta xwe de bibêje”...

Helbestvan bi îşaret û sembolên sergirtî li pêşxistina ziman fireh dinihêre. Bi hêza ziman hest û ramanên xwe li gorî demê, li gorî pêwîstiyên rojê xwe xurt dike. Bi guhertinên nû ji pêşveçûnê re xizmetê dike. Di vê rêwîtiya pêşveçûnê de bandora xwe li ziman dike û her wisa zimanê xwe nû dike. Di nûkirin û pêşxistina ziman de ne bi tenê avakirina hevokên nû çêdike, di şeweyê gotinan de guhertinê dike. Rîyên pevgirêdana gotinên nû derdixe pêş û êrîşî hin kevneprensîpên tengkirina ziman dike. Bi rîyên nû, bi peydekirina hevokên nû, helbest xwe ava dike. Ev hevok ji helbestê re dibin bingehe diwarên ziman ku wê û zimanê ku pê tê nivîsandin bi pêş dixe.

Di cureyên nivîsên yên din de, mêjî di bingehe afirandina raman û avakirina hevokan de giraniya xwe dide bikaranîna lêkeran, naxwaze ji rêzimana ku heyî derkeve. Lê helbest bi gotinên xweser, ên wategiran ku di axaftina rojane de pir nayên bikaranîn û bi piranî bi hevokên bê lêker tê avakirin.

Raman, hest û serpehatiyên ku bi wî formî tên honandin, dibin mijarên ku zimanê helbestê ava dikin û hêzê didin û bi zimanê helbestê re zimanê ku helbest pê tê nivîsandin jî, hêzê ji zimanê helbestê digire. Her du hev xweşik dikin, dewlemend dikin, hev pêş dixin û ya herî hêja hevdu nû dikin. Mîna du xoşewîstên ciwan ku bi hev şa dibin û yên li derdora wan jî bi dilxweşiya evîndaran dilxweş dibin. Zimanê helbestê û zimanê ku helbest pê tê nivîsan-

din jî, bi hev şa dibin û mirovahî bi vê şabûnê re li xweşikatiya xwe digere.

Mîna baxekî gulistan ku bi destên baxvanekî zîrek were çandin û hemû hunera xwe di ciwankirin û sipehîkirina bax de bi kar bîne ye. Li gorî ahenga rengan her rengî li cihê wan deyne ye. Li gorî bejnîlindiya wan her yekê bi cih bike û li gorî mezîniya gulistanê her tiştên din bi cih bike û mirovên li kulîlk û gulistanê binihêrin dilxweş bibin. Zimanê helbestê û zimanê ku helbest pê tê nivîsandin jî, wisa li ber çavên xwendevanan hev du xweşik dîkin. Ku her kulîlkek li cihekî cuda bin vê ahenga xweşikiyê nadin.

Dibe ku yeko yeko kulîlk xweşik bin, ji bo ku bi tenê ne mirov bi rihetî dikare wan jêbîke û pêşkêşî hev bike. Lê ji ber ku di nav gulistanê de wisa xweşik hatine tevgerkirin, mirov bi tenê difikirin ka hê baştir çawa dikare wan bi cih bike û li sipehîkirina gulistanê digerîn.

Roman Jakobson dibêje, "Gava ravekirin û lêkolîna avabûna zimanekî bê kirin, divê lêkolîn û ravekirineke kûr di derbarê fonksiyonên helbestvaniya wî zimanî de bê kirin."

Hêza ku bi helbestvan ve bêrîkirinê dide zayîn raman e. Amûra ku ve hesretê digihîne civatê û bi civatê dide hezkirin jî ziman e.

Konfûçyus dibêje, "Ger yek (mîrov) hînî hêza gotinan nebe, hêza mirovan jî nas nake."

Ziman, jiyan û xweza bi rê û şeweyên taybet alîkariya hevdu dîkin û hevdu peyde dîkin. Her ku diçe dan û sitandina wan zêde dibe û hevdu baştir nas dîkin. Helbestvan jî, di nav demê de ziman nas dike û helbesta xwe dike amûra hezkirinê.

Zanîna hîlbijartina hevok û peyvên nasnameya helbestvan e

Paul Eluard dibêje; "Ji bo helbestê, pêwîstiya me bi kêmhewokan heye, ji bo ev pêk were hemû hevok pêwîst in." Ji bo bikaribin ve bikin, pêwîstiya helbestvanan bi hostatiya hîlbijartina peyvên heye.

Peyvên ku têne xebitandin, baş werin hîlbijartin, wateyê hîlbijiribin û di cihên rast de bîr bîkaranîn. Ji ber ku hevok bi tenê ji peyvên sîd werdigire û bi peyvên tê avakirin.

Aristoteles balê dikişîne ser zimanê helbestê û weha dibêje, "Şeweyê derbirîna helbestvan ji rastiyê û mecazê peyda dibe"

Ji bo helbesteke xweş were afirandin, divê afirîner hevokan nas bike. Helbestvan, gotinên helbestê hîlbijêre û paşî bi kar tîne. Peyv di helbestê de, bi mebesta afirandina wêne û sembolan têne bikaranîn.

Her kesên ji civatê (ji bilî lalan) bi ziman dizanin, lê gotin û rêbaza avakirina hevokan tiştêkî din e. Şeweyê gotin û afirandina hevokên nû her kes nî-

zane û nikarin bibêjin. Ji ber vê tê gotin ku şeweyê derbirînê neynika xwe-diyê xwe ye.


Zanîna ziman û hîlbijartina gotinan ji hev du cuda ne. Helbestvan zimanê ku beriya wan hebûye bi kar tînin û zimanê xwe bi pêş ve dibin. Ne ziman hîlbijêrin, di ziman de gotinan hîlbijêrin û wan li hev tînin. Di helbesta xwe de wan dike nav rêkûpêkiyeke din.

Helbestvan ne mîna wan kesên ku dibêjin; di aqilê wan de gelek tişt û ramanên gelekî pêwîst hene, lê dîkin nakin nikarin wan bînin ziman. Vê gotinê her tim dubare dîkin û nezanîna xwe vedîşêrin. Bi rastî ku zanîna wan a ziman hebûna, dê bi peyvên bedew û xwedî

bandor ew bihonandina. Yanî dê derbirîna tiştên dixwazin bêjin kiribûna. Ji bo nezanîna xwe veşêrin wisa dibêjin, "dema ku dixwazim bêjim hemû ramanên di serê min de difirin."

Ev kesên ku dema dixwazin derbirîna ramanên xwe bikin û ramanên wan difirin û namînin. An nîzanin ramanên xwe bi zimanê helbestê bînin ziman. An jî, ramanên wan gelekî reben û feqîr in û ne hêjayî gotinê ne. Dibe ku qet ramanên wan kesan nebin.

Zerdeşt dibêje, "Ramana pak, gotina pak, kiryara pak, (baş bifikire, baş bêje û baş bike.)"



Ev tê wê wateyê ku raman pêşî tê. Yanî her tişt ji ramanê dizê. Yên ramanên wan baş bin, çi bi devkî be, çi bi nivîsîkî be, dikarin baş bêjin. Ku nebêjin û nenivîsin ramanên wan nîn in.

Mafê helbestvanan nîn e ku bêjin ez nikarim ramanên xwe bînim ziman. Ev şeweyê gotinê ne yê helbestvanan e.

Goethe dibêje; "Tu ne tenê, di helbestê de helbestvan î. Li sohbetê, li kar, li masa leyîstikê, li her derê helbestvan î. Hemû xweza malê helbestvan e. Çiya mamosteyên bê ziman in. Şagirdên bédeng digihînin."

Helbestvan li baxê peyv û hevokan dijîn. Nikarin bêjin gelek ramanên min ên giranbiha hene lê ez nikarim wan bînim ziman. Ku wer bêjin, ew ne li

baxê peyv û hevokan dijîn. Ew li hişkebeyarekî bê av, bê gul û bê giya dijîn. Bila dev ji helbestê berdin, ji xwe re li kareki din bigerin. Ji bo ku helbestvan gera ramanê ya li dîwana ziman e. Rêberê pêhesîn û anîna ziman a hest û ramanê ye. Mînak ask (xezal) li mêrgan diçêre pel bi pel giyayê xwe dineqîne û paşiyê bi kayîna wî giyayî di mîdeya xwe de dimehîne. Her wisa helbestvan jî, li mêrga ziman, li peyvyan diçêre. Wan yeko yeko dineqîne piştî di hevoka xwe de bi cih dike.

Mallerme dibêje; "Helbest fêrbûna hevokan e." Hewldanên guhertin û avakirina hevokan û bi wateyên nû pêşkêşkirina wan, ne li gora têgihîştin û ji-yana gel be jî. Pêwîst e ku helbestvan ji bo ku ziman bigihînê asteke bilindtir bi kar bîne, nabe ku bêje ez

wisa bi zimanê sivik dinivîsim da gel têbigihêje. Ji bo gel berî wî/wê bi zimanê ku ew dibêje nivîsiye û gotiye. Ne pêwîst e ku tiştên her kes dizane bini-vîse, ew tiştên ku hê nehatine gotin dibêje. Ji tiştên li ber dest direve, bilind difikire û ji pêşxistina zimanê civakê re rêberiyê dike.

Helbestvan hewl dide ku temenê xwe û helbesta xwe dirêj bike

Helbestvanên hoste, tiştên ku bi heftê û heft perdeyan hatine pêçan wan bi kedeke hêja û bi qolincên mêjî vedikin û nîşanî civatê dikin.

Her wisa tiştên xwe jî bi heftê û heft îşaret û sembolan dipêçin û paşê dibêjin. Helbestvanên ku xwendevanên xwe jî aliyê mêjî ve newestînin û wan bi pêş ve nebin tê wateya ku hê negihîştine hostatiya nivîsandina helbestê. Pêwîst e ku helbestvan xebirdanên xwe yên çend rojan di nav helbesteke de birêsin û wisa pêşkêş bikin. Da karibin hestên xwe derbasî xwendevanan bikin û helbesta wan ban-



dora xwe li civakê bike.

Helbest, lihevkirina aheng û awazê ye. Şeweyê nivîsê ya herî zêde dengê wê li guhan xweş tê û wêneyên wê di çavan de cihên xwe digirin. Helbestvan bi zelaliya awirên xoşewîstiyê, dîrokê, olê, felsefeyê û zanistê di helbesta xwe de dihone. Ji bo ku ev xisûsiyet bi wan re hebin, divê ji dîrok, huner, ol û felsefeyê agahdar bin. Da ku zanibin, kîjan curê helbestê kîngê binivîsin.

Carinan dibe ku helbesta gazîkirina serhildanê bi keve pêş û carnayên din li pêş dibin. Kîjan cureyên helbestê li pêş dibe bila bibe, lê pêwîst e ku bi zimanê helbestê û bi hunermendiya bilind bîn nivîsandin, da ku mafê temendirêjiyê bi dest xînin. Helbestvanên vê serbilindî û şanaziyê didin helbesta xwe û taca ku dixwazin daynin ser serê helbesta xwe, li gorî payebilindîya tacê temenê xwe dirêj dikin.

Tac dikare temenê helbestvan rojekê dirêj bike û dikare bi salan piştê helbestvan bike qralê nemir. Taca ku helbestvan çêkirî li ser axa cihanê li her derê bigere jî, dîsa vedigere ser serê xwediyê xwe û xwediyê xwe dike taca serê hunerhezan.

Helbestvanê ku di helbesta xwe de, çirûska pêşerojê nîşandayî, ji hişkgirêdana tariya ol, ji tengîtiya îdeolojiyan rizgar bûyî û xwe gihandî ronahiya helbestê temendirêj e.

Helbestvanê ku ronahî li derdoran belav kirî, bi nazikiya hestan û xweşkirina ramanên lihevhatî, helbesta xwe hîlbijartî, xemila dîroka xwe hê li jiyana hildibijêre.

Lucretius Carus, helbestvanê latînî berî niha bi du hezar salan wiha dibêje, "Giyane ku min rizgar dike helbesta min e."

Ji ber ku helbest weke riya ji cihê xwe diçe û dîsa vedigere cihê xwe ye. Weke jiyana mirovê/a ji derekê dizê û li dera din dimire. Yanî bi trajedî û dilxweşiyên mirovan re diji û bi wan re dimire. Dibe ku temenê wê ji yê mirovan dirêjtir be. Ew jî helbesta hêjayî, ya ku jiyana dirêj diji. Yên demkurt, berî nivîskarê xwe dimerin.

Berhemên ku bi hunermendiya bilind hatine nivîsandin, bandoreke erênî li xwendevanên xwe kirine, temenê xwe jî dirêj kirine.

Helbesta temendirêj ew e ku duh, îro û sibe digihîne hevdu. Ev jî, ji her helbestvanî naye. Ji bo karibe vê bike, divê di nav her rêzikê de hezar xêzan jî, veşêre. Lê îşaret hebin ji bo xwendevan peyî bîkêvin. Ku ne wiha be, helbesta wan dibe helbesta rojê û cihê xwe di nav helbestên temendirêj de nagire. Îro hatiye nivîsandin dê sibe were jibîrkirin. Îro pêwîst e lê sibe ne pêwîst e.

Helbestvaniya bilind ew e ku helbesta wan bandora xwe li neslên ku li paş wan tê bike û ji neslên

paş re mîna findeke ronî bimîne. Ev helbest li kolanan li ser piyan nayê nivîsandin. Dibe ku li ser piyan hin gotin werin bîra helbestvan û wan peyvan bi nivîsa reş nivîsê binivîse da piştê di helbesta xwe de bi cih bike.

Dirêjkirina mijarê kuştina helbestê ye

Helbestvan li peyv û mijarê digerin. Ger bi tenê jî têrê nake, serê xwe li ser peydakirina wan disincirînin û bi zanînan wan hildibijêrin. Pêwîstiya helbestvanan bi agahdariya çanda cihanê heye. Çiqasî agahdariya wan hebe ewqasî nêrîn û hestên wan jî dê fireh bin.

Çanda giştî ne tenê mêjiyê mirov fireh dike, her wisa jî dilê mirov paqij dike. Ku mêjiyê mirov li gorî cihana pêşketî be, wê demê hest û ramanên mirov li pêş in. Hest û ramanên ku li gorî germiya serdema tenûra daran û hest û ramanên li gorî serdema germiya atomê nabin yek. Çawa ku agirê sobeya daran û sobeya atomê nabin yek, her wisa helbestvaniya sivik, xav û nerêstî û ya serdema modern nabin yek. Helbestvanên ku xwe nû nekirine û helbesta cihanê nas nekirine, helbestên xwe pir xav dihonin. Bi girî û gazincan, evîna dilê xwe tînin ziman. "Ez gorî te me, ez bê te nikarim bijîm, were neçe, min nehêle, ez li derya xeyalên te difetisim, dîlbera min, kevoka min, xweşika min, gul û kulîlka zozanên jîna min.

An jî, dildarê min, bazê min, xewrevînê şevên min tu diçe û min ji kê re dihêlî" ... û wekî din bi hezaran peyvên ku berî wan gelek helbestvanan anîne ziman dubare dikin. Bi van peyvên ku qet serê xwe li ser hîlbijartina wan neêşandine pir bi sivikî nêzîkî helbestê dibin. Lê yê ku ji çanda cihanê agahdar be û bi serdema xwe re dijin jî, mîna helbestvanê îngilîzî Shelly dibêjin. "Bila wisa be ku ez nikaribim ji te re bêjim şevbaş" ... Shell, di helbesta xwe ya bi navê (Good night) şevbaş de ji evîndara xwe re wisa dibêje. Ev hevok ji wan qîjeqîjan hemûyan çetir e. Ji dildara xwe re dibêje "bila tu tim li ba min bî ku ez nikaribim bibêjim şevbaş." Bilindgirtina asta helbestê ev e, ne qîjeqîjen ku li ber lingê dildaran bigirîn.

Heta ji helbestvan tê bûyerê bi kêm hevokan dineqîşîne. Hevokên xwe bi roj, meh û bi salan dipêve û piştê di helbesta xwe de bi cih dike. Rojnamevan bûyerên demê dinivîse, li sedem û dîroka bûyerê digere, çima? Çawa? Li ku derê? Kî/kê kir wekî din sedeman dirêj dike û dinivîse. Carna bûyerê dike rêzenivîs û çend rojan li pey hev di rojnameya xwe de diweşîne.

Wê bûyerê, çiroknûs yan romanûs ji çîrok û romanên xwe re bingeş digirin. Çîrok û romanên xwe dirêj, dirêj dinivîsin. Bi danasîna cihê bûyerê re, le-

hengê bûyerê, derdorên lehengê bûyerê, dihonin û pêşkêşî xwendevanên xwe dikin. Heta gelek leheng û kiryanan ji xeyala xwe lê zêde dikin.

An mamostê zankoyê bûyerê dide şagirdên xwe û dixwaze ku bûyerê ji serî heta binî binivîsin. Carnan şagird, van bûyerên ku mamoste didin wan weke pirtûkê pêşkêşî dikin. Lê helbestvan bi çend hevokên resen bûyerê tîne ziman.

Çîrokeke kurdan a mîtolojîk heye, dada qijik û kevokê ye. Bi navê "Jin jî hene û jinkok jî hene." Mele Mahmudê Dêrşewî, bi şêweyê çîrokê bi 20 rûpelan aniye ziman û Seydayê Cigerxwîn ew bûyer bi helbestekê aniye ziman.

Dîsa helbestvanê inglîzî T.S. Eliot, di helbesteke xwe de jiyana xwe wisa tîne ziman, "...min jiyana xwe di kevçiyekî qehweyê de kişand (wezinand)"... Helbest qîrîna hestan û zimanê muzîkê ye.

Zimanê helbestê ne weke yê rastnivîsê ye ku yekser werê têgihiştin. Lê ji bo were bihîstin di navbera muzîk û peyvê de ji peyvê zêdetir nêzikî muzîkê ye. Zimanekî di navbara her du cureyên hunerê de ye.

Mallarme dibêje, "Peyvên helbestvan qîmetê didin deng. Peyvên ku vedigerîne notayên muzîkê li paş xwe dihêle." Û Verlaine jî wiha dibêje, "Berî her tiştî muzîk."

Ew jî muzîkê di helbestê de li pêş digire. Helbestvan, muzîk û peyvê dikin nav hev, peyvên xweşik dikin bi muzîkê re dirêsin û paşê pêşkêşî dikin.

Tiştê ku helbestvan xweşik dibîne, nayê wê wateyê ku ew tişt xweşik e. Nêrîna li xweşikiyê jî, di bin bandora hin merc û bûyeran de dibe. Helbestvan, tiştên ku dixwazin bidin xwendevanên xwe, pêşî bi zanîna ziman wan tiştan xweşik dikin û bi piştre didin xwendevanên xwe.

Îbnî Sîna dibêje; "Helbestvan şahê peyvê ye, bijîjk hukumdariya xwe li ser laşê ava dikin, bi xweşikiya ziman, helbestvan zewqê didin giyan û bijîjk bi fedakarî nexweşan başî dikin"...

Helbestvan evîndarê peyvê ye. Wisa ji peyvên hez dikin, dixwazin ku peyv ji bo wan bi tenê bireqisin. Peyv ji mîna hemû xoşewîstan xweperest in. Ew jî dixwazin ku helbestvan bi tenê yên wan be. Em dikarin bêjin ku jiyana helbestvan jî bi tenê ji bo nasîkirin û hîlbijartina peyvên e. Ji bo ku helbest bi hevokên ji peyvên bijartî hatî sazîkirin tîne nivîsandin. Hest û xeyalên herkesî hene, hevokên wan tîne kiribûna her kesê dibûbûya helbestvan. Tiştê were fêhmîkirin ev e.

Mallarme dibêje; "Helbest ne ji xeyalan lê ji peyvên dizê. Helbest ola hevokan e"...

Di helbestê de kêmhewok bi kar tên. Lê pir hest û raman li wan kêmhewokan tîne barkirin. Armanç gotina gelek hest û ramanan e.

Helbestvan di helbestê de peyvên direqisînin û bi

govendên peyvên şad dibin. Bi riya peyvên şibandî-nên tiştan bi tiştêkî din şirove dikin. Ev bi serê xwe hunera mandûkirina mejî ye.

Cihê helbestê û pexşanê di ziman de cuda ye

Formê nivîsa pexşanê ne forma helbestnivîsê ye. Helbest û pexşan du awayên ku ji hev cuda tîne avakirin. Du tiştên li ser cudahiyan ji hev cuda bi pêş ve diçin. Pexşan bi rastî, bi aqil û mantiqê tîne nivîsandin. Helbest li derveyî van têgihiştinan e.

Helbest ji nehênîyan li nav şevê winda, çirûskên asoyê hestan yên xwe carnî nîşanê didin û bi wêneyên bê nav ji kaniya pîroz diherike tîne nivîsandin. Berî her tiştî, di helbestê de ya pêwîst ne têgihiştina peyvê ye, di hevokê de qîmeta gotinê ye. Yanî di nav hevokê de bikaranîna peyvê gelekî pêwîst e.

Zimanê helbestê û pexşanê jî ji hev cuda ye. Hunerhez, zimanê helbest û pexşanê wisa ji hev cuda dikin, "Zimanê helbestê zimanê hestan e û yê pexşanê zimanê hiş e."

Malherbe dibêje, "Pexşan dimeşe, helbest dansê dike."

Ji bo pexşanê ziman amûr e û nivîskar di pexşanê de ramanên xwe bi awayekî vekirî û mînakî, digihîne xwendevanan. Hevokên pexşanê zelal in, xwendevan bêyî ku zehmetiyeke giran bibînin di wateyan wan tîdigihînin.

Lê di helbestê de ziman hem amûr e û hem nêveng e. Helbest hinekî jî dibe zimanê di ziman de, dibe şewata ku rê li ber ziman vekirinê. Dibe şewata jîrî û hestdariyê.

Helbestvan xwe bi ser hestên xwe de ditewîne bi tîgîna xwe bi hestan re dide û distîne. Dixwaze hestên xwe bi forma hunerî û bi zimanê ku wêneyên hunerî lê hatî xemilandin derxîne pêş û wisa hestên xwe derbasî xwendevanên xwe dike.

Rast e, ziman ji bo pexşanê û helbestê amûra bingehî e. Lê bikaranîna ziman li ba her yekî ji wan cuda ye. Zimanê helbestê guvaştî ye û helbestvan xwe ji peyvên bêşûd dûr dixê.

Şêweyê nivîsê şirovekirî û dirêj hemû jî şêweyên afirandina helbestê cuda ne.

Ji hemû beşên çandê zimanê helbestê, helbestê ji wan cuda dike.

Diyarbûna helbestê bi tenê ziman e. Ev e, yê ku helbestê ji cureyên din ên nivîse vediqetîne. Cudabûna helbestê û pexşanê, taybetmendî û xweseriya rêzîkirina peyv û hevokên wan e. Helbestvan nîzm û bilindîya deng, cureyên wan deng, aheng, pîvan û muzîkê, di coya herîka helbestê de vedişêre. Dema mirov li derve li van dengên dinîhêre, mirov dikare wan weke hev bibîne. Lê di rastiyê de ne weke hev in. Cudabûna derbirîna nivîsa rastnivîsê

vîsê û helbestê, Aristoteles kiriye.

Aristoteles, pirtûkên xwe yên felsefeyê bi pîvan nivîsandine û weke wan helbestên xwe azad nivîsandin e. Ji bo têgihiştina rastiya zimanê helbestê, mercê pêşî jîbîrkirina hemû cureyên tengkirina ziman û cudabûna hevokan e.

Piştî şikandina qaşûla hişk, dê ziman li kaniya destpêkê, di helbestê de bi zelalî û paqijî biherike. Xwendevanên helbestê hingê dê çêjê ji helbestê bigirin.

Bi Pablo Picasso re hevpeyvînekê dîkin, di wê demê de keçikeye cîranên wî ya biçûk jî li wir e. Keçik nikare navê wî yê pêşî rast bêje. Her jê re Tablo Picasso dibêje. Dema jî helbestvan pirs tê kirin ka helbest çi ye? Keçik jî gazî dike; "mamê Tablo Picasso, mamê Tablo Picasso," dixwazê tişteki jê re bêje. Helbestvan dibêje, "Ha helbest ev e. Pablo dibe Tablo."

Helbest mîna ji rêderketina ziman û leyîstika peyvê ye, lê ne leyîstik e, pêşxistina peyvê ye. Helbestvan hestan distirê, wan diguhêre û bi ciwaniya ziman, bi şeweyekî helbestwarî pêşkêş dike.

Tevliheviya peyvan çiraya mebesta helbestvan dîtefine

Helbest, diwarê koşka peyvê ye û helbestvan jî nêçîrvanê peyvê ye.

Pierre Revedy weha dibêje: "Ji bo ku helbestvan dîtinên xwe bide bihistin ji peyvan sûdê werdigire. Bikaranîna peyvan bi tenê dikare helbesta xwe biniwîse. Lê xetereya herî mezin dîsa ji van peyvan tê. Peyveke ne di cih de, helbesta herî xweş xirab dike."

Li vir tiştê herî pêwîst ew e ku helbestvan karibe xwe ji peyvên ne pêwîst dûr bixe. Çendî barê helbesta xwe sivik bike ew qasî nîrxên wê bilind dike û xwendina wê bi xwendevanan şîrîntir dike.

Mebesta helbestê ya yekemîn ew e ku rastiya hest, xeyal û ramanan nîşan bide. Hin helbestvan jî hûnandina hunerî re, wateya têgihiştinê û pêşvebirina ziman feda dîkin. Di nav tevliheviya peyvan de mixabin mebesta xwe wînda dîkin. Ji bo ku di bingehe de neqîşandina hunerî ji xwe re armanc digirin. Helbestên gelek helbestvanên ku giraniyê didin neqîşandinê mîna mankênên ku ji bo cilfiroştinê teneçêkirin ji sipehîtiya giyanî dûr in. Bikaranîna şibandin û mecaziyên zêde, xweşikiya helbestê ya xwezayî wînda dîkin û ji rastiye dûr dihêlin. Zimanê ku helbestvan bi kar tînin ne pêwîst e zêde li ser xwe û xwendevanên xwe bikin barekî giran. Ne ji bo neqîşandina helbestê, ne jî ji bo bîçîrkirina peyvê feydeya vê tevliheviyê heye. Tevlihevkirina helbestê barê helbestvan û xwendevanên ku helbestvanan

dîkin helbestvan giran dike. Tevlihevî asta helbestê dixe û xwendevanên wê kêmtir dike. Helbestvan, helbesta xwe bi aramiya aqil, hest û ramanên xwe bi zimanekî zelal û herikîneke helbestwarî dinivîse. Li ser navê postmodernîzmê ne pêwîst e ku helbestê ji helbestbûna wê derxin.

Bi qasî hestan, zanîn jî ji bo helbestvan pêwîst e. Her roj xwe nûkirin, pêşvebirin û xwe di ber çavan re derbas kirin divê. Helbestvan bi çêkirina her hevokê re, zanîna zimanê xwe çêdike.

Helbest, ne zimanekî nû çêdike, peyvên nû li zimanê kevn zêde dike.

Helbestvanên ku di bin bandora kevn de ne, bi demê re xwe ji gelek hêlên kevn pak dîkin û rîya xwe ya taybet li gorî awaz û ahenga xwe digirin. Heta xwe neafirîne ew mîna siya helbestvanên kevn tê dîtin. Hemû zindiyên berî xwe ji xwe re mînak digirin, ev tişteki xwezayî ye. Mîna zarokên ku dayîk û bavan an jî mamoste ji xwe re mînak digirin. Lê paşê ew dibin dayîk, bav û mamoste. Her helbestvan jî deng, awaz û şeweyê helbestvaniya xwe diafirînin.

Boris Pasternak dibêje, "Nû, ne ji bo ku kevn rake, ava dibe... nû, hêlên kevn, ji nû ve diafirîne."

Helbestvan, ne bi înkara helbest û helbestvanên kevn li derûniya xwe digere. Ji wan sûdê werdigire û digihê derûniya xwe. Bi deng û ahengên nû gotinên kevn hêdî hêdî ji zimanê helbesta xwe diavêje. Gotinên nû ji yên kevn ava dike û wateyên nû dide wan. Li vir tiştê herî zêde ew e ku helbestvan bîngehê gotinê biparêze. Bi vî awayî bala xwendevanên xwe bikişîne ser mebest û peyama ku dixwaze bide.

Pêwîstiya helbestvan bikaranîna aqil heye, da ku karibe peyvan di hevokan de bi hevdu bide hez kirin.

Pierre Mille dibêje; "Helbest ne bendîkirina hiş e, lê ji binhişînê bi veguherîneke xweşik derxistina hiş û ji binhişîn re kirine mal e."

Helbestvan, hiş hişyar dike, nazik û hestiyar dike. Peyv û muzîkê bi hev re dikelîne û bandorê li nêrîn, raman û giyanê xwendevanên xwe dike. Helbestvan bi silava bêhnfiroşiya gulê, sibehan diafirîne. Lê mixabin mîna mirovên din helbestvan jî ji ferbûn û nêrînên xwe yên dema çûyî hez dîkin. Ew ferbûn û nêrînên me, me ji dahatûya me dûr dîkin. Ji bo girtina îro, pêwîst e meji û nêrînên helbestvanan li gorî sibê bin, da karibin bi peyvên nû sibehan biafirînin.

Serdema Xwedayên serpêl

Seydo OZKAN

Ji bo bîranîna Ceylan Onkolê

Serdem û serdem ber bi serdema Xwedayên serpêl
ve
Dem, ber bi firavîneke dilbijiyayî
Cih, gundekî di hembêza çiyayekî serhildêr
Û ziyareteke tobedar de pijiyayî...

Li ser kuçikekî kuşpene
Ava du kevçî miqarneyan dikele
Agirekî ji nava xwe têr
Li bin çengê quşxaneyêke dêmsêrîn dixê...
Dayîk agir dermale dike
Di bîrê de kezebek
Di paşilê de dilek...

Gurmînek...
Pêşî erd û asîman dihejîne
Piştî qîrek deng vedide
Di geliyekî mirûztehl de
“Xezoooo...”

Ristika temenên çend salî
Morîkên hûrik
Di qirika berxikên tî de, xwîn
Hatiye meyandin bi spîçka çavên dayîkê
Giriya dayîk
Qîriya dayîk
Û deng jê hat birîn!

Xecîcokên zûxûr serê xwe berdidan ber xwe
Di panavên bê nav de
Hemû şiverêk bi hêba mirinê
Dihatin li canekî ter radiwestiyan
Şîr di guhanê makeyan de diqusiya
Hingê karikên birçî diteriqîn
Û belav dibûn
Di nava bêhna cibê qela rojeke havînê de...

Di dawa kirasê dayîkê de
Çengek kezeb
Ya ji ser pelê deviyên lawaz
Û maziye dîrîn hatiye komkirin
Derdiket hafa Xwedayan
Dema ku pêl dikirin serê xwe...
Bi çend henaseya kevirên birîndar
Û çend pariyên kezeba te, Xezo
Dayîkê mizgîna serdemeke nû dida
Kî dibêje tenê bi xwînê tê nivîsandin dîrok
Bi devê şûrê şerxweş rûpel tîn qulibandin?
Ev serdem bi du çavên xezalî tê guherandin
Serdem “serdema Xwedayên serpêl” e

Di sewgurê de birîndar dibin şeveq
Kulîlkên bejî di birîna dilê dayîkê de
Şiltê efyonê dixwazim biçînim
Di birîna merxên ferê de
Çavên te
Di çavên xwe de
Awirên te yên xezalî...

Zûxava di bin çermê keviran de dikelije
Nûzîn ji kevirên dilaşker bilind dibe
Perî pariyek kezeba te
Li ser birîna keviran dipêçin
Kî ne ku di çavên te de tirsê dixwîn Xezo
Qilqalê...
Ma ne kor in
Nebînin ger coşa periyekê biçûk
Di çavên te yên xezalî de...

Li ser kuçikekî kuşpene
Ava di quşxaneyêke demî de
Ya du kevçî miqarne rijandin Xezo
Aşîrkê şîrê berxikê teqandin
Şîr ber bi tebeqeya heftan
Ya di bin erdê ve dinizile...

Boça kutikî

Azîz NESÎN

Ê dewê ke ma şînê ci û ma tede geyrênê çîyêk bala mi antênê. Nê dewan de kutikê zaf girdî bibî, labelê heme zî bêboçî bî. Mi mamostayê dewêk ra persa: - Ez zana ke, seba ke kutikî har bibê dewijî goşanê înan tera kenê, dima sol û îsot kenê û reyna bi înan danê werdişî. La mi nêzanêne ke boça înan zî tera kenê.

Mamostayî va:

- Belkî cinsê înan wina yê.

Dewa ke ma verê şîbî ci, extîyaro ke ma kerdibi meymanê xo mi, ey ra persa, mi va:

- Qey nê kutukî bêboçê, gelo qey cinsê înan wina yo?

Extîyar hûya û va,

- Hîkayeyêka aye esta, eke ez sereyê şîma nêdejnî ez şîma rê vajî.

Û dest pêkerd va.

- Mudirê nahîyeyî xebere şawitbi, vatîbî: "şîma do emser dewa xo de hîris xozî bikişî".

Gama ke xebere resa dewe ma şaş bî!...Dewijan mi ra va: "Aqilê to resa yo, ti nê gureyan ra fehîm kenê şo mudirê nehîyeyî ra vajê"...Ez şîya.

Mi va:

- Mudîr Beg, mi çarîyes serrî eskerî kerdo...Ne Yemen mend ne Trablus ne Çanakale ne Kafka-sîya..

Mudirê Nehîya va:

- Estexfurula Beg vatişê mi o vatiş nîyo.

Dima ez bi zerrîya xo kewta herbê îstîkal î. Mi gencan top kerd ez vejîyaya serê koyî. Seba qumadarîya cephe yî...Kaxitêko sey çarşafi kerdê mi dest.

Mudirê nahîyeyî va:

- Ti mi bi qalanê wina vengî meşgul kenî, ti gureyê dewlete aweqnenê, ti çi vanê hadê leze vaje.

Mi reyna va:

- Homayê mi rê şukur ke ma herbî qezenç kerd. Bi birîndarîyê gule, şarapnel û kalmeyan ez ageyraya dewe.

Mudirê nahîyeyî qet nêverdene ke ez qala xo tamam kerî. Va:

- Yanî "welatê hîdematî" ra ti seba xo meaş wazenê? Ti nêvînenê no mîlletî feqîr çi anceno?

Mi va:

- Begê mi ez senî nêvînenê, hema hefteyo verên tehsildarî gayo zerdî hecî kerd. Vinde ke ez vajî... Şukur çîyêko dewlete bido mi daya mi. Madalyaya min a bi qurdeleya sûre zî esta...kaxitê min ê biyal-diz û morî zî estê... yew tarîx de mamosteyêk amabi dewe...mi mîyanê vatişanê xo de ê çîyê ke sereyê mi

ser de vêrtîbî mi ey ra va. O zî ê şewanê zimistanê dergan de mi dayêne xebirdayîşî û nê xebirdayîşan yew, yew nuştêne. Homa silometî bido, dima şî cayêko bîn. Mabên de demêk şî. Dewa ma ra yew tuto ke seba wendişî şîyêne bajar rojêk ame dewe. Va "Biewnî Xal Çawîş rojname to nuseno".

Ti mevajê ke mamoste şîyo cuyê mi roto rojname yî. Ez şikena vajî ke cuyê mi, bê nêyî peran kar nêkerdo. Nê peran zî mi nêgirewto. Çewî ra yew waştîşêka mi çin o. Hem dewlete heqê ustegmenî zî da mi. Verê seba ke ma zî paytext de beşdarê meşê merasîman bibî vîndene ma. Nika ez bîya axtiyar, merasîm de gamanê xo pê nêana. Yanî roşanan de ez şikena kincanê subayan xo ra bidî û bigeyrî (bîfetelî). No kincî rindek bi na erdîşa sipî mi kuno qet? Hem ma êdî nêşkenê şalwaran bîderzê! Ma do kincanê subayan ça ra bîyarê? Bellîyo ke wazenê xatîrê mi bi zanê. Homa razî bo!.

Nahîye mudurî va:

- Pekî eke wîna bo ti edî çi wazenê? Ganî to bikê padîşa...Biewnî mi hende serrî wend ez hema zî teymeno yedek a.

Mi va:

- Beg ti mewnî halê min o nikayînî ra...Emrê mi de panc sey heb suwarî (esparî) û hezar hebî zî pîyade bibî. Ê wextan mi kafîran şanêne xo ver, mi ê paşayanê kafîran rê dînya kerdene teng û mi çekalanê înan verard kerdene înan lingî. Na dînya de çend rojî emrê mi mendo o çîyêko to va, hîdameto çîyo ez ne înan ra peran wazena ne zî paşa yî!

- Pekî ti çi wazenê.

- Dewijan ez şawita to het. To emîr dayo ke ma do emser dewa xo de hîris heb xozî bikişê. Sebebê ke ez sereyê şîma dejnena no yo ke: dewa ma de bê mi tu kes rîyê xozî nêdîyo û xozî nêzano. Mi zî cepheyê Galîçîya de dî. Bi nameyê Etem Begî yew tegmenê ma bibî, eke merdo homa rehîma xo ey ko eke sax o wa goşê ey bi cenî. Yew simbêlê ey bibî ke merdim şîkêne sey to di nahîye mudurî pa wa bialeqno û bi-anco. Ez ey reyde şewêk şîya keşîf. Senî bi yew guleyo kor gîna çaqê mi ro û çaqê mi ra şî war. Ez ke rayîr de nalaya, Etem Begî mi ra persa va:

- Ti bî birîndar çawîş, sebî?

Mi va:

- Nê begê mi.

Însanê ê wextî sewbîna bî. No tegmeno gird senî ke mi hetê peynîya keşîfî de dî, mi girewt we û hetanî çadîranê nêweşxaneyî Almanan ard. Mi nê xozan na nêweşxaneyî Almanan de o wext dî. Almanan

xozî weye kerdêne. Mi va belkî goştê xozan bide mi zî coka mi werdo goştinî nêwerdêne. Qusurê mi mewne mi sereyê to dejna, extîyarî zaf qalî kenê. Dewa ma de bê mi çewî ne xozan dîyo ne zî zano. Mudirê nehîyeyî hêrs bi qîrra va:

- Bivînênê. Ez zaf qalan nêwazena, emser dewa şîma ra hîris xozan wazena. Şîma ko hem xozan bişinasnê hem zî şîma ko bikiş!

Mi va:

- Begê mi, dewa ma de xozî çinî, dewê cîranan de zî çinî. Ma tena qala xozan kenê. Ma yewî ra hêrs bibê ma înan ra vanê “xoz”, hîna zaf hêrs bibê ma vanê xozo lajê xozî, la ma xozan bi xo nêzanê.

Mudirê nehîyayî qefşêko (desteyêko) gird kaxit vet û va:

- Şîma çi merdimê cahîl ê. Dewlete hende şîma fiki-rîyena, bewnî şîma rê çi hedre kena. Heme tîya de nuştayo. Wendîşê to esto?

- Ney!..

- Ser de zî ti bîyê ustegmen!

Mi va:

- Yewî rê zerarê xo çin o!

Va:

- Nê kaxitan de çi nuştayo, bigoştare: dişmenê hê-gayê gilgilan û dişmenê mehsulê gilgilan ê girdî xoz ê! Gilgil zî çimeyê ameyeyê (*gelîr kaynaqî*) tewr gird ê welatî yo!...Dewîjî seba ke hîna zaf mehsulê gilgilî bigêrê ...Ti fehm kenê? Yanî saba başîya şîma ganî xozî bikişîyê!...Qey şîma tirkî nêzanê? Xozî do bikişîyê!...

Mi va:

- Mi fehm kerd, begê mi. Bêguman ganî xozî bêrê kiştîş. Ti xozan binawne ma, ma zî înan bikişê. La ma gilgil nêramenê...Pîyê pîyê ma zî nêramitê.

Pîyê, pîyê pîyê ma zî nêramitê!...

Va:

- Biramênê, hetani ke şîma winî tral, tral ronîşenê gilgil biramênê! Wa xozî bêrê gilgil, şîma zî ê xozan bikişênî. Wa emrê dewlete zî bêro ca!

- Sere û çîman ser, begê mi, ma ramenê la nîno... Erdê ma de gilgil nîno. Malum o, şeş aşmî ge, ge zî heşt aşmî zimistan beno, vewre nêwerzîyena.

Mudir qîrra mi ser o û va:

- Şîma her çî ra yew mehne vînenê. Şarê Amerîqayî kutuban de cemedan ser de qeranfilan ramenê. Ma bandêr bi, ma vanê nê.

Êdî ruhê mi amebî verê pîrnika mi. Mi va:

Kamê ke nê emrî dayê şîma, înan ra vajêne, wa emser vewre nêvarnê, ma zî gilgil biramê, wa xozî bêrê gilgili, ma zî perodê înan bikişê.

Va:

- Bewnî mi ra, ti maqamê fermî rê, wazîfe ser o de heqaret kenê. Cezayê nê gureyî di serrî ra dest pê-keno.

- Estexfurulah begê mi, ma kamê ke cenabê şîma rê heqaret bikî? Dewe de xozî çin î.

- Bewnî hema zî vajor beno, ti do bizanê ke dewa şîma de xozî çin î ya ê ke nê emrî dayê ê zanê? Ha.. De vajê?...

Mi va:

- Ma merdimê ke cahîlê, ma çara zanê, la dewe de xozî çin î.

Va:

- Ê ke nê emrî danê, ewnîyenê xarîtayan ra, kitaban şanê pê, hema fehm kenê ke dewa şîma de xozî estê. Belkî xozî estê xebera şîma pê çin a, şîma nê-vînenê!... Mademkî vanê estê, çîmanê xo rind akêne!

Mi va:

- Ma rind akerê la dewe de xozî çin î.

-Şîma çende merdimê nankorê, çende sereyê şîma huşko. Seba holîya şîma, seba ke şîma bibê merdim ma xebetiyenê, ey zî şîma fehm nêkenê. Nê emrî wezaretî ziretî yê pîlê pîlan dayo. Heme vîlayetan rê şawito. Valîyan ra vato ke ez emsar vîlayetanê şîma ra hende xozan wazena...La qey valîyo pîlo gird nêşino xozan seyd nêkeno! O zî qaymaqamî rê nuşt û ey ra vato mîyanê na serre de ti ko hende xozan bikişê. O zî mudirê nahîyeyan rê nuşt, mi zî şîma rê nuşt. Şîma çend merdimê sere huşk ê. Mi her dewe rê parî kerd, dewa şîma rê zî hîris xozî kewtê.

Mi va:

- Mudir Beg, cahîlî ra, ma cahîl ê, sere huşkî ra, ma sere huşk ê, la dewe de xozî çin î.

Mudirî va:

- Wezaretê ziretî nêzano ke dewa şîma de xozî çinî, pîsporê ke bi serran Awrupa de wendê ê nêzanê, valî nêzano, qeymaqam nêzano, memurê ziretan nêzanê, ez zî nêzana û şîma zanê haaa! Şîma vînenê eke na cahîliye çend çîyêka xirab a. Bewnî sereyê nê heqaretî şîno resano ça? Verê sereyê nê heqaretî reseno mi, mi ra şîno gineno qeymeqamî ro, qey-meqamî ra zî şîno reseno valî...To dî sereyê cî şîno gineno kamî ro.

Mi va:

- Estexfurula beg,

Cay xo ra werîşt û ronîşt û va:

- Estexfurula û mestexfurulayê nê gurî çin o...Dewlete şîma ra xozan belaş nêwazena, ê xozî ke şîma kişenê, şîma do boça înan mi rê bîyarê. Ezê kaxitêk bidî destê şîma. Şîma do nê kaxitan bi memurê ziretî bidê tastîk kerdişî. Dima şîma do şêrê banqa, seba her boçêke dîyes û nê qurîş bigêrê, şîma êdî çî wazenê? ..Şîma rê holî zî pere nêkena! Şîma fehm kerd, heme cayê welatî de bi xozan mucadele esto. Dê vajî hela, kiloya xelî çend o?

- Banqa bi heşt quruşan gêno.

- To dî?...Boça yew xozî, kena kîlonêm xele. Ez herinda şîma de bî, a xebata ke zar û zêçê şîma hêgayan de kenê herinda aye de min ê boçan birotêne dewlete. Haydê, merş! Zaf vatiş nêwazena. Emir emir o. Eke şîma nêkişê, ez cenderme şawena dewe, ez şîma musnena kiştîşê xozan.

Mi va:

- Xatirê şîma.

Û ez vejîyaya,

Ez şîya dewe, ê çîyê ke mudîrî mi ra vatî, mi heb bi heb hemine dewijan ra va.

Dewijan ra yewî mi ra va:

- Ma xozan weye kerê wa bizêdîyê. Dima boça înan tera kerê û bidê mudîrî.

Dewijan xoverde,

- Ma heywananê mundaran nêkenê dewe!

Yewo bîaqîl bibi. Cayêko tede eskerî kerd o uca de xozî zafî bîyê. Mi ra va:

- Çawîş Axa torê zehmet nêbo hetanî uca şo. Uca ra hîris heb boça xozan bigêre û bêre!

Cayêk vatêne bitirêne rayîrê di rojî yo. Mi embazan ra va:

- Madem wîna yo yew boça xozî bi dîyes û nêmuqurşan gênê. Xora ma şonê, o wext ma do zaf bigêrê, ma do biroşê, qe nêbo ma do mesrefê rayîrî zî vejî. Ma qerar da, ma banqa ra bideyn peran girewt. Mi di çuwalî girewtî û ez kewta rayîr.

Ma derg nêkerî. Ez resaya o cayêko amebi vatiş.

Uca de xozî zafê...Labelê, dinya de qey sey mi merdimê çimakerdeyî çinî? Ti mevajê, sey mi her kes seba ke boçê xozan biherîno ameyo uca, cay pazari de boçê xozan sey koyî kerdê pêser û kamik şono yeno gêno.

- Heba ci vîst û panc!

- Ma do nê mîratî bi dîyes û nêmuqurşan dewlete, la hoça heqê rayîrê nê ameyîşî?

Nata berd, weta ard, maîçarna, çeperna mi heba ci pancîyesî ra di se heb boçî girewtî. Mi xan de mojna merdiman. Nê merdiman mi ra va:

- Merdim qirase to qe boça xozî nedîyo?

- Çîrê, çî ci esto?

- Nê boçê xozan nîyê, boçê kutikanê!

.....

Ti mevaje ke hîlebaz, boçanê kutikan tera kerd o, do ruwenê zeytînî ro û herînda boçanê xozan de do mi.

Mi va:

-Nika ma sekenê?

Înan va:

- Qet, ti nînan gênê benê, tayêne sereyê înan tera ke, tayêna qijek ê, tayê zî ti ruwen ke, berê bidê mudîrê zîretî, xora fehîm nêkeno.

Hewa germin o, rayîr dergo, eke nê boçî dest bi boye bikê, eke dest bi kermî bikê, do tirên de her

kes...

Vajor bibo vajo:

- Na çî boya!...

Ez ke amîya dewe, mi ra vatê:

- Çawîş Axa, nika zî mucadelê qelayan(qijike) esto. Mudîrê nehîyeyî di se tene sereyê qelayan wazeno.

- Qelayan ra zafêr çî esto, bikşêne berên; pancîyes rojê bînî zî mucadeleyê meleyan dest pêkeno, dua bikêne ke sereyê kulîyan nêwazo!

Dewê bînan şawitêke dewa ma de boçê xozan estê êdî dewa ma bîye cayê zîyare yî...Heba ci nêmuqayme...

Ma hîrêş boçan zî berde nahîye mudîrî rê. Mudîrî va:

- Biewnêne dewa şîma de senî boçî estê. Dê biewnîne nê boçan ra, heme zî çend xişnî. Kam çizano gelo nê xozî senî xozî bî.

A roje ra nat yew nêame keyeyê ma, vatêne keyeyê înan mirdar o. Seba ke mi boça xozan bi destan girewt o yewî destê mi nêgirewt. Mi çend merdimanê bîaqîl kaşê yew koşe kerd. Mi va:

- Ezê şîma ra çîyêk vajî, la gune ê mi nîyo, mi xapênê! Mi zî mudîrê nahîyeyî xapêna. Ê boçê ke mi ardê ê xozan nîyê ê kutikanê!

Dima mi xergelê gureyî va. Yewo çimakerde dest bi gure kerd no semed ra nê derûdorî de kutikê biboçî nêmendê. Nika qeza de bi tucarê boçan.

Çend rojî verê cû ez şîya qeza, mi ey dî.

Mi va:


- Ti senîn ê?

Va:

- Homê rê şukur, ma sayeyê kutikan ra ravîyar-nenê!...

Tirkî ra açarnayox (tadayox):

Mehmûd NÊŞITE



Zarok û cejn!

Fahrî KARAKOYÛNLÛ

Çavê xwe vekir, ji nişka ve veciniqî û qîriya!
Diya wî got: “Netirse kurê min, netirse. Va ye derbas bû, tişt nîn e, te xewn dît, derbas bû.” Hêvî, rapîçikî destê diya xwe, got “Dayê, min ber nede.” û dîsa çavê wî hat girtin.

Wek her zarokî wî jî wê sibehê çavê xwe ji xewê vekir. Dixwest li ber serê wî dayika wî amade bûya. Lê mixabin di nav tunebûneke kambax de, jiyanek dijwar dijiyan.

Mala tunebûnê bişewite. Di çavikek xanî de, heft heb zarok bûn. Li derdora bajêr bi cî bûbûn. Deh sal berê gava çar salî bû, ji cihe bav û kalan, ji gundê xwe yê şîrîn koçber bûbûn.

Bavê wî jî aliyê perwerdehiya wan him bi xem û him jî bi hêvî bû. Hêviya wî, rizgarkirina ayenda wan, dahatûya wan bû. Lê mixabin xwendin ne hêsa bû. Li dibistanê perwerdehî bi zimanê biyanî bû. Ji ber wî di têngîştina peyvan de, di fêmkirina mamoste de gelekî astengî dikişand. Hêvi, her ku diçû ji dibistanê sar dibû.

Mala xizaniyê û nezaniyê bişewite, xizanî, neçarî û nezaniyê piştî wan şikenandibû.

Ji ber wê, Hêvî, neçar mabû û dev ji dibistanê berda bû.

Hêvî, dema ku çûbû dibistanê fêrî zimanê biyanî bibû, Di dema xwendina seretayî de, li dibistanê “Cejna Zarokan” dihat pîrozkirin. Hinek zarokan helbest dixwendin, hinekan cilê leşkeran, hinekan cilê polîsan li xwe dikirin û dirûşmên nijadperest diqîriyan. Dilê wî dibijiya wan zarokan, lê tu wate nedida wan dirûşm û pîrozbahiyan.

Ji bo wî cejn, mêrg û deştên welat bû, keskesor bû, çiya û zozanên xemilandî bûn. Xweşiya xwezayê, xweşiya jiyanê bû. Rev bû, ken bû.

Van demên dawîn cejnên wan tim bi xwîn, lêdan, bi girtin û qîrîn derbas dibûn. Cejna zarokan a ku li dibistanan dihat pîrozkirin jî ji bir nekiribû.

Vê sibehê gava rabû û çû qada pîrozbahiya cejnê, dixwest vê cejnê wek cejnên di xeyalên xwe de pîroz bike, ne ku wek a pîrozbahiya dibistanan.

Di xewnekê de bû.

Hawirdor di şînahiyekê de, her der ji kulîlk û çîmenan xemilandî bû. Ji çem û rûbaran av difûriya.

Zarok, li dora avê, li nav çîmenan bafirok difirandin. Keskesor derketibû. Şahî û bextewarî ji bo zarokan xwe xemilandibû û xwe amadeyî wan kiribû.

Hêvî û xwişka xwe Ronayî, bi bextewarî bi hev re dimeşîyan. Demeke dirêj derbas bûbû. Gava hay ji xwe kirin, dîtin ku hevalên xwe winda kirine.

Bi xof û helecanekê li dora xwe nihêrtin, cur bi cur zarok, bi her rengî; zer, spî, reşik, çînî, moxolî, ereb, çermisor, eskîmo...

Yek ji wan, li ser kevirekî li piya bû û di destê wî de rûpelek kaxiz û hinek tişt dixwend. Zarok bi tevayî li dora wî kom bûbûn.

Gelo çi qewimîbû!

Çima zarok li dora wî kom bûbûn?

Wî zarokî digot çi?

Ew jî, ber bi wan ve çûn.

Li dora zarokan, kevokên spî, kevokên aşitiyê difirîyan. Di nav ronahiyekê de û keskesora rengîn de bû hawirdor.

Gava ku ew ketin nav zarokan, bala her kesî kişandin û her kesî li wan nihêrtin. Ew jî matmayî man û di cihê xwe de sekinîn.

Yê li ser kevir bi dengê bilind got: “Em zarokên cîhanê ne. Ji bo me peymanî navneteweyî ya zarokan hatiye qebûl kirin. Ji ber wê, em her zarok; ji çi olê, ji çi rengî, ji çi netewe, ji çi zimanî, ji çi baweriyê û ramanê be, em wek hev in û tu cudatî di navbera me de nîn e.

Em dahatûya mirovahiyê ne.

Çi dewlet an desthilatdar, ji bo ayenda xwe û mirovahiyê, hewcedariya gihîştina me ya perwerdehiyê, kesayetiyê, ragihandinê, olî, etnîkî, xwarin û vexwarin, bi cîbûyîn û hwd. Ger çi hewce be dê bike û wek erkekê bînin cih.”

Zarokan, li Hêvî û xwişka wî Ronahî nihêrtin. Wan jî bi guman û bi tirs li dora xwe dinihêrtin.

Ji nav koma zarokan, zarokek derket û wisa axifi: “Hevalino, ez li dij vê peymanê me. Ev zarokên nuha hat nav me, ne ji me ne. Em li welatê xwe bi yek zi-

manî, yek olî, yek rengî û yek ramanê tevdigerin. Ji ber wê, yên ne wek me bin em qebûl nakin û nagirin nav xwe” û çû.

Hêvî û zarokên din matmayî man û nema tiştek gotin.

Wana çi kiribûn? Çima wî zarokî li dijî wan ev peyv kiribû?

Hêvî û xwişka xwe bi meraq dan pey wî zarokî.

Ronayî ji Hêvî du salan biçûktir bû. Porekî sor, rûyekî bi ken, bejneke zirav. Di bin rûyê wê de keser û kedera salan, jiyaneke bi derd û elem, tunebûn û berpirsiyariya jiyane.

Dengek ji dûr ve dihat, dengêkî bi xof!

Hêvî û Ronayî xwe li wî dengî girtin û çûn.

Li dora zilamekî, gelek kesên bi nav û deng; serokwezîr, sererkan, ji her payeyê leşker, serekpolîs, polîs, gel û zarok civiyabûn. Vî zarokê civîna zarokên cîhanê terk kiribû, ket nav vî civînê.

Xwezaya dora wan ne wek gava din bû.

Ewrên reş û tarî, her der di nav mij û dûmanê de bû.

Li dora wan qijik difirriyan, çem û rûbar wek xwînê sor diherikîn.

Yekî ji nav wan xîtabî civatê dikir:

“Me, ji bo deshilatdariya netewe û zarokên xwe, ev roj wek cejnê amade kiriye.

Li cîhanê tu neteweyekê cejna zarokan nepejiran-

diye. Ji ber wê, em neteweyekê zarokhez in. Me ne tenê ji bo zarokên xwe, ji bo zarokên cîhanê jî ev cejn amade kiriye.

Em neteweyekê aştxwaz in, zarokhez in...”

Ji devê wî kesî, wek agirê sor tîrêj difûriyan.

Zarok bi rêz li ber wan sekinîbû û bi hev re digotin “Tirkek bedelî cîhanê ye. Çi bextewar e ku ê dibêje ez tirk im, şehîd namirin, welat nayê parvekirin” û ketibûn nava coş û xiroşekê. Hêvî û xwişka wî bi tirs û xof û lez ji wir dûr ketin.

Wê sibehê bêyî xebera diya xwe derketibû derve. Bajar ji aliyên hêzên ewlehiyê ve hatibû dorpeçkirin. Zarok di nav kolanan de bi dirûşmeyan vir de wê de direviyan. Dayik wek mihên berxên xwe winda kiribûn bi ser wan de diqûriyan.

Hêvî jî direviya, yên li pê wî her ku diçû zêde dibûn. Dengê hawar û qîrîna ketibûn nav hevdu. Dengê teqînan, dengê hawaran, lîrandinan dihat. Tîmekî taybet li ser pişta wî bû û dev ji wî berne-dida.

Piyê Hêvî, hew ew dikişand, hêza wî her ku diçû kêmkiribû.

Dengekî bi kîn û hêrs got: “Cejn wiha tê pîrozkirin”. Ev deng hat guhên wî û di heman demê de dinya bi serê Hêvî de hilweşiya. Çavên wî tarî bûn, xwîn bi ser serê wî de hat xwarê û wek rûbarekî sor herikî...

Tiştonek

Zekî AKDAG

- 1-Kumikê zûtik tîje mûtik
- 2-Hilindir milindir, law ji bavê bilindtir
- 3-Komikê sorik, tîje morik
- 4-Çaviya min a şûştî mûştî, xatûnek di tê de rûniştî
- 5-Li vî alî perçîn, li wî alî perçîn, di ortê de gogirçîn
- 6-Manga sorê, şeq ber bi jorê
- 7-Xatûna li ser kursiyê, nê naxwe bi tisî ye
- 8-Çûm ser zinarekî, min lêxist dizmarekî, deng çû hezarekî
- 9-Sorî kur kurî, di bin diya te re kirî
- 10-Kaya spî, kadîna zer
- 11-Benik benik şeq benik, du kodik yek darik
- 12-Tiştik tiştik tiştanî, paş kevirê siltanî, kêra H.z.Elî stû danî
- 13-Apê cûno, du qûno
- 14-Bi roj direqise, bi şev dimelise
- 15-Li min filitî, li te xebitî
- 16-Du qaxikê hirmiya, du çirangê newiya, du qulikê rêviya, aşek li ber geriya
- 17-Deve(hêştir) ûriya, bişkul firiya
- 18-Zivistanê xulam e, havînê axa ye

- 19-Tajiyê hesinî, kêrgoyê darînî, lata goştinî
- 20-Tasa daniyan, li ser xaniyan
- 21-Ku ez li çarşiyê bûm yek bûm, hatim mal bûm sed
- 22-Ez çûm bi min re hat, ez sekinîm bi min re sekinî
- 23-Tuvçê tuvçê(dengê ku pê banga golika dikan) nergizê, li ber qeraxa dengizê, ne gur dixwe ne jî dizê
- 24-Tiştêkî min heye simê gayê hezar mal tê de
- 25-Tiştêkî min heye sî du merî soqî dikutin, meriyek jî dide berhev

- 1-Hêjîr, 2-Dû, kulek, rojin, 3-Hinar, 4-Ziman
- 5-Çav, 6-Potîn, cîzme, 7-Çira, 8-Dahol, 9-Lat, nivîn
- 10-Hêk, 11-Mêzîn, şeyîn, 12-Masî, 13-Lox, 14-lox
- 15-Kêç, 16-Guh, çav, poz, dev, 17-Tivîng, 18-Lox
- 19-Derzî, dirî, dest, 20-Stêrk, 21-Hinar, 22-Sî
- 23-Hîv, 24-Hinar, 25-Diran, ziman

Dosye: Silîva/ Farqîn
Amadekar: Elîxan LORAN & Omer FÎDAN



Farqîna zarokatiya min
Zana FARQÎNÎ

Hevpeyvîn bi Şaredar Fadil Erdede re
Hevpeyvîn: Janbijan AR

Rûşenî û dilgeşiya Silîva
Omer FÎDAN

Farqîn: cayê zafkultûr û medenîyetî
Mehmûd NÊŞITE

Ne Farqîn, Silîva...
Feratê DENGİZÎ

Dînên Farqînê
Osman PLATÎN

Payîtexta efsaneyan Farqîna Ziliyan
Ayhan MERETOWAR

Farqîn
Şêrgo FÎDAN

Sal çûn dem bihurî
Kîbar OZBEY

Îsa Şans û rojnameya “Sîlvan Sesî”
Rojen BARNAS

Kovara Wyê bi qasî ku kovareke wêjeyî û hunerî ye, ew qasî jî kovareke çandî ye. Çawa ku mirov nikare wêjeyê ji hunerê biqetîne, bi heman awayî mirov bikare wêjeyê ji çandê jî biqetîne. Ji ber ku di navenda wêjeyê de çand heye. Rabûn, rûniştin, kêf, şahî, xemgînî, govend, pêkenok... Ev tiştên hanê wekî alavên wêjeyê bixuyin jî, ev tiştên hanê elementên sereke yên çandê ne. Çand malzaroka neteweyan e, DNA'ya gelan e, refleksa hebûnê ye. Çand qedera hebûn û jiyanê ya gelan e. Me jî di vê hejmarê de hewl da ku em herêmeke Kurdistanê wekî dosye pêşkêşî we xwîneran bikin. Ji ber wê jî me herêmeke Kurdistanê ya ku wextekê payîtexta Merwaniyan bûye, demekê dema ku bi tirkî xwarin dihat xwestin xwediyê aşxaneyê li mişterî ho venedida, bi kurdiya wê sond tê xwarin, bîrbûn û jêhatîbûna wê navçeyê her li ser zimanan bû, ango me Silîva / Farqîn wekî dosye pêşî we kir. Em hêvîdar in ku vê dosyeya me ji bo nasandinê Silîva / Farqînê bibe merhaleyek û lêkolînên gelekî hêja li ser vê herêmê, li ser Zembilfiroş, li ser Serê Gulanê, li ser dengbêjiya wê bê kirin.

Farqîna zarokatiya min

Zana FARQÎNÎ



Farqînê bi rastî zarokatiya min neqîşandiye û wê di hişê min de cihê xwe wisan çêkiriye ku qet ji bîra min naçe. Gava ez çavên xwe digirim, ew parçedemên zarokatiya min bi awayekî zelal, yeko yeko tên ber çavên min. Helbet ev yek dibe ku ji bo gelek kesan jî wisan be, kî li ku hatibe dinyayê û zarokatiya wî li ku derê derbas bûbe, ew cih û dever ji bo wî/wê jî wisan e. Çimkî zarokatiya mirov li ku bihurî be ew der hem bi meriv şîrîn e hem jî ji ber ku wê derê kesatiya meriv şewandiye, qet ji bîr jî nabe. Bi rastî jî Farqîn ji bo min cihekî wisan e ku tiştên ewilî, ez lê jiyame. Tiştên destpêkî jî tiştên wisan in ku ne mimkun in ji bîra meriv biçin. Îcar dema zarokatiya me jî rastî dewreke wisan hat ku Farqînê wê çaxê serkêşiya tiştên pir girîng dikir. Devereke siyasî ya bi xwe hesiyayî, cihekî çandî, bajarekî kevnare bû ku nasnameya kurdî lê xurt bû û gel jî lê hişyar bû. Em di nav rewşeke wiha ya Farqînê de mezin bûn ku wê şopa xwe li ser me hişt û em şewandin û vestrandin.

Ez dixwazim behsa bîranîn û bîreweriyên xwe yê nîveka salên 70 û 80'yî bikim. Min dibistana seretayî û navîn lê xwendin. Lîse û zanîngeh jî li Stenbolê. Heta destpêka sala 90'î ez havînan dihatim Farqînê. Jê bi şûn de ez pazdeh şazdeh sal îcar jê dûr mam. Çendî ku kurmê wê dihat min jî, min bêriya wê dikir jî min nikaribû ez herim Farqînê.

Di dema me de, li Farqînê hema bibêje hemû rengên siyasî yê kurdan hebûn. Jixwe her daweteke li Farqînê di wan deman de wek mîtîngeke siyasî bû.

Hema bibêje komên muzîkê yê hemû partî û rêxistinên siyasî yê kurd hebûn. Bi piranî dawet bi van komên muzîkê dihatin kirin û stranên şoreşgerî dihatin gotin. Rehmetiyê Şiyar Farqînî, Saloyê Silikê Leylo (Salih Dalgın), Cotyar û gelek kesên din hebûn ku bi stranên xwe hem çanda Farqînê zengîn dikirin hem jî gel hişyar dikirin.

Em fehmeberî xwe bûn nebûn, em bi nasnameya xwe hesiyabûn, ma jixwe mimkun bû ku ev yek bi mirov re çênebûya. Li Farqînê şerm bû ku me bi hev re bi tirkî xeber bida. Heta beriya ku mala me ji gund bar bike bê navenda Farqînê, ez bi navê Mele Mistefa û Leyla Qasim jî hesiyabûm. Em zarok bûn, lê hiş û bîra me ji her rûdan û qewamên dinyayê re vekirî bû. Ma jixwe mirov hinek jî ne ber û berhemê devera xwe, ya der û dora xwe ye? Malbata ku mirov tê de radibe, lê mezin dibe, hawirdor, hemû tişt li meriv tesîr dikan, dibin sedema şekilgirtina meriv a ruhî û manewî...

Ma li Farqînê tenê xebat û têkoşîna siyasî hebû ku 'dînen wê' jî wan çaxan jî biyanîyan pasaport dixwestin, na! Farqîn jî aliyê çalakîyên çandî û rojên taybet ve jî xwedî xweseriyekê bû ku ew rewşa wê hê jî berdewam e. Pîrozkirina Serê Gulanê yek ji van rojên taybet e ku em li gund jî diçûn Serê Gulanê û me ew pîroz dikir. Bi gotina xelkê, li gorî hesabê kurmancan (ango tewqîma rûmî) di yekê



meha gulanê de, wekî ku nemir Ehmedê Xanî di Mem û Zînê de behsa çûna Newrozê dike, gelê Farqînê jî kuçemal, hema bibêje her kes diçû Serê Gulanê. Bi rastî jî Serê Gulanê, wekî cejneke bû ku

tehm û çêja wê pir û pir cihê bû.

Hemin gotin hat ser Newrozê divê ez hinek behsa Newrozên Farqînê jî bikim. Li gund, ku ez biçûk bûm mala me hat Farqînê, min navê Newrozê nebi-hîstibû û jixwe qet nedihat pîrozkirin jî. Li Farqînê, di Newrozan de me li serê Lehf (Çiyayê li bakurê Farqînê) agir dadida. Jixwe Lehf li pişt Kaniya Navîn e, yan jî em bibêjin Kaniya Navîn li qûntara Lehf e. Bi piranî me di Newrozan de, ku hema bi-bêje em hemû zarokên heman taxê bûn, li serê Lehf tekerên erebeyan pê dixist û me Newroz pîroz dikir. Piştî jî me ew teker bi çiya de gêrî jêrê dikir. Kêf û

zewqa vî tiştî derî qeweta min e ku terîf bikim. Tew hin kes hebûn ku li aliyê Qulfayê, di nav stêrkê de, ku li binî jî bi tirkî Önce Vatan (ango Berî Her Tiştî Welat) nivîsandî bû, agirê Newrozê hildikir. Li aliyê Aşê Nebo, li ser riya Korît, li Gaza Topê jî agirê Newrozê mêlîde dida. Bi şev dîmeneke xweş jî agirên Newrozê yên li çar aliyê Farqînê çêdibû.

Piştî van kurteagahiyên li ser Newrozê min divê gotinên xwe yên der barê Serê Gulanê de bidomînim. Li Farqînê, Serê Gulanê li gelek cihan dihat pîrozkirin; nemaze ew der cihên şînahî, cihên bi dar û ber, bi dehl û av bûn. Kaniya Navîn wan çaxan yek ji

wan cihê herî xweş bû. De îcar Kaniya Navîn wekî niha, lê xanî û avahî wisan zêde tune bûn. Hemû rez û baxçe bû. Roja Serê Gulanê te digot qey miletê Farqînê hemû kişiyaye vir. Hingî qelebalix dibû te xwelî biavêta jî merivan nediket erdê. Ji ber ku mala me jî li vir bû, min her sal ev pîrozbahiyên Serê Gulanê bi çavên serê xwe didîtin. Gel, ne tenê di vê roja biharê de dihat seyrana û xwarinên xweş jî xwe re çêdikirin, her wiha wan jî xwe re kêf dikir, firoşkaran jî malên xwe yên firotanê dianîn vir. Keç û xortan jî ji vê yekê para xwe hildida û bi hev re bazara dilan dikir, çavên xwe li hev diçêrandin...

Rojeke din a navdar jî çûna Ser Huvdeh e, ku ez qet neçûmê. Sedema gotina Ser Huvdeh jî ev e ku li gorî salnameya rûmî di huvdehê adarê de xelk diçe ser Tirbeya Şêx Muez Bin Cebel. Lê ev pîrozbahî çend rojan didome û ew hem wek şahiyekê hem jî wek bîranînekê tê pîrozkirin. Çîroka Şêx Muez Bin Cebel jî heye ku tê gotin ew kurê pîrê, tayê bi tenê bûye û bidergistî jî bûye. Lê di xezayê de şehîd ketiye. Li gorî gotina gotindaran Hz. Mihemed soz





gotin ku gelek gund lê hene. Rojên din ên girîng jî hene, wekî qereçarşemê (çarşema reş). Bi hesabê berê, çarşema dawî ya meha sebatê ye. Li gorî efsaneyê, Şahmaran diçe mala bavê xwe zêyî. Eger hewa xweş be Şahmaran bi şimikê diçe û wê salê mar pir in. Lê ku dinya şilî be Şahmaran daw û delingên xwe hildidin loma jî mar jê nakevin û wê salê mar hindik in. Qere-

daye diya wî ku dê wî bi saxî û silametî bîne teslîmî wê bike. Lê çi, ew di şer de şehîd ketiye, Hz. Mihemed jî, ji Xwedê daxwaz kiriye ku ew bi saxî lawê pîrê bigihînê û sozê xwe yê ku daye pîrê bîne cih. Daxwaza wî diçe qebûlê. Lê belê gava destên lawê pîrê û pîrê dikevin hev, lawik pê re dimire. Li ser vê yekê Hz. Mihemed soz dide pîrê ku her sal ew ê daweta wî bê kirin.

Kesên dîndar ji bo vê yekê û kesên din jî, ji bo şahî û kêfê diçin Ser Huvdehê ku bûye cihê miradan jî. Çend roj lê bazar tê danîn, firoşkar malên xwe yên firotanê dibin serê da ku bifiroşin, keç û xort jî, nemaze berê, ji bo ku li ser bextê xwe vebin, keç çelengsiwarên xwe, xort şîrînên ber dilê xwe bibînin, ji çûna Ser Huvdeh nediman. Tiştêkî din jî hebû ku gelek keç û xortan li wir hev direvandîn jî, an jî cihê wiha, nêçîrgeh e ji bo xort û keçên xama.

Divê em behsa çûna ser Quba Zîlan jî bikin. Li gorî hesabê kurmancî, di meha gulanê de sê çarşemên pêşî ev der tê ziyaretîkirin. Çarşema pêşî malbata şêx û zîlî, her du çarşemên li pey jî, gel diçe serê û li wir jî bazar tê danîn ku dibe wek panayîrê. Nemaze çarşema navîn dibe wek haşer ku ez bi xwe jî bi malbatî çend caran çûme serê.

Her wiha gelê Farqînê diçû ser Erqenîsê jî. Dîsan li gorî salnameya rûmî, di 15'ê tîrmehê (temûzê) de du yekşem (lehd) xelk diçû ser Erqenîsê. Ev der jî, tê bawerîkirin ku ava wê ji bo zerikê baş e. Erqenîs li nêzî Tewerzê ye û ji vê devera çiyayî re Narîk tê

çarşemên Serê Zîpan (ku jê re Zîpedar jî tê gotin); çarşema dawîn a sebatê û her du çarşemên pêşîn ên adarê ne ku 21 roj in. Di van rojan de kesên tawî û bawî diçin ser ziyaretan, biskên poran heta yên heywanan jî tîr jêkirin û ji vê yekê re zîpkirin tê gotin. Tiştên kevn tîr avêtin. Kes xwe naşo, kincên xwe naşon, neynokên xwe jê nakin û hwd. Di çarşema pêşîn û ya dawîn de jî şahî dihatin lidarxistin. Di gava zîpkirinê de jî ev dihat gotin: zîp, rîp, jan, jû, êş, elem, tawî, bawî tev çûn bi ava çem de. Ez dixwazim behsa hin kaniyên Farqînê jî bikim. Kaniya Navîn û Kaniya Mezin, kaniyên herî mezin bûn ku ava bajêr ji wan dihat. Jixwe stranek jî li ser van kaniyan heye: Kaniya Mezin kaniya dilan /nazewicim nazewicim/teşt û sîtil li navan milan/welehî nacewicim... Ava Kaniya Mezin pir bû û li berê çiltûk û titûn jî dihat danîn û çandin. Li Kaniya Mezin bendavek, ango sikurekî biçûk hebû. Di wexta me de lê qama mezin û qama biçûk hebûn, ku niha ser wan hatiye girtin û ava Farqînê jî vê kaniyê jî tê temînkirin. Kesên biçûk, zarok û yên ku bi soberiyê nizanibûn di qama biçûk de, yên ku bi soberiyê dizanîn jî di qama mezin de soberî dikirin. Peyva qam bi erebî ye ku tê wateya bejn û tel. Qama biçûk di ser serê zarokan re nediqlibî û cih hebû dihat navê cih jî hebû ku digihîşt heta ber qirîqê. Lê qama mezin di ser serê meriv re diqlibî. Aveke sar û zelal bû. Kesên xişîm û nezan ji ber ku binê ava zelal xuya dikir, ji wan kirê ku ne kûr e

xwe diavêtin qama mezin, îcar dikira ku bifetisiyana. Kesên soberber ew xelas dikirin.

Di vê ava kaniya Mezin de ez hînî sobeberiyê bûm. Gava min li Stenbolê li Lîseyê Pîşeyê ya Deryavaniyê dixwend, gelek kesên ji Deryaya Reş û Deryaya Spî hebûn ku nizanibûn ajnêberiyê bikin. Lê min dizanibû, loma bala gelek, heta mamosteyên me yên kaptan jî dikişand ku çawan derya li Amedê nîn e lê ez dizanim, îcar hevalên me yên ku ji ber deryayê hatine, nizanin.

Li ser Kaniya Mezin gelek bîrewerî û bîranînên min jî hene. Kaniya Mezin û Kaniya Navîn nêzî hev in, li heman taxê ne. Zarokên ji taxên din ên Farqînê havînê dihatin Kaniya Mezin ji bo ku xwe biavêjin avê. Dilê xwe hênîk bikin. Lê li vir gelek dizî jî çêdibû, heta hin kesan li ber çavên xwediyên wan diketin berîkên wan û pereyên wan dibirin. Ji tirsan newêribûn dengên xwe bikin. Gava em diçûn sûkê, îcar wan ji ber vê yekê bi hev re êrîştî me dikir û wan dixwest ku heyfa xwe ji me bistînin. Lê carek em ji Kaniya Mezin bûn, êrîtî û bêrîtî qet feyde nedikir.

Kaniya Qolekê li Kaniya Navîn bû, di zarokatiya min de cihekî tenya bû û êvaran jî warê araxxurên Farqînê bû. Serê sibehê li wî serî em radibûn diçûn ser kaniyê da ku tiştên ji ber wan mane, em ji xwe re bînin. Werin diyarê tiştên ku ji ber wan mabûn û tiştên ku wan li wir ji bîr kiribûn. Di navbera me zarokên taxê de ev yek dibû wek pêşbazî û hevrikiyekê. Yê jêhatî ew bû ku beriya her kesî biçe ser kaniyê û ji xwe re xenîmet bîne....

Niha meydana gogê, yanê sehayê topê li aliyê Ziraetê ye, lê di salên 70'yî de li cihê Xeraja Belediyê bû. Paşê li ser daxwaza şeniyên taxê, qada gogê çû Ziraetê. Cihê ku gava kesan li hev gef dixwarin hev dawetî wê derê dikirin, digotin tu mêr î ji min re were Ziraetê. Ew der dehl e, wan çaxan jî zêde xalî û tenya bû.

Mîn di serî de got ku min gelek tiştên destpêkê li Farqînê kirine. Yek ji wan jî diziya rez û baxçeyan e. Li Kaniya Navîn, di heyne me de çend mal tenê hebûn, ku dibû êvar em newêribûn ji dora malan zêde dûr biketina. Hingî dar û hêşînahî hebûn, bi me re tirs çêdibû. Gava wexta gihîştina fêkiyan dihat, rez û baxçe ji ber me nedifilîtîn. Nemaze havînan me fêkiyên diziyê dibirin ber sînemayê, ku niha Mizgefta Belediyeyê ye, difirotin û bi wî pereyî em diçûn sînemayê. Carinan jî ku havînê film li hewşa wê dihatin nîşandan, me yek bi pere dişand hundir, piştî ku film dest pê dikir ew dihat li ser dîwarê hewşê rûdinişt, em bi dîwar ve hildikişîyan, wî bi destê me digirt, em bi dizî diketin hewşê û me wisan li film temaşe dikir.

Di serî de min behsa rewşa siyasîbûna Farqînê kir.

Di sala 1984'an de ji bo xwendina lîseyê ez çûm Stenbolê. Piştî zanîngeh jî min li wir xwend û ez mam û mam. Di dema xwendekariyê de, bi kesên ku me hev nas bikira, dawiyê jî gotin dihat ser rewşa Farqînê û helwesta wan a xeberdana bi kurdî. Heta Carekê meleyekî ji Çewlikê ji min re got ku gava li Farqînê otobusa wan li ber Hepsa Kevn, li termînala otobusên navbajaran sekiniye, çûye xwarinxaneyê ku xwarinê bixwe, lê bi garson re bi tirkî qise kiriye, bê xwarin maye. Paşê xwe ranegirtiye ji garson re îcar bi kurdî gotiye 'Tu çima ji min re xwarinê nayînî, otobus dike rabe.' Garson jê re gotiye ku 'Te çima bi tirkî ji min xwest?' Nimûneyên vê yekê gelek in. Lê ez dixwazim yeka ku li ba min û piştî derbeya 12'ê îlonê li sala 1984'an filan qewimiye, vebêjim. Me derekeyên di kanekê çêdikir. Bekçiyek hat bi tirkî cixare ji dikan-dar xwest. Lê dikandar bi kurdî bersiv dayê û got 'Tune ye.' Camêr çiqas îsrar jî kir wî cixare nedayê û paşê bekçî lê xist çû. Me got 'Te çima nedayê?' Gote me: 'Ji Erxenyê ye, wekî min û te kurmanç e. Çima bi kurmançî xeber nade?!' Dikana camêr li hemberî qereqol û hepsê bû (ku niha her du jî ji wir rabûne).

Mîn xwest ez hinek behsa Farqîna zarokatiya xwe bikim. Wê Farqîna ku her cihekî wê, her bermahiyeke wê ya dîrokî xwedî çîrokekê ye û di çanda Farqînê de jî hê zindî ne. Tu behsa kîjan avahiyeke wê ya dîrokî bikî dê tegez çîrokekê der barê wê de bê gotin. Wekî çîroka li ser Deriyê Qulfayê, Pira Mala Badê û ya herî navdar jî çîroka Zembîlfiroş....

Bêguman tiştên ku li ser Farqînê bînin gotin zehf in, lê tenê min xwest ku ez hinekî ji bîranînên xwe binivîsinim û bi van çend gotinan, dawî li nivîsa xwe bînim. Farqînê ji ber vê rewşa xwe, ji ber kurde-warbûna xwe jî pir kişand. Careke din bû bajarê şehîdan, çawan ku di dema bîzansiyan de navê wê bajarê şehîdan bû. Li navrojê, li ber çavan gelek xweşmêr û mêrxas hatin kuştin li Farqînê. Gel neweribû li term û cendekan bibe xweyî, tirûş nedikirin ku cenazeyên xwe hilînin û tevî malbatên wan herin ser gor û mezelan. Wisan bûbû ku her roja Xwedê çend kes lê dihatin kuştin. Kiryarê van kuştinan jî, wisan ne nediyar in. Her kes dizane ku kirox kî ne û kî tetikêş bû...

Lê digel her tiştî Farqînê li ber xwe da, ji xwe nebihurî, ji nasnameya xwe, ji çanda xwe, ji doz û têkoşîna xwe gavek bi paş de neavêt, ji wan venegeriya. Bi rik û inyard li ser piyan ma...

Hevpeyvîn bi Şaredar Fadil Erdede re

Hevpeyvîn: Janbijan AR

Janbijan Ar: Gava ku Meya-Farqîn tê gotin çi tê bîra te, taybet(mend)iyên vî bajarê ku bi qasî mirovahiyê kevnar e çi ne?

Şaredar Fadil Erdede: Ez bixwe jî, wek hembajarekî, şaredarekî, li hemberî taybetmendiyên vî bajarê kevnar hê jî matmayî me. Li hemû erdnîgariya vî bajarî bifikirin:

Bajar, çiya, şekeft, gelî, deşt, berî û hwd. Her yek jê dewlemendiyek, her yek jê xwunçev û her yek jê kakilê welatê min ê xweser e. Ez li gelek deveran, di gelek sempozyûman de qala xwezadhîskirina niştecihên vî bajarê dikim û ez ê bikim. Ez li gelek deveran dibêjim: 'Divê em vê psîkolojiya bindestiyê ji ser xwe rabikin, ji ber ku serdestî û bindestî di sînorê mêjiyê mirovî de teşe digire.'

Ji bo ku em vê psîkolojiya bindestiyê di şaneyên mêjiyê niştecihan de wek peresaneke li dar bixin, me hîn bêhtir zorê da ser çand û zimanê xwe. Çand jî û ziman jî ne diyarî û lutfeke ku ji nişkan ve derketiye ye. Jixwe hebû û jixwe em bi saya serê wan têgehnan li ser piyan, çav li asîman, serbilind in. Dîsa de vera serbilindiyê ye ku zimanê bazara kirîdarî û firoşkariyê bi kurdî ye. Bi kurdiyeke xwerû kurmançî ye. Jixwe Farqîn bi vê taybetmendiya xwe jî tê hezkirin. Şîrîn e, mîna zaroka ku nûh bi meşê bikeve dilovan e.

- Ji bo ku qewmek bikaribe bibêje 'em jî hene' divê zimanekî wan ê yekgirtî 'jî' hebe.

Divê muzîka wan 'mohra' xwe li cîhanê dabe. Şaredariya Farqînê di vê pêngavê de çi kiriye?

Konfîçyus dibêje: 'Heger tu bixwazî miletekî êsîr bigirî, divê pêşî tu muzîka wan birizîni.' Stranbêjekî me yê navdar ê bi navê Şiyar Farqînî hebû. Ew sembola Farqînê bû. Lê gelekî zû tevî refê kerwanan bû. Hîn dema ku li Farqînê bû pê hesiya ku muzîka me tê rizandin, çewisandin û xeritandin. Bi hezaran muzîkên me tevî gotinên wergeriyayî bûne malê serdestên me. Şiyar, hay ji vê rewşê bû û serî hil da. Ligel bi hezaran muzîkên gelêrî yê wê herêmê, berê xwe da Ewropayê. Ev şoreşek bû. Keda wî nayê ji bîr kirin.

Ji bo ziman jî, ez dikarim vana bibêjim: Wekî ku min gava din jî qal kiribû, berî her tiştî em serbilind in ku zimanê bazarê kurdî ye. Tirs me ji bişavtinê tune ye. Li vê derê, malên me yê gel hene, komele, sazî û rêxistinên me hene. Tev de xebata pêşvebirin û pêşlêvekirina zimanê dikin. Her sal pîrozbahiyên me yê zimanê çê dibin. Me pîrsa 'ziman bi kêrî çi tê' jî xwe kir û dest pê kir. Haya Farqînê ji girîngiya zimanê heye.

- Mîrata bav û kalan?

Mirata bav û kalan, hemû herêmên Kurdistanê ye. Tu li kîjan tax û kolanê bigerî, binê kîjan kevirî, zinarî bipelîni, tu yê teqez mîrata bav û kalên xwe bibîni.



Ji ber ku, ya ku şaristanîyekê dike şaristanî mîrata bav û kalan bixwe ye. Di gelek serdeman de ev der şaristanîya mirovahiyê bûye. Dêtiyê kiriye. Ji Şikeftên Hesûnê bigire heya keleha Zembîl-firoş, ji Camiya Ecem bigire heya Pira Kemûkê, ji Deriyê Qulfayê bigire heya Minara Qot, ji Kaniya Mezin bigire heya Qula Hemîdoyî. Hey ku me qala Qula Hemîdoyî kir, ez dixwazim pevgirêdanekê bikim. Hemîdoyê ku ji navenda Farqînê ye, berî 45-50 salî serî li hemberî

pergala heyî rakiriye û her têkoşîya ye. Heger mirov ji wê dîrokê, ji wê serdemê danberhevdanekê bike, pîrsgirêka wî tenê bi pergala heyî re hebû ye. Ji ber ku kes an jî rêxistin, dema ku li hemberî pergala heyî serî radikin, piştî xwe dispêrin çiyê. Mêrxasiya wî ne tenê li Farqînê, li hemû welêt tê zanîn. Te dît gava din me qala mijara hewldana rizandina çand û hunera me kir, Ew çi bû û li vê derê çawa tê naskirin û serdestên me gava ku kirasekî li jîyan, berxwedan û têkoşîna wî kirin çawa hate lanse kirin.

Ew filmê bi navê 'Eşqiya Hemîdo' bixwe Hemîdo ye. Gotineke pêşyan heye, dibêjin: 'Diz û xwedîyê malê bi hev hesiyane', ma hewce ye ku ez tiştêkî din lê zêde bikim. Heya ji me hat me

bermayiyên wan parastîye û heya ji me bê em ê biparêzin. Em bixwe jî mîrat û bermayiyên wan in.

Çawa ku em xwedî li xwe dertên divê hîn bêtir em xwedî li wan mîratan jî derên. Restorekirin be çi be êdî, tiştê ji destê me hatiye me kiriye û em ê her bikin. Ji ber ku yên mayînde ne em in, lê mîrata me bixwe ye.

- Te gava din qala Keleha Farqînê kir, dîrok û dîrokçeya wê çi ye, heya niha xebateke bi rêk û pêk hatiye kirin an na?

Belê, heya niha gelek nivîskar û lêkolîner hatine vê derê û bi awayek zanistî lêkolîn kirine. Bi kurtasî dikarin vana bibêjim.

Avakirina Keleha Farqînê, digel ku baş nayê zanîn jî, li gorî çavkaniyên heyî, Berî Zayînê di sala 77'an de, gava weke paytexta qiraliyeta Tîgranê Mezin hate damezirandin, keleha bajêr careke din hate avakirin û di pey de di serdema bîzansiyan de bi awayekî rêk û pêk car din hete restorekirin. Di serdema Împaratoriya Bîzansê Arkadyos de, alimê Suryanî Mar Marûtha ku ji Farqînê ye, ji qiralê Sasaniyan Yezdgîrtiyê I. re weke elçî tê şandin û di serdema herba Şapûrê II. de şehîd dikevin, dibine binê wê birca ku niha hestiyên çil heb began tê de veşartî ne. Sedema ku navê 'Çil'an' lê kirine jî ev e.

Dema ku rêveberî di destê Hamdanî û Merwaniyan de bû, hin bircên din jî bi kelehê ve dikin û hinekî din tê asêkirin.

Keleh, bi kevirên kalterî yê ku niha li herêmê hene hatiye avakirin. Bi navbereke 25 metreyî bi 50

bircî hinekî din tê asêkirin. Ev dîrok hîn ji dehan yek e.

- Di salên 90'î de, li Farqînê, her roj, li serê her kolanê, li binê her kevirî buyerên failên kiryar nediyar diqewimîn. Ev qewimîn, bandoreke çawa li ser niştêcihan kir?

Farqîn her tim hedef bû. Sedema tekane ya vê hedefbûnê welatparêzî bû. Welatparêziyeke bi her awayî welathezî bû. Niştêcihan bi çavê 'herêma rizgarkirî' li Farqînê dinihêrtin. Çima, ji ber ku bi çanda xwe dijiyan. Çima, ji ber ku zimanekî wan ê din tune bû. Çima, ji ber ku ev rewş devera fikaran bû. De ka bêje çima?

Di wan salan de, li derdora 800 rêhevalên me ji ber van çimayîyan jiyana xwe ji dest dan û bi hezaran malbat, koçîmal koç kirin. Heger eksena bîrdozîyê bihejiyana, dê di wan salan de bihejiyana. Lê na, 'her ku wan em kuştin, em pirtir bûn' û jixwe gava ku wan ev rewş fêm kirin em hîn bêtir bi ser ketin.

- Dema ku tu bi çavekî sêyem li tevahiya Farqînê binihêrî, tu yê bixwazî çi bibêjî?

Rast e, divê hemû rêveber û kesên xwedî însiyatîf bikaribin bi çavekî sêyem rewşa heyî, pêşewa û paşewatiyê binirxînin.

Ev peywira me ye. Jixwe ji bo ku em bikaribin çavê xwe yê sêyem biafirînin, divê rexne û xwerexne her hebe. Ji sedî nod û pênc em xwe rexne dikin û dinirxînin û ji sedî pêncê ku dimîne jî ji sedemên din re dihêlin. Jixwe ne wisa bûna em ê bi ser neketina. Lê divê rexne û xwerexne jî bi metodeke zanistî bê kirin. An na, têkçûyîn li ber derî ye. Bi kurtasî, xebateke bi rêk û pêk û serkeftî bi rexne û xwerexneyî yê pêkan e.

- Ji bo ku te deriyê xwe li me re vekir û germahiya dilê xwe da tengala dilê me, em ê her bi te serbilind bin.

Spasdar bin, germahiyeke xweş bû. Kirasê tevgerê him mezin e him jî germ e. Têrî hembêzkirin û xwedîlêderketina her kesî dike.



Hemîdo

Rûşenî û dilgeşiya Silîva

Omer FÎDAN



Li Kurdistanê gelek festîvalên gelêrî yên herêmi hene. Di serî de Silîva û Pasûr li Amedê û hemû navçeyên wê festîvalên ku hinik jê ji hezar salî zêdetir e tîr lidarxistin hene. Her navçeyek, her bajarokek, heta her gundek li gor xwe şahiyekê li dar dixê. Em dikarin van pîrozbahîyan, festîvalan, şahîyan, komcivînan, kevneşopîyan bi du awayan bigirin dest; ên ku ji hêla hêzekê, erkekê, saziyekê, kesan, rêveberiyên herêmi ve an jî dewletê ve tîr lidarxistin (yên ku tîr organizekirin) û yên ku bi awayekî xwezayî pêk tîr (yên neorganîzekirî). Yê ku tîr organizekirin bi piranî di derbarê çand, huner, wêje û carinan jî di derbarê ew tiştê ku gelê wê herêmi debara xwe pê dike an jî ew bajarok, gund, navçe an jî bajêr pê tê nasîn de ye. Wek mînak li Pasûrê li ser hevrişim, li Bîstmalê li ser helanîna ceh û genim, li navenda Amedê li ser zebeş, hwd.

Lê yê neorganîzekirî, her wekî ku me nav jî li wan kir, ji hêla erkekê ve nayên lidarxistin, bi awayekî xwezayî pêk tîr, êdî bûne kevneşopî, wek hêmaneke çandî di nav gel de cihê xwe girtine. Gelek mirov jî gundên cihê, ji navçe û bajarên cihê li qada festîvalê (ku ew qad bi giranî di heman demê de cihê seyrane ye jî) tîr cem hev û bi awayekî xwezayî festîval li dar dikeve. Ev kesên ku tîr qada festîvalê bi giranî nizanin ka ew pîrozbahî çima tê lidarxistin, ji kîngê ve tê lidarxistin an jî orîjîna wê çi ye. Piraniya pîrozbahî û festîvalên bi vî rengî jî bo bazirganiyê hatine lidarxistin. Armanca bingeîn a ku ew şahî xwe dispêrinê ne bazirganî be jî, ya ku bi sedan salan ew domandî bazara li qada festîvalê ye. Her niştecihek tiştêkî tîr ku li wir bifiroşe an jî ji bo kirîna tiştêkî tê wir. Kes napirse ka ew kesên ku hatine wir ji ku ne, ehlê kîjan olî ne, an jî kesekî ew vexwendî yan na. Wek mînak; misilman li ser goristanên hinek gundan tîr cem hev ku ew gund heta 80 sal berê jî gundên ermenîyan bûn, ji tîrbeyeke di nav wê goristanê de

re dibêjin 'tirba şêx' û li derdora wê tîrbê hin çalakîyên ku li ser goristanên misilmanan li dar dixin pêk tînin. Ev yek nîşan dide ku cîraniya gundên misilman û ermenîyan çiqas xurt bûye û bi hev re jiyaneke çiqas hevpar jiyane. Her tiştê xwe bi hev re kirine, her yek jî wan xwedî qabîliyetekê bûye û ew qabîliyetên xwe bi hev re par ve kirine, jî hev sûd wergirtine.

Her tîrbe an jî festîval xwedî xwe û efsaneyekê ye. Her gundiyeke orîjîna van festîvalan li gor bawerî û çanda xwe şîrove dike û digihîjîne encamekê. Her dengbêjek çîroka van festîvalan bi awayê xwe dibêje. Lê tiştêk li holê ye û diyar e ku mirov mecbûr in baweriya xwe bi tiştêkî bînin, bi mirovên din re tîkiliyan deynin, bazarê/bazirganiyê bikin, ji ber van yekan mecbûr in ku tiştên bi vî rengî bikin û bidomînin û dîkin jî. Ji ber ku ihtiyaca her kesî/ê bi vî yekê heye, tu kesî jî van festîvalan re îtiraz nekiriye, tew jî bo van festîvalan efsaneyên xwe afirandine û baweriya xwe bi wan efsaneyan anîne û heta îro domandine.

Hin tiştên van festîvalan hene ku dişibin hev. Di hemû festîvalên bi vî rengî de gel li dora tîrbeyeke dicive, ji bo 'tirba şêx' a di wê gorsitanê de diayan dike, qurbanan dide û li derdorê bazara xwe dike. Û helbet keç û xortên ciwan cilên xwe yê herî xweş li xwe dîkin, xwe dixemilînin da ku belkî hevsera/hevserê xwe li wir binasin û gelek ciwan li wan festîvalan dil digirin, dilîkî dibin, hev direvînin û dizewicin.

Festîvalên bi vî awayî yê herêma Amedê yê bi beşdariya herî xurt ku tîr lidarxistin û hewceye ku mirov bi taybetî li ser bisekine û bişopîne Hefdehê Adarê (Ser Hefdeh/Hefdehê Badikan) (Silîva, Pasûr, Sason), Serê Gulanê (Silîva, Pasûr, Bîstmal di serî de gelek navçeyên din), Sersal (li hemû navçe, gund, bajarokan) Çiyayê Andokê û Berbihîv (Pasûr), Şêx Evdîrehmanê Axtêpî (Bîstmal/Çinar), Eshabul Keyf (Licê), Çarşema Reş (Silîva), Enûş



Pêxember (Erxen) û hwd in. Wek ku tê dîtîn jî festîvalên bi beşdariya herî zêde tîn pîrozkirin yên herêma Silvîyan in. Ez ê niha bi kurtasî behsa festîvalên Silvîya bikim.

Hefdehê Adarê (Ser Hefdeh/Hefdehê Badikan)

Herwekî festîvaleke neorganîzekirî, Hefdehê Adarê nêzî tirba Îmam Xezalî ya li gundê Emerka, di navbera Pasûr, Silvîya û Sasonê de tê lidarxistin. Ji ber hêsanîya çûnhatina ji Silvîya, piraniya beşdarên vê festîvalê Silvîyî ne. Herwekî hemû festîvalên din ên neorganîzekirî, ev jî xwedî xwe û efsaneyekê ye ku gelek versiyonên wê hene. Hefdehê Adarê yek ji festîvalên herî kevn e û bi beşdariya gelek kesên ji gelek deveran tê lidarxistin. Di vê şahiyê de mirov dikare hemû rengên herêmê bibîne, bi taybetî jî piştî ku gund hatin şewitandin û niştecihên herêmê koçî bajarên bûn di vegera li welêt de bi xwe re gelek kesan jî tînin, niha jixwe festîvalên bi vî rengî dibin sebeb ku niştecihên herêmê cih û warê xwe ziyaret bikin. Bi hezaran kes jî navçe û bajarên wek Sason, Pasûr, Silvîya, Licê, Amed, Êlih, Çewlig, Hezro, Mêrdîn, hwd, bi cil û bergên xwe yên herî xweş, xwarinên herêmî û yên ku dizanin lêdin bi erbaneyên xwe tevli daweta Muez Bin Cebel, serfermandarê îslamê

yê berê, ku demeke nêzîk dimîne ji daweta wî re di cîhadê de şehîd dikeve dibin.

Li gor efsaneyê, dema ku artêşa îslamê tê ku herêmê bi dest bixe, Muez Bin Cebel yek ji serfermandaran bûye. Kurê diya xwe hew ew bûye û ji daweta wî re demeke hindik maye. Herçiqas diya wî nexwaze ku here şer jî, diçe û şehîd dikeve. Dema xebere şehadeta wî digihîje diya wî, diya wî jî dikeve û dimire, hesreta daweta kurê wî ku ew ê di 17'ê adarê de bûya di dilê wê de dimîne (Ev 17 li gor salnameya ku kurd bi kar tînin e, yanê li gor salnameya mîladî 30'ê adarê ye. Tirba Muez Bin Cebel li cihê ku şehîd dikeve çêdikin û li serê pozekî li hember tirba wî jî mezelekî ji bo diya wî çêdikin.

Piştî ku ev xeber ji hêla Xelîfe ve tê bihîstin, ferman dide ku her sal di 17'ê adarê de ji bo Muez Bin Cebel dawetek li cem tirba wî bê lidarxistin. Ji gelek deverên herêmê, ji hemû netew û olên herêmê gelek kes sê roj berî dawetê (14'ê adarê) tînin, li qada di navbera herdu mezelan de dicivin û dest bi dawetê dikin. Gelek listikên gelêrî dileyzin, civatan dikin, dengbêj distrin, hesp tînin bezandin, kirîn û firotin, xwarinxane ava dibin, çaya ser agir tê çêkirin, gelek konên bazirganiyê tînin vegirtin, qêrînan bazirganan olan didin; erzanî li vir danî! Benîştê daran ku ji bo mehdê mirov derman e, qehwa şengêlan, bestenîya kulahan, şîraniya helqe,

ji bo zarokan gelek pêlistok, kulîlkên rengîn, ajalên curbicur tîr kirin û firotin. Hemû beşdar li qada navbera herdu mezelan digihên hev, li erbanê didin û dest bi dîlanê dikin. Piraniya govendgêran mela û feqiyên medreseyan in.

Ji ber ku gelek kes beşdarî vê dawetê dibin, Ser Huvde cihê herî baş e ji bo keç û xortên ciwan ku hev bibînin. Di şahiyên de hev dibînin û heke ku ji hev hez bikin, hev direvînin cem mala giregirekî herêmê da ku bibe alîkar ji bo zewaca wan. Carinan gel ji sê rojan zêdetir li qada festîvalê dimîne, hinek ji wan konên xwe yên biçûk bi xwe re dibin û di wan konan de dimînin, hinek ji wan dibin şahidê mazûvaniya niştecihên gundên derdorê û hinek ji wan jî ji bo ku qismetê wan vebe li qada di navbera tirba zavê, Muez Bin Cebel, û dayika wî de radikevin. Baweriyeke bi vî rengî heye ku dibêjin di dema dayîna rojê de ew ê hevserê/hevsera xwe di xewna xwe de bibînin.

Roja dawîn a festîvalê, 17'ê adarê, her wekî hemû dawetên gelêrî yên kurdan, hinek jinên navsere û keçikên ciwan ji bo zavê hineyê hevîr dikin, heta berbangê li dor tirba zavê mûmikan digerin û dawiyê jî wê hineyê li hemû xort û keçikên li wir belav dikin da ku pê destê xwe hine bikin ji bo ku di demeke kin de qismetê wan vebe.

Serê Gulanê

Herwekî festîvaleke neorganîzekirî, Serê Gulanê jî, geştirin festîvaleke ku li Silîva tê pîrozkirin e.

Hema bêje li hemû navçeyên Amedê ev festîval tê li dar xistin lê her li yekî bi awayekî cihê, li cihê cihê tê pîrozkirin. Wekî hemû festîvalên din ên neorganîzekirî, tu kes nîzane ku yekemîn car kîngê, çima, çawa, li ku derê Serê Gulanê hatiye pîrozkirin lê li hemû deveran roja 14'ê gulanê ya mîladî (li gor salnameya ku kurd bikar tînin 1'ê gulanê ye). Bi taybetî li Licê, Pasûr, Hezro û Silîva tê lidarxistin lê beşdariya herî zêde li Silîva ye. Li piraniya deveran wek şahiya dawetê ya baranên dawîn ên avrêlê an biharê tê pîrozkirin. Hema bibêje hemû silîvî amadehiyên xwe dikin, xwarinên xwe yên herî xweş çêdikin, ji ber ku her kes diçe pîrozbahiyên Serê Gulanê, li nav bajêr ew roj kes naçe mîvandariya kesî, kes ew roj nazewice. Hemû niştecih cilên xwe yên herî xweş li xwe dikin, bi heval an jî mirovên xwe re goristanên xwe an jî tirba şêxekî herêmê wek Şêx Emînê Qadîrî ku li Bêzwanê, li kêleka Bendava Êlihê ye ziyaret dikin, ji bo miriyan diyan dikin, qurbanan didin. Herî zêde beşdarî li Bêzwanê, Mala Badê, Quba Zilan, Kaniya Navîn, Şikeftên Hesûnî û Sextê çêdibe ku li derdora hemûyan cihê seyrane yên xweş hene. Ev çend sal in ku Şaredariya Silîva û Komeleya Silîviyan a li Amedê tûran amade dikin û Silîviyên ku li herêmên din dijîn bi saya van tûran tevli pîrozbahiyên Serê Gulanê dibin. Beşdariya herî zêde li Bêzwanê ye. Beriya her tiştî mirov li derdora tirba Şêx Mihemed Emînê Qadîrî dicivin, ji bo wî, miriyan xwe û jiyanê baştir diyan dikin û berê

xwe didin cihê seyrane ku li kêleka Bendava Êlihê ye. Van salên dawîn ji deh hezaran zêdetir kes ji hemû deverên Tirkiyeyê tevli van şahî û pîrozbahiyên dibin. Tu kî dibî, ji ku dibî bibe hemû mirovên li wir wê bi kêfxweşî mazûvaniya te bikin û xwarina xwe bi te re parve bikin.

Sersal

Pîrozbahiyeke girîng a din jî ku bi beşdariya gelek kesan tê lidarxistin û herî xweş li herêma Silîva tê pîrozkirin Sersal e. Ji bo





kurdan sersal derfeteke pir xweş e ku şa bibin, kevnêşopiyên xwe bi bîr bînin û li gor kevnêşopiyên xwe tevbigerin. Êvara 14'ê rêbendanê, ku li gor salnameya kurdan serê rêbendanê ye ango serê salê ye, beriya roj here ava ciwanên gund an jî taxê tîn cem hev, du ciwanan dixemilînin, yek dibe kalik û yek dibe pîrika sersalê. Kalik rûyekî ku ji heriya mihan hatiye çêkirin bi xwe ve datîne, darekî dike destê xwe, cil û bergên gelêrî yên bav an jî kalê xwe li xwe dike û hevala wî/pîrik jî cilên gelêrî yên jinekê li xwe dike û bi hemû ciwanên taxê an gund re li hemû malan digerin. Ciwan heta derengiya şevê pere, xwarin, nanik, vexwarin, hwd kom dikin. Çi bixwazin gundî an jî niştecihên taxa wan didin wan, lê divê ku bi dia, stranên û govenda xwe ya li devê derê wan heq bikin. Wek mînak li gor rewşa malê, kesê/kesa ku derî vedike stranên cihê, metelok, çîrok û diayên cihê dikin.

Ji bo bûkên nû dibêjin;

Serê salê binê salê

Xwedê kurekî bide vê malê

Ji bo malbateke ku ezepên wan hene dibêjin;

Serê salê binê salê

Xwedê bûkekê bide vê malê

Stranên gelêrî dibêjin, govendê digirin û ji bo ku xwediyê malê şa bibin pere û xwarinê bide wan çî pêwîst be dikin. Dema ku diçin ber deriyan kes nikare ji wan re tiştêkî xerab bibêje an jî dilê wan bihêle lê carinan hinek cîrnexweş avê bi wan dadikin an jî derî li wan venakin lê bi piranî bi şadî, rûşenî, dilgeşî derbas dibe Sersal.

Di dawiya şevê de hemû ciwanên gund an taxê

xwarinên ku kom kirine dipêjin û heta serê sibê govendê digirin, kêfê dikin û xwarinên xwe dixwin. Kalik û pîrika sersalê ji bo ciwanan û gundiyên din diayan dikin, ji bo ezepan dia dikin ku hevserên herî baş ji xwe re bibînin û ji bo kurdan diayan dikin;

Xwedêyo pezê me mê bînin

Xwedêyo bûkên me nêr bînin

Di dawiyê de, xwarina ku ji ber wan dimîne û pereyê xwe li hev parve dikin û her kes diçe mala xwe.

Ji bilî van şahî, pîrozbahî, kevnêşopiyên civakî yên ku min li jor behs kir gelekê din ên wek Çarşema Reş, Erqenîs, Quba Zîlan, hwd li herêma Silîva hene ku divê mirov yek bi yek li ser bisekine û kûrahiya baweriyên, pevgerêdana civakî, jiyana hevpar, çanda qedîm, xwezaya rengîn bi her awayî bişopîne û çavdêriyê bike, belgefilmên zindî, çîrok û lehengên kurdan ên nemir, stranên ku xemgîniyê, bêbaweriyê, tirsê, bindestiyê awaz awaz dikin bibîne.

Li ser Newroza li Silîva jî ez ê tenê bibêjim ku ne peyvên min têr dikin ku ez vebêjim û ne jî weşana ku ez ji bo vê nivîsê dinivîsim dikare nivîseke ew qas dirêj biweşîne lê ez ê bi tenê pêşniyar bikim ji we re ku we li ku derê Silîviyek ji sih salî mezintir dît bipirsin ka ku Newroz çawa li Lehfê Silîva (çiyayê seriya Silîva) dihat pîrozkirin, arê Newrozê çiqas bilind dibû û çî stranên serhildêrî, berxwedêrî û kurdewariyê dihatin gotin.

Farqîn: cayê zafkultur û medenîyetî

Mehmûd NÊŞITE

Farqîn hetê tarîxî ra bajarêko qedim o. Derheqê awankerdişê Farqînî de tarîxêko qet'î nika ma destî de çinî yo. La goreyê belgeyanê ewroyênî Farqîn wextê Asuriyan de awan biyo. Verê biyayîşê Îsayî serra 77î de paytextî kerdo.

Dewrê Hz Emerî (Omer), serra 639î de Îlyas Bîn Ganmî, Farqînî destê Bîzansiyan ra gêno. A roje Farqîn kuno destê musulmanan.

Farqîn, dima kuno destê Hemdan, Mervan, Împaratoriya Selçuq, Artuk, û Eyyubîyan. Dima hetê Moxoliyan ra îstîla beno. Bi nê îstîlayî Farqîn beno sey xirbe maneno. Dima zî dewletê Îlhan, Akkoyun û Karakoyunîyan Farqîn de hukum kenê.

Hetê coxrafiya ra zî cayê Farqînî cayêko taybetî yo. Farqîn hetê vakurî ra pašta xo şayo Koyê Elbatî.

Tiya ra 40-50 serrî verê cû binê nê koyî de bi nameyê "Kaniya Mezin û Kaniya Navîn di hênîyê girdî bibî. Hetanî 40-50 serr verê cû zî awa nê her dî hênîyan qimê Farqînî kerdêne. Farqînîjî nê hênîyan ra hem awa keyeyê xo temîn kerdêne hem baxçeyanê xo aw dêne hem çend arêyanê xo zî çarnêne. Nê hênîyan ra hetanî sînorê surê Farqînî pêro rez û baxçeyî bî. Nê rezî û baxçeyî bi awa nê hênîyan ameyne awdayîşî. La çi heyf ke nika ê rez û baxçeyan ra yew lemêk zî nêmento. Ê cayê pêro biyê banî.

Hewna ê wextan no ko û nê hênîyî semedê weyekerdişê dewaran yew nimet bi. Wisar û hamnan mîyanê kerranê nê koyî de qasî çokêke vaş vejîyêne. Pey nê koyê Elbatî zî heme velg bi. Şiwanan hele de dewarê xo serê nê koyî ra serecêr kerdêne û verê înan dayêne serê Kaniya Mezin. Ser awa serdine. Hetê başurê Farqînî zî sey palasêka derg û dila deşt a. Mîyanê nê deştî de ca-ca newalê xorî û gazê berzî est ê. Na deşte, deştêka bereketin a. Hêgayanê nê deştî de zafane xele û cew ramîyeno. Ca-ca zî bos-



tanî ramîyenê û nê bostanan de zebeşî û beşîlayê (qawune) zaf şîrînî resenê.

Hetê rojhelatê Farqînî ra rayîrê şarisatanan yê Êlih, Sêrt, Betlîs û Muşî şîno. Hetê rojawanî zî Dîyarbekir o. Yanî Farqîn mîyanê rojhelat û rojawanî de wazîfeyê sey yew pirdî vînenê û bajarane rojhelatî û ê rojawanî yewbînan wa girêdano.

Farqîn hem hetî nê tarîxî ra hem zî hetê nê caxrafyaya zengînî ra bîyo arêyê kulturî. Hetê edebîyatê fekî ra, hetê perwerdeyê medreseyan ra û hetê heme beşê folklorî ra wayîrê dewlemendîyêka bê hed û hesab a.

Hetanê nê serranê peyênan zî Farqîn de şarê armenî bibî. No şar wayîrê kulturêk bi. Ewro nê şarî ra yewêk zî nêmendê. Dewlete nîfaqan dekerd mîyanê şarê musulman û şarê armenîyan. Şar zî cahil bi û bi nê nîfaqan bawer kerd. Peynîya-peynî de her dî hetî kewtê pê û dê pêro. Dima şaro armenî mecbur mend koç kerd. Ê koç kerdê şîyê la kulturê înan ra zaf çî mend.

Ewro mi bi xo bêrîya musabeqaya şikitişê hakanê înan kerdê. Roşanê înan ê hakan de ma şîne roşanê înan, înan zî hakan dene ma.

Hetê senet û meslegan de no şaro armenî xizmetêko zaf pîl kerdêne. Kar û gureyê asinî, kar û gureyê sifrî û ê qawaqî (merî, dêza, kup...) nê kesî kerdêne.

Hetanî serra 1980 zî Farqîn de kurdê kurmanckî û ê kirmancî sey di kurdê serek têreyde ciwîyêne. Kar û gureyê dewaran kirmancan (zazayan) kerdêne. Zazayêke taxa serê surî de bi, dewarê hemine bibî. Goşt, şit û mastê Farqînî şaro zaza temîn kerdêne. Hema, hema qesabê Farqînî pêro zî zazayî bî. No şaro zaza hetê Çewlîg û Lîcê ra amîbîy Farqîn. Xeynê nê şaran şaro êzîdî bibi. Şaro ereb, şaro macir (Betlîsîjan ra vajîyêne) bibi. Şaro xerzî bibi. Nê sebebên ra Farqîn hem wayîrê kulturêko zengîn hem wayîrê tewir-tewir urf û edetî bi.

Nê zengînîya kulturî tesîrê edebîyata fekî û tesîrê folklorî zî kerdê. Hetanî serranê 1950-60an de şarê Farqînî seba dîwanî seba terraqî şîne keyeyanê yewbînan. Zafane zî ê zimistananê xîdaran de, wextê puk û xezebî de wexto ke vewre qasî qamêke kewtêne, şar şewe şîne konaxan verê lambaya donî de dîwan kerdêne: Deyîran vatêne. Hîkayeyan vatêne. Çibenokan persayne. Kayê ke merdim eşkayêne yew oda de kay bikero, kay kerdêne.

Hîkaye û destanan ra, Destanê Memê Alanî, Sîyabendê Silivî, Zembîlfiroş û ê Mirze Mehemedî zaf meşurî bî. Bê nê hîkaye û destanan fable yê ke heywanan ser o vajîyêne, vatêne. Estande "Lajê Pîre û Hewt Dêwî" û fabla "Luye û Verg"î vatêne.

No tewir têkîlî û eleqeyê cîranan tesîrê zîwanî zî kerdêne. Nê dîwan û qonaxan de zafêr bi dîyalekta

kurmanckî qal û qisê bîne. Şaro ke kirmancî (zaza) bi zî şîne nê qonaxan û goştariya nê hîkayeyan kerdêne. Hem îrtibatê ekonomî hem îrtibatê no tewir sosyali zazayanê Farqînî mecburê musnayîşê kurmanckî kerdêne. Hetanî ke tena şarê zazayî nê, şaro bîn zî sey şaro ereb kurmanckî musaynê.

Mi cor de qala Zembîlfiroşî kerd. Ez wazena tîya de bi çend cumleyan behsa efsaneyê Zembîlfiroşî bikerî.

Efsaneyê Zembîlfiroşî zî hîkayêka heskerdişî û ê eşqî ya. Şarê kurdî ra û şarê Farqînî ra zaf kes na hîkaye zanê. Na hîkaye zî sey hîkaya Sîyabend û Xacê sey hîkaya Mem û Zîne û sey ê Yusuf û Zuleyha biyê babetê kilam û deyîran û kewta fekî deyîrbazan. Ê deyîrê ke benê şerabê eşqî û dewqa merdimî benê û merdimî serxoş kenê!

Zembîlfiroş zembîla tine/ Dikan bi dikan di gêrîne/ Hiş li Xatûnê namîne/ Serî li zeman di gerîne/Gazî dike ku bibîne/ Were ser doşeka mîr e/ Li te, herama mîr e/ Bidime te zulfi harîr e/ Çavê min ê xezalan e/ Sîngamin wek zozana ne

Bejna min wek rihane/ Çîqa bêjî hêjan e./ Zembîl-rotox zembîlan ano/ Dikan bi dikan çarneno/ Hiş Xatun de nêmaneno/ Sere, zemanî ra çarnena/ Veng dana seba bivîna/ Bê ser doşekê mîr î/ To rê yo heramê mîr î/ Bidî to biskê rind î/ Çimê mi ê xezalan ê/ Gerdanê mi sey ware yo/Bejna mi sey rihan a/ Senî wazenê rind ê)

La na hîkaye sey hîkaya Mem û Zîne nîya, eke yewbînî ra sey gêj û xîntan heskerdêne. Na hîkaye, sey hîkaya Ferhat û Şîrîne nîya eke Ferhadî seba Şîrîna xo koyî qule kerdê. Na hîkaye, hîkayeya eşqa yew xatun a. Na xatun a ke seba eşqê xo fek mêrdê xoyê Mîrî ra vera daya û kewta Zembîlfiroşî dima. Na hîkaye zî sey zaf hîkayanê eşqî peynî ci bi mergî yena. Ewro hetê edebîyatê nuşteki de edebîyatkarê namedarî vejîyayê. Şaîro verên yê Farqînî Sîyapoş (Siyehpûş) o. Goreyê malumatane Rojen Barnasî Sîyapoş; "Serra 1868î de ameyo Farqîn. Wextêko ameyo Farqîn 20-25 serrî bîyo. Destanê ey yê ke bi-nameyê Seyf ul-mulûk o, mîyanê meleyan de yeno naskerdiş. Celîlê Celîl SEYFULMULUKê ey Serra 2000î de Vîyana de çap kerdê".

Edebîyakerê Farqînî yê nê serranê peyênan ê ke yenê şînasnayîşî; Rojen Barnas, Zana Farqînî û Dilawer Zeraq ê.

Ne Farqîn, Silîva...

Feratê DENGİZÎ



Dem û dewran her tiştî vediguherîne. Helbet veguherîn baş e, lê ne her tim û car carinan tişt ji esl û fêslê xwe, ji xweseriya xwe, ji eslê xwe, ji cewhera xwe bi dûr dikeve û xasîtiya xwe, reseniya xwe winda dike.

Bi ya min navê Silîva jî wisa ye...

Ez ne qala çend gundên quntarê çiyê, yên derdora **Narîkê** ku Siyahpûş jî li wir jiyaye, dikim. Bi taybetî di demên berê de û niha jî, dema ku tê gotin 'Silîva' wir dihat/tê fêhmîkirin. Lê min got, ez ne qala wir bi tenê dikim. Silîva, ne wira bi tenê ye.

Ez bi du xalan dixwazim meseleyê rave bikim û fikra xwe bibêjim;

Di her demê de, alavên aboriyê ji ber rewşa erdnîgariyê bandoreke mezin li ser jiyanê kirine û dikin.

Ji ber erdnîgariya Kurdistanê, erdnîgariya welatê me her tim bi du awayan, wek her erdnîgariyê, hatiye binavkirin; **Deşt û çiya**; ez dibêjim, '**Milî û Zilî**'

Di nava gel de, bi taybetî ji çiya re '**mil**' jî tê gotin; wek Eşîra **Milan** (çiyayî ne û warê wan ji derdora Qerejdax û ber bi Çiyayê Mazî ve ye) yan jî Zaravayê **Dimilî** (tê zanîn ku erdnîgariya zaravayê kirmanckî çiya ye.) Dîsa tê zanîn ku li deştê bi zêdeyî **zil** (têkiliya vê bêjeyê bi **zîl-zîlan** re jî heye û tîpa '**z**' bi veguherîna werarî weke '**s**' hatiye guherîn û telafûzkirin) şîn tê û di serdemên kevn de zil, malekî (**meta**) ji malê bazirganiyê yê herî girîng bû. Ji baniyê avahiyên bigire heta di kurtanê ker û qantiran de dihat bikaranîn û selik, merkeb, hesîd, werîs, ben, şerît, pênuş (xame-dîvî), çît, tîr û gelek alavên jiyanê tev jê dihatin çekirin. Yanî, heta dema sermayedariyê jî madeya xam a gelek tiştan bû û herwiha girîng jî bû... Bi zêdeyî li derdora Çemê Tîjle* (Dicle), Dešta Silîva, derdora Geliyê Zîlan, dešta di navbera Zaxo û Amediyê de (ku navê wê deştê jî Dešta Silîva ye) digihîşt, bazirganiya wê dihat kirin û navenda vê bazirganiyê jî

bajarê Silîva bû ku piştî serdema Îslamê navê wê bû **Farqîn** an jî bi reseniya xwe **Meyafarqîn** an jî **Mayyafarqîn** (Dema Merwanîyan). Farqîn navekî erebî ye û jî serdema îslamê û vir ve tê bikaranîn. Vê veguherînê bandora xwe bi neyînî li ser kesayet û çînê kiriye. Ji wê demê û vir ve ligel payebilindî û giranbuhayiya dîrokî ji bo me kurdan, şeweyeke neyînî jî daye beşên civaka Silîva...

Bi ya min **zil**, bûye nîşana deştê. Û warê ku **zil** lê hatiye hilberîn jî bi **siliv**, **Silîva** hatiye binavkirin ku nîşana herî girîng navê **Siyabendê Silivî** ye. Lewra bi kurdî-kurmancî **Silîva** navenda bazirganiya **zîlê** û navenda dešta Bakurê Kurdistanê bû/ye.

Jixwe niha, di dema me de ji şênîyên navenda bajêr pê ve tu kes nabêje **Farqîn**, derdor û hemû welat dibêjin **Silîva** û ev ne tiştekî ji rêzê, ketber û lêhatin e. **Silîva** him navê navenda bajêr e û him jî navê herêma ji Serhedê heta Zaxoyê ye.

Xala duyemîn, ji aliyê ziman ve ye. Wek ku tê zanîn devokên her zaravayî hene û sê devokên zaravayê kurmancî jî hene; **bohtî**, tê zanîn ku devoka Botanê ye, **mehmedî**, mirov dikare bibêje devoka Behdînan heta Colemêrg û Wanê û **silivî** jî, devoka ji Serhedê heta Zaxo û Amediyê ye. Kêm zêde mirov dikare wiha rave bike. Ev jî nîşan dide ku navenda devoka silivî jî, Silîva ye.

Nemir **Ehmedê Xanî** xweş gotiye;

bohtî, mehmedî û silivî
Hin le'î û hinik jî zêr û zîvî

Wek xala dawîn, dixwazim balkêşîyeke dinê jî parvebikim.

Tê zanîn ku Riya Hevrîşim (Îpekyolu), li bakurê welêt; zivistanî di xeta Xabûr – Cizîr – Nisêbîn – Mêrdîn – Amed – Riha-Dîlok... li aliyekî jî di xeta; Nisêbîn - Qoser - Wêranşar-Riha - Dîlokê... de diherikî û şaxên dinê jî hebûn; mîna Cizîr – Hezex -

Midyat (Medyat) –Stewr – Ewîna - Bîstmal (Bismil) - Amed... Lewra zivistanî ev rê germ e, xweş e...

Baş e. Lê havînî ev rê pir germ e, meşa di vê rêyê de pir zehmet e, dijwar e; ji germê nexweşî îlim jî ta, taya ji ber pêşyan mirov qir dikirin. Hilbet di wan demên kevn û kevnare de. Rêyekê hênîk diviya bû. Ev jî dîsa li bakurê welêt ji Geverê (Yuksekovala) dest pê dike; jixwe geve tê wateya buhir, buhira bilind, zaboq, rêya di nav çiyayên asê de, rê; Geve – Wan – Tetwan – **Silwan** – Amed – Hîlwan – Kîlwan - Dîlok... Di vir de ez dizanim bala we jî kişandiye: **Silwan; Silîva** bi xwe ye û navenda rêya bazirganiyê ye ku, nîşana herî xurt jî **Pira Mala Badê** ye (ne Malabadî!) Nexwe ji dem û dewranên kevn ve Silîva bi şaristanî û bazarê re hevna e. Him rêya avê, him jî rêya reşayiyê derfetên girîng kiriye para vî jînwarê me. Ez dizanim li

Silîva û derdora wê gelek xan û qesrên gelek kevn jî hene ku hê tînin dîtin, jixwe ez qala **Şikeftên He-sûnê** jî nakim. Tê zanîn ku **serbajarê** dewleta kurdan a **Merwaniyan** e. Ev war, hêjayî lêkolînên arkeolojîk û herwiha yê dîrokî û civakî ye.

Ku mirov van xalan û rewşa civakî ya kurdî - kurmançî û ya welêt dide ber hev, mirov dikare angaş bike ku; **navê Farqînê bi kurdî Silîva ye; ne Farqîn e, Silîva...**

Ez wiha difikirim.

Ez bim hêjaye ku mirov lê kûr bibe...



Dînên Farqînê

Osman PLATÎN

Malabadê; pira şahidên dîrokê, 864 sal in li ser pêyan e û li hemberî dîrokê berxwedaneke bê-hempa nîşan dide. Ez û hevalekî xwe bi qurtandina çaya germ li berxwedana bêhempa temaşe dikin. Dengê avê tê. Ava ku har bûye bi xurexur di bin Malabadê re diherike. Em bi hev re gelekî axivîn, derengê şevê jî bû lê suhbeta me pir xweş berdwam dikir.

Wî digot wêneyên dînên Farqîne tev li bal min hene. Min jê re qala 'Qehweya Îloyê Qolçî' kir ku gelek wêneyên dînên Farqînê di qehwexaneyê wî de, bi dîwêr de daleqandîne hene. Wî got: Ez dizanim, qasî ku wêneyên dînên Farqînê li bal min hene li bal wî tune ne. Herî pir diviyabû me li ser dînan, lê me li ser mirovekî biaqil ku xwe li dînîti datîne xeber da. Ew mirov 'Pîç Cano' bû. Belê we şaş nexwend, li Farqînê jî wî re tê gotin 'Pîç Cano'.

Qeşmerekî mezin ê Farqînê ye. Beriya ku ez bêm li Farqînê bi cih bibim min 'Pîç Cano' (Di nav Farqîniyan de ev bernavk ne bi wateya ku bi rastî jî bavê wî ne diyar e, bi wateya kesekî mizawir, şiyar hwd. tê bikaranîn) li gundekî Farqînê di dawetekê de dîtibû. Hevalekî wî jî pê re hebû navê wî 'Çîla' bû. Her tim sergovend bûn û bê sekin şahiyê xweş-tir dikirin. Navên wan jî min re pir ecêp dihat. Difikirîm çima van navan li wan kirine û çima ew qas qedr û qiymet didine wan.

Min ji çend kesên derdora xwe pirsî ev çi ne? Kî ne û çi kes in? Yek ji wan kesên derdora min got: Kesê ku dawetek bike, ji bona xweşkirina dawetê gazî van mirovan dike. Herkes bi wan, bi govendgeriya wan û bi henekên wan kêfxweş dibin û demeke xweş derbas dikin.

Piştî wê roja daweta li Farqînê ku qederê salekê dem di ser de derbas bû, min li Farqînê cara ewil dest bi karê mamostetiyê kir. Wek wê dema ku ez nû hatibûm Farqînê hê jî kêfa min gelek ji Farqînê re tê. Lê gava salên notî têne bîra min rûyê min xwe jî bişirandinê vedigerîne xemgîniyeke kûr.

Di salên 1990'î de gelek bûyerên nexweş qewimîn li vî bajarê qedim. Şerê birakujiya kurdan wek dîroka Kurdîstanê ya bi xwîn pêçayî xwe li vir jî nîşanda bû. Hejmara windayîyan nayê zanîn û nayê ziman lê Farqîn di dilê me kurdan de di dergûşa xwe ya

zêrîn de hatibû qetil kirin. Ev bajarê ku bi hezar salan li piya maye û gelek bûyerên dîrokî di hundirê xwe de dihevine îro di her kuçe û kolanên wî de xwîna kuştîyan dixwuye.

Di nav kolanên Farqînê de her tim bi vê bîr û baweriyê digerim. Bûyerên nexweş di kolanên de û di rûyên mirovan de hê jî tîrîn xuyakirin. Mirovên ku çî bela bê serê wan bila bê, dîsa jî xwe li jiyanê digire û tîstê ku pê şa bibe dibîne. Farqîniyên me yên dil bi jan û axîn jî ji bo demek jibîrkirina derd û kulên xwe, bi dînên xwe re şa dibin.

Min li tu cihî nedît ku mirovên li wî cihî dijîn ew qas ji dînên xwe hez bikin û qedr û qîmeteke mezin bidine wan. Wek ku mirovekî mezin li hemberî wan an li ba wan be, bi wan re mijûl dibin. Dema ku hûn li dînê Farqînê binêrin, hûn ê bêjin na heyran vana ne dîn in. Kincên li ser wan tim paqij û bi rêkûpêk in. Bi germahî xwe nêzî mirovan dikin û mirovan bêhteng nakin. Hûn ji Farqîniyan bipirsîn ew ê bi sedan çîrokên di derheqê dînên Farqînê ku wan bixwe jiyane an bihîstine bi we re bi kêfxweşî par ve bikin. Gava li malan an li dawetan civîn çêdibin teqez hûn ê bibînin ku dînek li wir heye û an di serê govendê de, yan jî di serê civatê de cihê xwe girtiye.

Rojekê, berêvarê diviya bû ku ez biçim mêvandariyekê. Ez ji malê derketim û min berê xwe da rawestgeha siwareyên nav bajêr. Li benda siwareyê sekinîm. Pênc deqe derbas nebû, min dît siwareya ku ez ê pê biçim cihê mêvandariyê li ber rawestgehê sekinî. Beriya ku ez li siwareyê siwar bibim, sê-çar heb xanim li siwareyê siwar bûn. Di pey wan de jî ez siwar bûm û ber bi dawiya siwareyê ve meşiyam. Li pêşiya siwareyê li aliyê rastê yê ajokar de palgehek hebû û li ser wî palgehî Newzoyê Dîn rûniştî bû. Wek xwedî û ajokarê siwareyê be, wî pala xwe dabû palgeh û bi ajokar re diaxivî. Di wê navberê de sê mamosteyên ku ji axaftin û tevgera wan xuya bû ku ne ji Farqînê ne li siwareyê siwar bûn. Ez jî li quncikê siwareyê di palgeha dawîn de rûniştî me û şîva ku ez ê li mala hevalan bixwim difikirim. Mamosteya bejn û bala wê lihevhatî û bedew li palgeha pişt ajokar rûnişt. Hevala wê ya duyemîn a ku porê wê reş û berçavk li ber çavên wê ne, ew jî li kêleka bedewê rûnişt. Ya sêyemîn li piya ma û siware



bi rê ket. Ajokar û Newzo li hev heneka dikirin û kesên di siwarê de, ji bilî her sê mamosteyên xerîb, bi wan şa dibûn û bişîrîneke germ li ser lêvên wan digirt. Mamosteya ku li piya mabû ji jor ve li her du hevalên xwe yê runîştî dinihêrt, carinan serê xwe xwarî wan dikir û di nav hev de dibû pistepista wan. Min ji mehdê ya li piya fehm kir ku ji piya mayîna xwe ne razî ye û her li dora xwe dinihêre ku kesek cihê xwe bidê. Lê kesî cih nedayê û bi awirên tûj li Newzo û ajokar dinihêrî.

Mehdnexweşê hew bi xwe girt û ji ajokar bi tirkî pirsî: “Ma ne eyb û fedî ye xanimeke wek min li piya bimîne û qasî vî dînê pîs ê li kêleka te rûniştîye qiymet û rêza wê tune be, di ser de min perê xwe jî daye.” Ne tenê Newzoyê ku pêçîka wî ya eşhedê di devê wî de ye, dimije; herkesî bi baldarî li mehd-nexweşê û ajokar temaşe dikir. Herkes li benda bersiva ajokar bû. Newzoyê ku ji tiştên diqewimîn bê xeber e, li der û dora xwe temaşe dikir û bi şadî bi pêçîka xwe dimijîya.


Ajokar ji bo peyayekî ku li ser rê sekiniye hilbigire,

siwareyê hêdî hêdî sekinand û berê xwe vegerand mehd-nexweşa ku li piştî wî li piya sekiniye. Dema ku rûyê wî ji bal min ve xuya bû, min dît ku ji rûyê ajokar xuya dikir ku gelekî hêrs bûye bi vê gotina mehd-nexweşê. “Ev dînê ku li kêleka min rûniştîye ji te û ji sed bavê te çêtir e. Erê dîn e lê viya bizanibe ku ev cih cihê wî û ê wekî wî ne. Em wan li ser serê xwe datînin. Ew çavkaniya rûkeniya me ne.” Bi vê gotina ajokar re mehd-nexweşê dengê xwe birî, heta ew û hevalên xwe ji siwareyê peya bûn jî qet deng dernexist. Yê ku di siwareyê de bûn piştî peya bûna mehd-nexweşê dest bi nifira kirin. Dema ku ez li rawestgeha xwe peya bûm jî, dawî li nifirên xwe neanîbûn. Min spasiya ajokar kir û ji siwareyê peya bûm. Bi kêf bi aliyê mala hevalên xwe ve meşiyam. Birçîbûna min çûbû, bi tenê li daxwazekê difikirîm.

“Xwedê aqil ji tu kesî nestîne lê gava ku bistîne ji bila li Farqînê bistîne.”

Payîtexta efsaneyan Farqîna Zîliyan

Ayhan MERETOWAR



Ez carekê zarokan dibim gundê me. Li wê derê bi bavê xwe re, em li ser aliyên dîrokî yên Farqînê dipeyvin. Ev bû du sal in ku ez li vî bajarê ku heft caran xera bûye û heft caran ava bûye, dimînim. Mixabin ez rû û rûçikê wî nas nakim. Ji bavê xwe tewqe dikim û ew bê em bi hev re li ciyên wî yên mîrate bigerin. Gava ku ew dilê gerê nake, ez jê re Quranê vedikim û ji 'Tefsîra Şîrîn' ayeta 137'an a sûreyê 'Alî Imran' dixwînim: 'Bi tehqîq, [bêguman], berî we, gelek qanûnên Îlahî, hatine û çûne, [ji ber vê, gelî îmananiyan,] bigerin li ser erdê, baş bala xwe bidinê [û tefekur bikin]; bê ka dawîya aqûbeta wan ên [ku li hember ayetên Xwedê] derewkariyê dikin, çawa bûye.' Ew qas desthilatdarî hatin vî bajarî; dawîya dawî, îro gelê me tê de têkoşîna hebûnê dide. Şayanê behsê ye. Piştî vê ayetê, êdî bavê min jî qebûl dike.

Çawan em tîn malê, yekser mereqa dîtina ciyên dîrokî yên bajarê qedîm ê Farqînê dikim. Digel malîyên xwe, em beden beden, berê xwe didin keleha ku navê wê li nav gel, Zembilfiroş e. Xanî û malên derdora vê derê pirî ku kevn bûne, pelîşîne. Kes di wan de namîne. Li ser ciyên ku bedena/sûra bajêr dixuyê, ji xwe re em digerin. Gava çavê bavê min bi deriyên dîrokî yên sûran dikeve, di ber xwe de dipeyve: 'Dema ku mifteya van deriyan di destê mezinê bajêr de bûn, sîstemeke wisan ecêb hebû ku li vî bajarê rêkûpêkiyê, yek merivêkî xerîb, bê îzna wan, nikaribû biketa bajêr û tiştêkî neçê bikira.'

Em di rê de ne û rastî nasên bavê min tîn. Pîrsa hev dikin. Gotin tê ser qedîmtiya bajêr. Hevalê bavê min, berê xwe dide min û bi vî peyvê dest pê dike: 'Birazî, nebî tu bi çavê navçeyekê li bajarê me binihêrî. Bajare me, bajarekî dewletî ye. Ji berê û berê de, payîtextiya dewletan kiriye. Giregir, xuyanî, mezin, serek, malmezin û pêşkêşên dewlet, êl û eşîran, fermendarên artêşan, fatihê welatan, li vî bajarî mezin bûne. Ji çar aliyên Kurdistan, Erebiahan û Îranê, telebe hatine ber destê seydayên wan medreseyan navdar û li vî derê

bûne muntehî.'

Ez peyv li gotina vî dostê bavê xwe yê rîspî zêde dikim: 'Nexwe rast e ku di berhema Şemsetîn Samî de hatiye diyarkirin ku Farqîn ew qas mezin bûye, qendera Amed bi xwe jî, zemanekî li ser rayedariya navendî ya wê bûye.'

Em tîn dikevin hewşa Camiya Mala Mîran. Ne feqî hene; ne seyda. Derdora camiyê gişt gor in. Em ji xwe re li eywana camiyê rûdinên, ez palê xwe didim dîwarê wê yê sedsale. Destê xwe didim ber rûyê xwe. Ez, ji Seydayê Mela Hîkmet, gava dipirsim, ka çawa bû weqtekî, ew feqî û seydayên ku li Farqînê gihîştibûn hev? Ew jî wiha dibêje:

'Li Farqînê, ji zemanê berê ve, du medreseyan mezin hebûn. Yek jê, Medreseya Camiya Mala Mîran, yek jî, Medreseya Camiya Mala Seyda... Seydayê Camiya Mala Mîran, Seydayê Mela Huseyn bûye. Ew di wextê dewleta Osmanîyan de, muftî bûye. Wê hingê Atatürk, li Farqînê Fermandarê Kolordiyê bûye. Wî xeber şandiye ba Seydayê Mela Huseyn, gotiye ez dixwazim werim wê derê, medreseya wî. Ew jî karê xwe dikin. Ew jî tê. Piştî pîrsa hal û weziyeta hev dikin, ji Seyda wiha dipirse:

-Di Quranê de, serê sûreyan, bi herfên mîna Elîf, Lam, Mîm, Ya Sîn, Ha Mîmê dest pê dike. Sedemê vê çi ye?

Seyda ji hinekî disekine, pey re wiha bersiva wî dide:

-A niha, gava ji Stenbolê, ji te re, hin peyamên eskerî werin şandin, dê bi awayekî aşkerahî bin an bi awayekî şifreyî?

Ew jî dibêje:

-Bê guman dê bi awayekî şifreyî werin şandin.

Seydayê Mela Huseyn, tafîlê li gotina xwe dewam dike:

-Ha ev herfên serê van sûreyan jî, hin peyam in di navbera Xwedê û Resûlê Xwedê de.

Kêfa wî tê û jê re wiha dibêje:

-Bi rastî te cewabeke pir xweş da.
 Pey re xatir jê dixwaze û diçe.
 Îro li vê medreseyê tu kes tune ye. Pir zêde bi ber vî
 halê vê medreseyê dikevim. Derdikevim derve. Berê
 xwe didim aliyê Mala Mîran.

Mala Mîran

Gava em digihîjin nêzî Mala Mîran, hikayeyeke gelek navdar a di wextê wan de tê bîra min. Hawar Xwedê! Hema hema hemû bûne kavi. Ew çîroka Evdulfetah Begê Mala Mîrê Xerzan, Mala Cemîl Paşa û Mala Mîran tê bîra min. Apê Hecî Mihemedê Hecî Evdile, nêzî saetekê, behsa zewaca Mîrê Xerzan, Mihemedê Naro û jîriya Mîrên Farqînê dikir û nediqedand. Erê dunya kevn e. Ji kesî re nema ye. Ji serdestên me yên îro ku wan êdî jîyan li me herimandiye re jî dê nemîne dibêjim. Ji vî girê bilind ku kavi lîn Mala Mîran lê hatine avakirin, li deşta Farqînê temaşe dikim. Erdekî bê ser û bê ber.. Her alî pirêzeyên genim. Ciyên ku genimê wî hatiye çînîn, agir pê xistine. Dûman bi serê ketiye. Jana kezeba min a peritî, hinekî din jî zêde dibe.

Camiya Ecem/Mizgefta Selahedînê Eyûbî

Em berê xwe didin Camiya Ecem. Bi awayekî hejmetkarî em lê temaşe dikin. Bi zimanê fermî, navê Selahedînê Eyyûbî lê danîne. Li ser deriyê wê jî tarîx heye. Reng e ku temenê vê mizgefta entîke, jî temenê dewleta Osmaniyan û Komarê dirêjtir e. Baxçeyê hewşa wê gelek xweş e. Ji xwe re li hewşa wê, em li ser bankekê rûdinên. Li çarşiyê, em bîstekê, li mîlet û li kar û barê esnafan dinîhêrin. Dengê hemû farqîniyan qurm e û hema hema hemû bi zimanê kurmançî mijûl dibin. Ciwanên ku jî gundên aliyê çiyê, êzing û hejikan anîne, vir de wê de digerin.

Ji wirê jî, em diçin ber derê Camiya Belediyê. Ev camî, zemanê berê, Dêra Filehan bûye. Dema ku cîranên me yên qedîm, gelê ermenî jî hîna li vê derê bûne, ev dêr çiyê îbadetê wan bûye. Bi qasî ku li dibistanê pê hisiyam, hîna jî gelek malbatên ku bi eslê xwe ermenî ne, pir in li Farqînê. Heta li hin gundên wê jî hene. Ez û tevî hevalên xwe yên mamoste, jî dil û can ji wan hez dikin.

Qesra Sadiq Beg

Ji wê derê jî em diçin wê avahiya dîrokî ya ku mala kirîvên Ataturk bûne. Ev der jî têra xwe dîrokî û balkêş e. Ataturk, li vê derê, jî xwe re holikeke havînê çê kiriye. Ciyê wî hîna jî tê muhefezekirin.

Bi awayê ku ...

Pirtûkxaneya Diqtor Zekî Tanrikûlû

Êdî dereng e. Dixwazim em biçin ba Medreseya Camiya Mala Seyda. Em dikevin çarşiyê û tîn. Kitêba Mehdî Zana ya bi navê 'Çarşıya Silîva' dikeve bîra min. Pêncî sal berê, li vê çarşiyê çî qewimiye û çî neqewimiye... Diçim Pirtûkxaneya Diqtor Zekî Tanrikûlû. Di pirtûkxaneyê de, beşa pirtûkên edebiyata kurdî heye. Ez ji hevalên xwe re dibêjim: 'Hûn dibînin ne? Rebê Alemê mala wan ava bike ku wan ev pirtûkxane vekirîye.' Çavê xwe li pirtûka Mehdî Zana digerin. Digrim ku careke din bixwînim.

Va ye em hatine Medreseya Camiya Mala Seyda. Hewşa camiyê, ketiye bédengiya mirinê. Ne dengê feqîyan tê ku metn û dewran bixwînin; ne jî dengê seydayan. Kelegirî dibim. Ka ye Seydayê Mela Hamid?.. Seydayê Mela Huseynê Kuçuk? Seydayê Mela Teyfûr bi ku ve çûye? Seydayê Mela Yaqûb.. Seydayê Mela Hadî jî pîr û nexweş e...

Wan rojên ku rehmetiyê Seydayê Mela Ebdulahê Timoqî hatiye van deran û bi seydayên vê derê re yarî û henekan kirine, tîn bîra min. Gelo roj heye ev jiyana wan weke belgefilmekî bê kişandin...

Ez ji bavê xwe dipirsim:

'Bavo, gelo heta qiyametê jî tu îmkân heye ku mîna wan zatên mîna Seydayê Mela Ebdulahê Timoqî yê rehmetî û Seydayê Mela Mihemedê Êyanik ê gorbilûşt



–înselâh- li vî welatê me, careke dî alim, zana û xuyanî bigihîjin?’

Bersiva bavê min, hêvîşikên nîn e: ‘Lawo kîngê gava careke dî xêr û şerê me bikeve dev û destê me, di nav nîv qernî de Xwedê hez bike, dîsa jî dê zatên mîna wan jî nav me rabin.’

Eraseya Bajêr a Sirûştî

Em tîn derdikevin çarşiyê. Her der qawexane ne. Qawexane, bi ciwanên bêkar ên li aziyê mayî heta ber dev tije ne. Gelo dibêjim ji bavê xwe re, ‘Heke ev med-reseyên qedîm ên vî bajarî, wiha ji bêîmanî, bi destê serdestan nehatina valakirin, îmkân hebû ku ev qas xwîn, di nav mîletê vî bajarî de birijîya?’ Bersiva bavê min, demîldest tê: ‘Lawo, malneketo, de ka ew jîrî û zanetiya Mela Ebdulahê Tîmoqî, ger heta van salan, hema weke ronîya çirayeke pîrpisokî jî hebûya, di dun-yayê de, bi tu awayî qet îmkân hebû ku bira û pîsma-man li nîv orta çarşiya vî bajarê qedîm, ro li nîvro, ji paş ve, berê lûleyên tivingên xwe bida ser can û ruhên hev û din?’

Em tîn eraseya bajêr. Dibêjim belkî hinek zêrzwat û fêkî bikirim. Maliyên me diçin malê da ku hazîriya fi-ravîne bikin, em jî tîn nava eraseyê. Hema hema hemû hêşnahî û fêkî, ji Rojava tîn. Firingî, kartol, zebeş, her tişt. Qendera hêk û mirîşk jî, ne yên xelkê vê derê ne. Neheqîyeke wisan mezin li vî mîletî tê kirin ku hawar Xwedê!

Hêkên ku ji gundan dihatin, ji ber tîrsa nexweşîna mirîşkan, êdî kes ew qas mîna berê nakire. Hêk jî ji ro-ja-va tîn. Heta ku petêx û zebeşên welêt derdikevin, mîlet êdî zik û çavê xwe, bi zebeşên Edeneyê tîr dikin. Gava ku zebeşên van deran derdikevin, êdî kes pere bi wan nade. Heta ku firingî, îsot û balîcanên heremê derdikevin, êdî xelk bi yên ku ji Edeneyê tîn, tîr bûye û pereyê xwe gişt dane wan teamên ‘sera’yê ku bê tehm in. Tiştên xwecihî yên ku li vî eraseya vî bajarê mexdûr hene, penîr e, mast e, dims e, masî ye. Hinek penîr, mastê gamêşan û hêkên gundan dikirim. Dua dikim:

‘Rebê Alemê, heta ku dunya ava be, înselâh, nahêle ku mastê gamîşên mubarek, ji vî bajarî kêr mibe.’

Zarokên belengaz jî, di van erebokên destan de, hê-şinahiyên mîna tûzik, roka, binerdik û pîvazên hêşîn difroşin. Di nav eraseyê de, dengê bandên dengbêjan jî olan dide. Ez çav bi hinek pîrpar, tolik, gûriz û sêl-mastê dikevim. Çavê min diçirîsin. Çawa ku digihîjim ba van jinikan, hema bi hev re dor li me digrin, her yek dibêje ha ji te re ev hemû bi ev qasî û ez nîzanim çî bikim? Li ser boxçikên çend pîrekên Xerzî, pincara ze-manê zarokatiya min hene. Pêqelîçik, xerdel, gûriz û

karî... Bi rastî, ev serê bîst salî ye ku çavê min bi vî pin-carê neketiye. Axirkî tîra nufûsa gundekî pincara welêt dikirim û em ber bi malê ve tîn.

Diwestim. Gava maliya min ev qas pincar bi min re dibîne, made û mirûskê xwe dike. Li penîr dinêre, dibêje weleh wan tu xapandiyî. Penîrê te yê bêîman e. Hêk jî çend heb bi ser avê dikevin. Lê belê ji ber ku hînî pincarperweriya min bûye, mîna ku êdî gunehê wê bi min û hêşîriya min bê, li ser pincarê jî bi ser serê min de nake pilepil.

Pir difikirim. Hinekî bêhna xwe derdixim.

Şîn û şahî

Dengê sazê dawetan, îro li her derî belav dibe. Çiyê kêf û şahîya şênîyan, hema hema tenê dawet in. Dibê-jim: ‘Bavo, em qasekî herin ba dawetê, li govendgêran binîhêrin. Sazbend li ciyekî helege rûniştiye, mîkrofo-nek li ber devê wî, dengê hoparloyan jî heta dawî vekî-rine, kerik û guh ji meriv dibin. Jin, keç, xort, zarok û navsere bi hev re ketine govendê û xwe dihejinin. Ez dibêjim qey hema rîka xwe, girê xwe, hema bi vî go-vendê dişkênin. Stranbêj, her kilamine wisan dibêje ku hema mirov dibêje heyran ez vî gavê li vî derê çî dikim, hema ez a niha, divê derkevim çiya, bigihîjim şervanên azadiyê. Hin kilam jî li ser kuştina egîtan in, mîna ne zêmaran; lê belê di dawetê de tîn gotin. Çî bi-bêjim, şîn û şahî jî li hev ketine. Bi gotineke din, şînan, cî nehiştiye ji şahîyan re li vî welatî. Jixwe kêr mal heye ku yan kuştî yan girtî yan jî derketiyê wan tune be.

Şaredar, li erebeya xwe siwar e, wa ye tî dawetê. Bi carekê rengê rûçikê berbûriyan geş dibe. Şaredar jî, bi rayên wan hatiye hîlbijartin. Teqla govendê gur û geş dibe.

Bala min jî diçe ser aliyê çiyê. Ji dûr ve, ‘qûç’ek, li serê navsera çiyê dixuyê. Ez xwe nêzî hevalê xwe dikim û dipirsim ka gelo ev çî ye. Ew jî dibêje: ‘Li wê derê ka-vilekî dîrokî heye. Gelê me ji wê derê re dibêje ‘Lehf’. Ez xatir jê dixwazim û em berê xwe didin wê derê. Gava em di ber Keleha Bajêr de derbas dibin, yekser dîroka wê mereq dikim.

Keleha Farqînê

Serê vî sibeha şerîf, karê min ê pêşîn ew bû ku ez li ser dîroka Keleha Fariqînê, hînî çend agahiyên dîrokî bibim. Serê pêşîn, min li Seyahetnameya E. Çelebî ni-hêrtibû:

“Keleha Meyafariqîn: Ev keleha, di navbera Şet û çemê Batmanê de ye. Ji ber ku navbera du çeman ve-dike, jê re, [Keleha mayê ferqeyn] hatiye gotin. Bi xe-letî jê re Meyafariqîn tî gotin. Xelkê Ecem, jê re Qale-î



Meyan Ferq dibêjin. Wateya vê jî, ev e: Keleha ku pişt a wê zirav e. Ji zemanê berê ve, bajarekî mezin û keleheke kevn bûye.

Kesê ku cara pêşîn ev keleha çê kiriye, hukumdarekî bi navê Xendiq e. Ev hukumdar, ji umeta Çercîs Nebî ye û gora wî, di nav Keleha Mûsilê de ye. Çercîs ew hîn kiriye û wî jî ev keleha lê kiriye. Pey re gelê vî bajarî, îman bi Çercîs Nebî neaniye. Bi ser de jî, wan Çercîs Nebî, li ser çiyayê Keleha Meyafariqîn, çil carî şewitan-diye û xweliya wî berba kiriye. Cenabê Heq, her carê ji bayê ferman kiriye, xweliya Çercîs Nebî, careke din daye hev û careke din heyat daye Çercîs Nebî. Ev bûyer, di gelek kitêbên tefsîr û pêbawer de qeydkirî ye. Hê jî, li hêşiya ser çiyayê bilind ê pişt kelehê, li ciyên ku xweliya Çercîs Nebî lê rîjiyaye, ji xeynî çêre û giya, tu tişt hêşîn nabe.

Pey re Çercîs Nebî, li şênîyên vê kelehê, nifir kiriye. Ji peravê Gola Wanê û ji hêla Çiyayê Sencarê ve, ziyayek hatiye, temamê mîletê bajêr xwariye. Lewre keleha vala maye.

Çendekî bi şûn de, Buhtunesr, hatiye ev keleha xera kiriye.

Piştî, ev der, ketiye destê Ebasiyan. Piştî wan jî, Hulagu hatiye, gelê kelehê kuştiye û keleha jî binî de hilweşandiye.

Seyfud-Dewle Ibn Semdanî, ji nû ve ev keleha ava kiriye û tirs û xofê mezin xistiye welayetên Kurdistanê. (Gelek balkêş e ku di vê berhama Ewliya Çelebî, Seyahetnameyê de, zêde zêde navê “Kurdistan” hatiye

nivîsandin. Sala 2009an, bû nesîb û ez çûm bajarê Qeyseriyê. Li wê derê, ez çend malapanên xwe çûn ciyekî dîrokî yê kitêban. Min çavê xwe, hema tenê li yek cîldekî Seyahetnameyê nihêrt. Derbarê dîroka Kurdistanê de, agahiyên têra xwe xweş hebûn. Komisyoneke ji profên unîversîteya Erciyesê, li ser orijînalîya Seyahetnameyê xebateke gelek hêja çê kiribûn. Hêjayî behsê ye...) Bi vî awayî jî nav û deng daye. Bi awayekî wisan îmar kiriye ku di kelehê de, hema hema heftê hezar eskerên wî yên cebbar ên siwariyên hespî yên sor hebûne. Bi hesabê eskerên wî yên din jî, tenê Xwedê dizanibûye. Di yek rojekê de, li midbexa wî, bi qasî barê çil qantirî, xwê hatibûye xerckirin. De êdî hesab bikin bê ka hejmara zafî û pîrbûna eskerên wî çî qas bûye. Temelên keleha Seyfud-Dewle, hîna jî dixuyên. Peyre Tîmûr, ev der pelaştiye. Kavilên kelehê, hê jî hene.

Sala 920î, Sultan Selîmê Ewîl, dema ku ji Sefera Çildêrê vegeriyaye, wî Biyikli Mehmed Paşa, ji bo fetha Diyarbekirê, bi fermandarî (weke fermandar) wezîfedar kiriye. Gava ku ev Paşa Diyarbekirê fethî dike, wî ev Keleha jî, bi awayê aştiyane teslîm wergirtiye. Li ser qeyda Suleyman Xan, di axa Qere Amid de, ev der navenda Sancak Begî ye. Ji Begê vê derê re, salê deh kîs hatin tê. Qezayeke wisan e ku qasî hejmara sed û pêncî akçeyî ye. Ji Qaziyê/Hakîmê wê re jî, salê sê kîs tê. Alay Beg, Çeîbaşî û Muhtesîbê wê heye. Wekî dî, muftiyê wê, ciyê Kedxudayê sîpahî, Serdarê wê yê Yenîçerî û dîzdarê keleha wê heye. nefer û cebhanetiya

wê tune. Ji ber ku parêzgeheke hundirîn e, pêdiviya wê bi tiştên wisa tune. Lê belê dîsa jî, ji aliyê Mîrlî-wayê wê ve, di Kelehê de çend top amadekirî hene. Rojên îdan û meha Remezanê, ev top tînan berdan û bi xêra wan, Mulsulman pê tînan agahdarkirin.”

Kavilê Gundê Kelê

Minîbusa me, li ber Pira Kelê sekinî. Çendakî berê, dostekî bavê min ê dema ciwantiyê, behsa keheha vî gundî kiribû. Ez tewqeya dîtina vî derê dikim. Em jî li ber qawexaneya gundê Kelê peya bûn û me rast berê xwe da aliyê kehehê. Keheh, tam di nîve gund de ye diyar e ku gelek kevn e. Kavilêkî balkêş bala min dikêşîne û em diçin wê derê. Ew der jî, xerabeyên Mala Zilî ne. Efsaneyekê gelek ecêb a Şêx Zilan û fermanbarekî Osmanîyan tînin gotin. Têra xwe xweş û balkêş e.

Pira Mala Badê

Van rojan, ji bo ku ez xwe bargiraniya vî jiyana tije-keder hinekî bi dûr bixim, dilê min heye ku ez biçim temaşekirina Pira Mala Badê. Gundê min, li wî aliyê vî pira zemanê dikeve. Jixwe bavê min diçe malê, ez jî pê re tîm. “Bavo,” dibêjim, “Gelo kurmancan, di nav xwe de, li ser vî pira mezin, tiştêkî tarîxî negotiye?” Bersiva wî tîra xwe xweş e: “Ji weqtê ku ez famberî xwe bûme, min dîtiye nedîtiye, mezinên me, li ser vî pira mezin ev “sêrêz” a navdar gotiye:

Pira Bazmanê / Çê kirine bi kul û demanê / Xera nabe heta axrê zemanê

Li gor çavkaniyên nivîskî yê dîrokî, diyar bûye ku milûkekî zaf mezin ê berî hezar salî ku navê wî “Bad” e, hebûye. Badê kurê Dostek. Gelo nabe ku vî pira ha, navê xwe jî navê wî girtibe? Mesela li hêla çiyayê pişt Farqînê, îca eşîra bi navê “Badika” heye.

Dîsa di alfabeya erebî de, herfa “dad”ê, di bilêvkirinê de, nêzî herfa “zê” ye. Îca di nav gel de, jî vî derê re yekcaran tînin gotin “Pira Bazmanê”

Gava ez vî gotinê dibêjim, bavê min jî, vî efsaneyê jî min re dibêje:

“Wekî dî, ew pira piçûk a ku li hêla gundê me heye û li ser çemê Sasonê hatiye avakirin û em jê re dibêjin “Pîrekurtê”, li gor ku bav û kalên me dibêjin, şagirtêkî wî hosteyê ku Pira Mala Badê çê kiriye, dema ku tevî ‘emeleyên xwe hatine van deran, wî bala xwe dayêye ku karkerên wî, nikarin bi rehetî derbasî wî aliyê çem bibin. Wî rabûye hema wisan zûzûkan, ev pir çê kiriye. Dirûvê wê jî dide Pira Mala Badê. Îca gava ku difetilin tînan cem hosteyê mezin, ew jî ji wan dipirse; ka çima ew qas hewiqîne. Ev şagirtê ku li ber destê hosteyê Pira M. Badê dixebite, dibêje ku “Me, pireke piçûk, weke derbasokekê, ji bo emeleyan lê kiriye, lewre em bi derengî ketine.” Çendakî bi şûn de, ev hosteyê mezin, mereq

dike bê ka gelo wan pireke çawa ava kiriye. Diçe bala xwe didê ku haylo, pireke gelek ecêb e. Hema li wê derê jî vî şagirtê xwe didixise û hildîçîne dilê xwe ku ew dê jê derbas bibe. Êdî ka çawa dike, li gor rîwayetan, serê wî wenda kiriye.”

Piştî vî efsaneya xweş a gelêrî, îca carekê dî, min berê xwe da Seyahetnameyê. Ez jî bavê xwe re, van agahiyan Ewliya Çelebî bi bîr dixim:

“Em ber bi bakurê rojava yê Keheha Mayyafariqînê ve çûn, gihîştin Pira Batmanê. Em li vî derê sekinîn. Dema ku av di bin vî pîrê de diherike, bi awyêkî wisa şedîd li tehtên binê wê dide ku ji guregura wê, meriv kerr û gêj dibe. Ev pîr, li ser wê rêya ku ji Diyarbekir û Meyyafariqînê tê, derbasî Hîza, Bedlîs û Wan û gelek diyarên di yê Kurdistanê dibe hatiye çêkirin. Lewre zatekî ji Ebbasiyan, ji pereyê xwe yê helal, sê sed hezar kîs daye û bi destê gelek mîmar û hosteyan, ev pira mezin daye çêkirin. Ji aliyê avahiya xwe ve, ji aliyê temel û ber û dirêjahiya xwe ve û ji aliyê zexmî/saxlemiya xwe ve, raserî temamê wan pîran e ku Enebolê hatin çêkirin. Aliyekî çem teht; aliyekî wî qûm/silik e. hosteyê ku ev pîr çê kiriye, wiha gotiye: “Li ser vî çemî çêkirina çaviyeke pîrê, weke derman e.” û peyre jî vî hosteyî, bi vî pîrê, li du aliyên çem, rihtimên fireh û isqereyên gelek pêt û saxlem ku zaf li ber xwe didin, çê kiriye û ji aliyekî ve jî, kemereke di dirûvê taka Kîsra de, daye avakirin ku ji mesafeyekê gelek dûr ve jî, bi rehetî xweş dixuye. Ji erçenekê heta erçena di ya pîrê, tam sed û heftê gav heye. Her çî qas li hêla Hersekê, Pira Mostarê jî yekçavî ye; lê belê dîsa bi xweşikî, zerîfî û pîr û pergala xwe, ev pira (ha ya Batmanê), ji hemû pîran xweştir e.”

Gotina dawî: Pergala komara nû, ji ber van aliyên gelek gelek ecêb ên vî bajarî, niyet kiriye ku di nav belengazî û jariyê de bihêle û wê, tevî wan beden, sûr, bîr, kanî, xan, koşk, mizgeft, dêr, çand, dîrok, ziyaret, deriyên kehehan, himam, karwansaray, şikeft û edebiyata wê, bixe bin xwelîholka xumarî ya kaviyîyê.

Aqilê min nabire bê ka kîjan bajarê welat, wisa bi vî awayî, hîna jî navê kanî, pîr, xan, bîr û keheh û qonaxên wan, bi kurdî bin...

Farqîn

Şêrgo FÎDAN

Farqîn, gelek caran biaxîn û nalîn
Hewayek xweş û biharîn
Hem gund e, hem jî bajar
Dijîn mirov tê de derdora pêncî hezar

Lê tê jiyîn çar demsal.
Xweşbûna wê nayê gotin, bêemsal.
Wek bûkek bi bejn û bal
Xwezî derbasnekiribûya ew qas halan talan...

Hezar sal in, nehatiye ji bîr kirin ziman
Hê jî tê axaftin zimanê dayikan
Jiyan bi kurdi û kurmancî ye
Çi xweş e zirara kî/kê pê hatiye

Boşatî, badikî, xerzî û xî
Bi hev re dijîn bi cîranî
Carinan ku li hev dixin bi mêranî
Lê destên wan ji hev nabe bi tu awayî

Sal çûn dem bihurî

Kîbar OZBEY

Zarokatî demek wenda ye ji bo me. Serê salê bi berfê dest pê dikir. Farqînê kirasek spî li xwe dikir. Me digot Xwedê ji jor de pembo davêje ser zarokan. Em ji ber şivakan venediqetiyên. Zarok û carinan jî mezinan xwe wek kalik û pîrikê dixemilandin û li nav malan digeriyan. Dihatin ber deriyan, govend digirtin yan jî skeç çêdikirin. Em ji kêfa difiriyan. Kê çi tiştên xwarinê bidaya wan, dikirin tûrikê xwe. Dema ku derî li me vekirina, me baz dida derve û me ji berfê merivek çêdikir. Zivistanên dirêj bi çirokên mezinên me dirêjtir dibûn û diçûn. Di biharê de baran dibariya û me digot Xwedê mala xwe dişo. Demên ku ewr kom dibûn û baran nedibariya me bi potan bûkek çêdikir, xêlyek diavêt serê wê û em mal bi mal digeriyan. Me digot; Bûka Baranê hatiye ber derî, bidin jê re perî, bila baran bibare, gîha bavên ser serî.. Farqînê kirasek kesk û sor û zer li xwe dikir. Gul vedibûn reng bi reng. Pinpinîk difiriyan vir de wir de. Di 14'ê meha gulanê de ji bo hatina biharê hemû gelê Farqînê diçû seyranê. Navê wê Serê Gulanê bû. Li çar aliyên bajar dawet çêdibûn. Gelek stranbêjên Farqînê, di van dawetan de derdiketin. Jiyan şên dibû. Daweta herî mezin Newroz bû. Mala me li ber

Kela Zembîlfroşê bû. Di her Newrozê de tekeran derdixistin kelê u agir pêdixistin. Li hember malê jî çiya hebûn. Li serê çiya jî agir dihat pêxistin. Şev ronî dibû wek rojê. Gel tax bi tax kom dibû û bi govend û stranan Farqîn radibû ser piyan. Havînê, Farqîn germ dibû. Me digot Xwedê agir pêdixê ji bo ku şivê çêke. Farqînê kirasek zêrînî li xwe dikir. Daran xwe bi fêkiyên curbicur dixemilandin ji bo zarokan. Em derdiketin serê daran û me heta êvarê fêkiyan dixwar. Em li derve radizan û me bişev li asûman dinihêrt. Stêrk û heyv ji me re dikeniyên wek hevalên lîstokê. Me ji şevê re digot Xwedê perdeya xwe ya reş daye ber şivakê. Ji rojê re jî me digot perda spî dide ber şivakê. Pîştî havînê cîhê xwe ji payîzê re dihişt. Ba dihat û me digot Xwedê pif dike agir, ku vemirîne. Payîzê Farqînê kirasek zer û gewr li xwe dikir. Zarokatîya me wek pinpinîkek firiya û çû. Dema em zarok bûn, Farqîn jî zarok bû. Em bi hev re mezin bûn. Kêfên me, êşên me hemû yek bûn. Em çiqas mezin bûn ew jî ewqas mezin bû û qirêjî bû. Farqîn bû gola xwînê. Wek hemû tiştan Farqînê jî qirêjî kir. Lê di her xewnên min de hê jî Farqîn heye û Farqîn di dilê min de zarokek biçûk ê ku qet mezin nabe...

Îsa Şans û rojnameya “Sîlvana Sesî”

Rojen BARNAS

Berî bi çendekî berhevoka rojnameya ‘Dicle-Firat’ê derket. Ustad Malmîsanîj heft hejmarên wê berhev kiriye û li hev sêwirandiye, weşanxaneya ‘Apec’ê jî ew çap kiriye. Xizmetek pir mezin... Ji aliyê min ve gelek spas ji her du alîyan re jî.

Mîna bi xwe hejmarek du hejmarên wê li dezgehên rojnamefroşan dîtibû. Yên di jiyê (emr) min de hingê xwendekarên lîseyê bûn û perê me yê ku em bidin û pê rojname bikirin tune bû. Mîna û yê min me dîzanî ku ‘Dicle-Firat’ çî ye û jî aliyê kê ve hatiye derxistin; lê hew, ewçend û ne zêdetir. Lê niha bi saya cefakêşîya Malmîsanîj eynika xebat û entelektueliya kurdan a 1962-63’yan li ber çavê me ye.

Ji bona min tiştekî girîng î dîtir jî di vê berhevokê de hebû: Du şîr û nivîsarên Îsa Şans (Îsa Ruhi Sîlvani) mîna makîna zemanguhêziyê ez birim Farqîna bihara 1960’î.

Bihara 1960’î bû, berî derbeya 27’ê gulanê bû an di pey de bû baş nayê bîra min, lê rojek bala min pêket ku komek zîlam li texteyekî daleqandî yê li dîwarê Fetwaxanê (muftuluk) dinihêrin, bi dengê bilind û bi vekîtandin (kîte bi kîte) tiştekî dixwînin û li serê bi hev re mijûl dibin. Ji meraqan ez jî nêzik bûm: Li ser texteyek mîna van ên îlanan an ên afîşên sînemayê rojnameke durûpel berepêş û berepaşki pêvekirî ye û li ser rojnameyê jî dinivîse ‘Sîlvana Sesî’ (Dengê Sîlvana).

Xwediyê wê Îsa

Şans û ciyê çapê jî li ‘Sîlvana Sesi Matbaasi’ ya li Taxa Kelê bû. Bi pejinên romantîk ên xortekî panzde-şanzdeh salî şahiyek di nava

min de keliya; êdî Farqîna me jî bûbû xwedî rojname û çapxane. Hingê li serê koşeyê hewşa Camiya Ecemê li aliyê çarşiyê ber bi hêla belediyê ve xaniyekî yek qatî hebû ku ew der daîreya

muftî bû û di nav xelkê de bi navê Fetwaxane dihat binavkirin. Ji ku derê îlham girtibû nîzanim, lê Îsa Şans texteyekî çargoşeyê li berayî dirêj li dîwarê Fetwaxanê, li aliyê ser cadeya mezin (Gazî) xistibû û di derketina her hejmara nû de rojnameya xwe dianî yek rûpela pêşî û yek jî rûpela paşî pê ve da-

tanî. Bi vê, mebesta wî ragihandin û nasandina rojnameyê bû. Bi vî awayî Îsa Şans, ne bi tenê ojname, lê ‘Rojnama Dîwêr’ mîna ya Rojhilata Dûr anîbû Sîlvana. Ev ne rojnameya pêşîn bû ku li ser navê bajarê me derdiket.

Ya pêşîn ‘Miya Farkin’ (yanî Miya Farqîn) bû ku li Diyarbekirê jî aliyê ‘Abdusettar Hayatî Avşar’ ve dihat derxistin û li Farqînê jî jî aliyê Mihemed Eliyê birayê vî Îsa Şansî ve dihat frotin an belavkirin. Berî ku ‘Sîlvana Sesî’ derkeve, Îsa Şans di ‘Miya Farkin’ê de dinivîsî. Bi vê ‘Sîlvana Sesî’ yê re çapxane jî hatibû Sîlvana û ev cara pêşîn bû ku li Farqînê çapxane vedibû. Çapxaneya ku jî aliyê Gutenberg ve hatibû peydakirin pêncsed sal bi şûn de nîhayet dihat Farqînê. Vê tîjîka şaristanîyê (medenîyetê), maka belavbûna zanîn û agahdariyê ya ku li Almanayê di sêsed salan de hatibû gihîştibû tirkên, jî Stembola paytexta dewleta Alî Osman heta Farqînê bi meşa kûsî di dused salan de hatibû gihîştibû me.

Ez wê havînê bi qasî meh û nîv an du mehan li balê di çapxaneya wî de wek şagirt xebitîm.

Çapxana Îsa Şans jî du, sê qase hurûfat (tîpên ji ri-sasê) û makîneke çapê ya bi destmeşe pêk dihat ku di zaravayê çapemeniyê de bi tirkî jî wê re digotin ‘prova tezgahî’ yanî dezgehê sihêtiyê. Ev gişt jî yê Îsa Şans bi xwe nîn bûn, wî ew bi emanetî anîbûn. Îsa Şans hem tîprêz bû, hem çapker... hem nûçegihan bû, hem nivîskar, hem gerîndehê berpirsiyar û sernivîskar bû û hem jî xwediyê rojnameyê. Çapxane û mala wî di xaniyekî yek qatî de bûn: Bêhna hibîr û xwarinê, ya kaxiz û nivînan gişt di nav hev de.

Serê Îsa Şans mîna kewara mêşan embara li hev qelibîbû û xumîna fikiran bû, mîna serê çavîka kaniyek bi bilqîn li ser

bilqînê misêwa dikeliya û fikir jî hev û du dîzan. Farqînperest bû: Behsa tarîxa Farqînê dikir, Farqîna di zemanê Împaratoriya Asûriyan, Farqîna di zemanê vegirtina Selahedînê Eyûbî... Behsa ‘Esla Xoros’ (an Esra Xorûs) û Kela Nîştônê dikir. Esla Xoros ku telafûza wî rast be û di bîra min de rast mabe, -lewra min ev bi devkî jê bihîstiye; hakim an dîzdarê Farqînê yê di dema vegirtina wê ya jî aliyê Selahedînê Eyûbî de bûye.



Dîsa li gora gotina wî di dewsa Camiya Ecem an di navbera Camiya Ecem û Camiya Mala Mîran de dê-reke pir mezin hebûye ku zemanê Sultan Selahedîn Farqînê vegirtiye, xelkê bajêr gişt xwe avêtine bextê wê dêrê û tê de sitirîne û herwisa jî filitîne. Dîsa li gora rîwayeta wî Circîs Pêxember ji ber kafiran re-viyaye, kafiran Circîs Pêxember qefaltine û li ber şikefta Kerîm ew şewitantine. Loma giyayê wê derê tu car hişk nabe. Behsa Kela Nîştônê ya di dema Asûriyan de dikir ku li gora wî Nîştôn Kela Boşatê bûye. Wek rêzenivîsar di 'Sîlvana Sesi' de li ser cengên împaratorên Asûriyan Nebûkednezar, Asûrbanişîp û Tîgletpleser ên li dorhêla Farqînê dinivîsî.

Aşiqekî bêderman ê 'Sultan Yûsif Selahedînê Eyûbî' bû. Ev binavkirina di nav yeknikan de ya wî ye, ne ya min e. Wênayekî Selahedînê Eyûbî bi destê xwe û bi pêûsên cihêreng çêkiribû, li seriya dezgehê tîprêziyê, li hember wî daleqandî bû.

Heyranê Mele Mistefa Barzanî û Doktor Beg (Dr. Yusuf Azizoglu) bû. Pevgirêdanek mîstîk û xwedayî di navbera navê Yûsif Selahedîn (ê Eyûbî) û yê Yûsif û Selahedîn (ên Mala Azîz, Doktor Beg û Selah axayê biramakê wî) de didît. Herwisa têkiliyek neyaxurî (netesadufî) di navbera navên Mele Mistefa Barzanî û Mele Mistefayê Berazî de jî didît. Barzanî zivirîbû Iraqê lê hê dest bi şer nekiribû. Ez Mele Mistefayê Berazî nas nakim lê wer xuya ye ku merivekî qenc bûye. Sultan Yûsif Selahedînê Eyûbî kurdekî sultanê îslamê, fatihê Kurdistanê, bi hindikî fatihê Farqînê bû ku wî ew kiribû bin hukmê kurdan û yê dinê jî Doktor Beg 'Yusuf Azizoglu' ku hingê pêşkêşê parlamenterên ji Kurdistanê yê demokrasîperwer, herêmparêz û hêviya kurdperweran bû.

Şî'ra Qimil a Mûsa Anter ku dibêje 'Bi çiya ketim lo apo, çiya melûl bûn rebeno' bi awayê taybetî yê xwendina wî cazîbeke bêsalixdan werdigirt. Ji xwe min cara pêşî vê şî'rê jê bihîstibû.

Bêguman 'Sîlvana Sesi' bi tirkî derdiket û rojnameyeke îdeolojîk an a propagandaya kurdîtiyê nîn bû. Ya nûçeyên herêmi bû. Di serê pêşîn de Îsa Şans an 'Îsa Ruhi Sîlvanlı' rasterast propaganda kurdîtiyê nedikir, lêbelê çî bigire di her hejmarê de bi riya bikaranîna hin bêjeyên kurmançî guhê meriv li kurdî vedikir: Em bêjin dêvla 'vîraj' an 'dönemeç'a tirkî de bêjeya bi kurmançî 'fetlanek', di dewsa 'dere' ya tirkî (ku ne tirkî ye, farisî ye) 'newal'a kurmançî di nûçeya xwe ya bi tirkî de bi kar dianî û ev jî di nav xwendevanan de dibû sedemê nîvşadî û nîvşaşmayînê: 'Wî-wîî! Bi kurmançiya me jî tê nivîsandin!' Ne ku bera Îsa Şans bi tirkîya 'fetlanek'ê an 'newal'ê nizanibû. Ji şî'r û nivîsarên wî yê di hejmarên 4, 7, û 8 ên 'Dicle-Firat'ê jî baş

xuya ye ku ew bi qasî nivîskarekî rojnameyên mezin ên Stembolê hakimê zimanê nivîskî yê tirkî ye û di aliyê bêjezanîna tirkî de jî qet tengasî nakişîne û li xwe heyirî namîne. Wekî dinê jî dizane ku çî dinivîsîne û behsa çî dike. Nivîsên wî bi serûber; kurt, zelal û dagirtî ne. Di warê axaftin û bilêvkirinê de jî mîna bi usûla begfendiyeke Stembolî bi tecwîdkî bi tirkî diaxivî. Lêbelê di nav nivîsarên xwe yê 'Sîlvana Sesi' de bêjeyên bi kurmançî bikaranîna wî bi zanîn bû û jî taktîka wî ya 'nerm dayina berê' yan jî mîna peykên ûris 'veniştina nerm' a li ser erdê bû, yanê hêdî hêdî û nermenerm bêjeyên kurmançî nivîsandin û jî berevkî ve hînkirina xelkê bû. Di payiza 1960'î de mala me çû Diyarbakirê. Têkiliya min a bi Farqînê, bi Îsa Şans û bi 'Sîlvana Sesi' re nema. Şeş sal di pey de gava ez zivirîm Sîlvana êdî 'Sîlvana Sesi' nemabû. Li gora nivîsara wî ya di hejmara 8'an a 'Dicle-Firat'ê de – ku mixabin ez hê nû dibînim – di 23.10.1962'an de ji ber ku çapxane ji dest diçe 'Sîlvana Sesi' jî êdî nema derdikeve. Çi bi serî ve tê?

Li gora nivîsara wî ya di hejmara 8'an a 'Dicle – Firat'ê de, Îsa Şans di 'Sîlvana Sesi' de bi şîweya Sîlvkî (yanî bi tirkîya kurmançî linavxistî) bi navê 'Di Edebiyata Kurdî de Siyahmedê Sîlvî' di 21'ê çiriya (ekim) 1962'yan de dest bi rêzenivîsekê dike û di 23'yan de jî nivîsara xwe ya bi navê 'Di îdeolojiya Xwedayê tirkî biparêze ya nijadperestan de em kurd jî hene an na?' diweşîne. Ev her du nivîsar dibin mîna çengek xwê û dikeve nav agir. 'Mustakil Diyarbakir Sesi Gazetesi' lê aşkere gilî dike. Li gora ji wê rojnameyê neqilkirina Îsa Şans a di vê nivîsarê de, wî di 'Sîlvana Sesi' de nivîsandiye ku 'eger rojhilatî (kurd) îmkana xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe yê bavûkalan bi dest bixin, hingê ew ê cehalet ji holê rabe' û bi vê riya xwendin û nivîsandin û weşandina bi kurdî pêşniyar dike. 'Müstakil Diyarbakir Sesi' bi vê bi tenê lê gilî nake, lê hêviya kuştina wî jî dike. Di sala 1962'yan de li cihekî biçûk mîna Farqînê di rojnameyeke mutewazî de pêşniyar an doza mafê xwendin û nivîsandina kurdî kirin karê her kurebavî nîn bû.

Ew dewleta ku ehlê wê ji çep heta rast, ji nexwenda heta entelektuelan li ber gotina '*kahraman irkima bir gul*' bi cezbeke uxrewî ji xwe ve diçe û tê xelêyanê, ew ê çawa tehemula pêşniyar, daxwazî an dîtinên Îsa Şans ên bi vî awayî bike?

Li ser vê bûyerê dewlet bi muxbîrê xwe yê Karslioglu, bi 'sawci'yê xwe, bi Elî Beg û bi Polês Kamberê xwe ve aşkiya şidandinê lê badidin. Suat İlhan xwediyê 'Şehir Gazetesi' şefê buroya 'Tercuman'ê tê malzemeyên xwe yê bi emanetî paş ve dibe. Mîna masiyê li kersaxê mayî Îsa Şans li aziyê

dimîne û 'Sîlvana Sesî' ji berê xwe ve tê girtin. Di pey de Îsa Şans wek memûr ketibû 'Verem Savaş Dispanseri', lê di pey demekê de îdareyê ew ji kar derxistibû, doza wî di mehkemê de bû. Li kêleka di-kana Seyîd Tahir û li hember 'yazîxaneyê' Mehmûd Axayê Kelî li ber sindoqa boyaxê bû; bi sol boyaxkirinê aboriya xwe dikirkitand. Paşiyê bi biryara mehkemeyê vegeriya ser karê xwe yê memûriyê. Ji nivîsandin û rojnamegeriyê re Îsa Şans jêhatî û şareza bû. Çima neçû karê rojnamevanîyê nekir û bi memûriyeta 'Verem Savaş Dispanseri' qîma xwe dianî? Gelo destê wî ji Farqînê nedibû? Ji şî'r û nivîsarên wî yên di 'Dicle – Firat'ê aşkera xuya ye ku kurdperwerekî bi hiş e. Ji ragihandinekê ya hejmara 8'an tê zanîn ku ew yek ji wan heşt kesên di koma berhevkirina folklorê kurdî de ye. Lê çima tu car xwe nêzîkî komika welatparêzan 'kurdçiyên' Farqînê nedikir? Di navbera wan de

gelo tişteke qewimî bû? Mixabin ez pê nizamim. Heke min berê ev nivîsarên wî yên di 'Dicle – Firat'ê de xwendibîya, min ê mîsoger van çimayan hem ji wî û hem jî ji aliyê dinê bi înad bipirsiya. Lê heywax êdî nikarim van pirsan jê bikim, lewra li gora bihîstina min di sala 1990 an 91'ê de ji nexweşînekê miriye. Heywax û heywax! Peydakirê çapxaneyê Gutenberg jî top avêtibû û ji piyasa çapemeniyê winda bûbû. 'Dicle – Firat' ku ji aliyê dewletê ve nehata girtin jî ji bêperetiyê li ser girtinê bû. Qedera Îsa Şans jî mîna ya Gutenberg çêbû, ew jî ji piyasa rojnamegerî, rojnamevanî û nivîskariyê bi carekê û ji binî vekîşiya. Belkî îro gelek Farqînî Îsa Şans bi vî aliyê wî qet nas nekin jî. Çi heyf!

Xwarineke bi xawên

Zerzeng

Kereş/melzemeyên pêwîst

- 1-Kîloyek pincara şeref û namûsê
- 2-Qasî deh tilî dîlxwazên azadiyê
- 3-Baxek tovê aşî û biratiyê
- 4-Hinek bayê hişyariyê
- 5-Zimanek kurdewarî
- 6-Deriyek niştimanî
- 7-Qevdek xîret
- 8-Hinek bayê hişyariyê
- 9-Du tas ava Gola Wanê
- 10-Hemû ronakbîrên kurd (ên li welêt û yên li dervreyî welêt)

Çêkirina xwarinê

Kîloyek pincara şeref û namûsê bavêjin nav ava gola wanê û diika xwe deynin ser êgir. Qevdek xîret bi ser de hûr bikin. Dûre zimanekî kurdewarî bavêjin ser. Kulîlkên azadiyê di navkin. Ku xwarina we keliya tovê aşî û biratiyê li ser wer kin. Dawiyê ronakbîrên kurd di nav kin. Û deriyê niştimanî deynin ser devê dîzika xwe. Xemilandina şîvê: Divê bi zerzenga bê xemilandin Nîşe: Divê bayê azadiyê li agirê we bixe. Noş î can be. A ji we re welat

Lêgerîna peyvên winda

Rojhat ŞAXÎ

Sond li canê xwe xwaribû heta ku wê nebîne, wê li pey şopa wê biçe. De heta ku diçe bila biçe. Tew ji bo wî ne xem bû. Çi ku vê di kevçika dilê wî de lêxistibû.

Bi raman û hizreke ku li rê û rêbazên peydakirina vê yekê diponijî ve, giha ber qeraxên çem. Li kelekê siwar bû. Bi herka avê re xwe ber bi nav pêlên çem ve berda û giha deraveke tenik û derbasî wî aliyê avê yê din bû.

Yekî ta ji wî aliyê din, bi dengê bilind bangî wî kir û got:

- Hêvî dikim ku te lênûska wêneyê wê di nav de bûn, winda nekiribe?

Tenê mehek di ser vê sergêjiya ku barê mala wî dabû mîratê de derbas bûbû. Hema bibêje kun û koncal û veşartokên ku sehnekiribû nemabûn. Ji wê lênûsk û wêneyên winda tenê ev çend rêzikên bi destxetêke rind li pişta wêne hatibû nivîsandin, di bîra wî de mabûn. Digot "Te ez di koncaleke awirên xwe de çal kirim, bi wê nêrîna xwe ya şewhetberz û kujende"

"Hê ji ew wêneyê te yê bi awirên çavekî bandorker hatibû arastin li pêşangeha mejiyê min hilawistî ye" Bêhtir ji raz û peyama di vê hewkê de veşartî, mêjiyê wî xurandibû û ew dabû fikirandin. Nemaze ji vekirin û dirêjahiya her du tîpên "R" û "X" yên serê navê ku ev çend rêzikên razdar û zêdetir ji dilbijok a li pişta wêne hatibû nivîsandin, ew xistibû nava tatêl û meraqê. Di ferhenga xwe ya peyv û tîpên razdar de ji rastî van tîpan nehatibû. Di rê de pêrgî hevalekî xwe yê bi nasnavê "Feylezofê bédîran" dihat naskirin, hat. Dizanibû heta ku ew ji nav rûpelên ferhenga mejiyê xwe gotineke navdaran li bin çengên wî nexa, ji wî derbas nabe. Hê ji dûr ve kir minemin, bangî wî kir û ji wî re got, "Ho Rohat! De tu dizanî bê ka serok çî dibêje? Dibêje; Hestiyarî rewşa kesayetîya lawaz a giyanî ye. Wisa ji mirov bi qasî mezinbûna xeyalên xwe azad e."

Û çend gavan jê wêdetir cardin rawestîya û di ser milê xwe yê çepê re lê zivirî. Gotina xwe ya nîvcomayî, bi şeweyekî tinazî wiha berdewam kir.

"Ha ji bîra meke, gava te lênûska peyvên winda peyda kir li rûpela dehan, li benda duduyan binihêre. Teqez tu lê binihêrî ha! Di wir de cewherê peyvên razbar û dirêjî û vekirina tîpên "R" û "X" yê ji berfireh tîne ziman. Di nava wan rist û rêzikan de teqez dê tu yê pêrgî wateya wan peyvên ji bêtî. Baş dêhna xwe bide ser, rêgeha te ji tê de kifş e. Baş serwest be, paşê wateya wê ji min re rave bike, ez niha

diçim, paşê em ê hev bibînin, Xwedê alîkarê te be." Bi seriyekî ji geremola raza tîp û peyvên winda ve rêçika ku bi xwarovîçka di nav daristanê de dibihurî, bi gavên nerm û hizirdar dimeşîya. Ji şax û guliyan darên ku li ser rêçikê vebûbûn mîna sîwaneyê bayekî hênîk û henasedar digobilî. Ji wezn û gobilîna vî bayê hênîk û ji xişexîşa pelçimên daran, qerepere û xirecîreke dengên têkel bilind dibû. Te digot qey ji her gulî û gulpikên daran peyvên lê digeriya difiriyan. Hemû ji mîna pin-pinîkên rengîn li ser gulî û bilindahiya daran diketin û ber bi lênûska winda ve bi firê diketin û diçûn. Heta devereke diçûn, ji wir û wê de ji ber çavan winda dibûn.

Rohat bi vê rêçika ku di nav kûrahiyên daristanê re diçû. Bi awayekî şewişî û terpilîn hinekî li rê çû. Di navberê de weke ku dengê ji xeybê di guhê wî de bike gazî û jê re bibêje "Temenê te bi peydakirina wan raz û peyvên winda ve girêdayî ye. Di heman katê de ew egerên diyarkirina çarenûsa te ne ji, encax tu bi peydakirina wate û raza van tîp an ji peyvên re dikarî xwe ji vê yekê rizgar bikî." Wî ji bêtî ku wext ji destan biçe demildest ji riya ku lê diçû vegeriya û xwe hêdîka bera nav kûrahî û xewlegehên bajêr da.

Pirtûka ku tu caran ji nik xwe dûr nedixist, ku timî wekî rêbera navnîşanan bi kar dianî, ji berîka xwe derxist. Çend rûpelên wê di ser hev de qelaptin. Jê çend rûpel xwendin, bi alîkarî û rênişandêriya wan gihîşt devereke bervekirî û bi kaşê pêşberî xwe ve hilperikî û hilkişîya rastê. Li wê derê bi awirên bazekî sorgez ber bi baketina peyv û tîpên ku bi rîtm û ahenga muzîkeke hestewar a ji nav notayên muzîkjenekî/ê derdiketin. Ji gulpikên guliyan daran bilind dibûn û fira wan a ber bi lênûska peyvên winda ve temaşe kiribû. Lê dîsa ji der barê aqûbeta wan de tu tiştêkî kêrhatî hîn nebûbû. Seba çî be nema tê zanîn, lê hin tîp an ji peyvên ev rêwîtiya xwe nedibirin serî. Di nivê rê de diperisîn û şûfghartî dibûn an ji holê radibûn. Hin jê ji çî hêz û quwet di wan de hebûya hetanî şiyana xwe ya dawiyê li ber xwe didan û wekî xwe diman. Bi xirtoleyêke cihêreng ve digihîştin bîncihê. Ji hemû qerepere û hêwirzeyên bajêr dûr û li cihekî nayê zanîn, di nav rûpelên lênûskê de li hev dicivîyan. Ya ku serê wî tevlihev dikir serpêhatiya lênûska winda bû. Gava ku ev yek diket bîra wî, bégav dibû û dest û piyên wî sist dibûn. Balkêştirîn ji qad û devera ku lê cih digirt, lêgerîna wî ya peyvên winda, pêwendîya tîp û peyvên a bi hev re, xislet û taybet-

mendiyên cîwarên ku lê ketibûn nava tevgerê ew pir tengazar dikirin. Piştî ku li gelek kuçe û kolanan destvala hatibû vegerandin, wekî çareya herî dawîn jî êdî xwe spartibû ber bextê pirtûka xwe ya rênîşandêr. Di wir de bi navgîniya hin tîpên kilîl û efsûndar, deriyekî xêrê li ber vebûbû. Bi ronahiya vê yekê xwest lêgerîna xwe hinekî din berdewam bike. Lê di wê xwesteka xwe de zêde ne bi israr bû. Di helwest û hewldana wî de hinek sistahî çêbûbû. Li ber bendekê rawestiya, tê de hatibû nivîsandin ku “Hin caran mirov di nav neçariyekê de dixitime û kilekorî dibe. Lê peyv pêşengiya mirov dikin û mirov li dû xwe kaş dikin û radigihînin meqsed û miraza ku mirov bendewar e.”

Benda pey wê jî wiha hatibû dariştin “An riyekê bibîne, yan riyekê veke yan jî xwe ji nava rê bide aliyekî”

- Lewra ku armanc nebe çalakî, afirînerî sûdê nade. Ji bo wê jî têkoşîn û keftûlefteke bê payan pêwîst e. Hê negotibû “Ked tune be hezkirin jî, serkeftin jî bi dest nakeve” Lingên wî jî mêt ve ew gihandibûn serê duryanekê.

Wexta ku Rohat serê wê sibehê ji xew şiyar bû, bîstekê li wê yekê hizirî ku ev mehek sax e ku li pey vê yekê û seraqet lêgerîna lînûska peyvên winda berdewam dike. Wê sibehê jî heçko êdî gihabû ber sînore hêvîjêbirîna xwe ya dawîn. Di vê lêgerînê de wisa lê hatibû ku li ku derê dinîhêrî çav bi tîp û peyvên li hewa mîna pinpinîkan difiriyên, diket. Lewma jî êdî wisa lê hatibû ku bi çavên vekirî jî rewrewk û xewnerojk diditîn. Bi vê yekê jî êdî gihabû wê qeneatê ku çûna li dû vê yekê bê teşe ye. Divê mirov nede dû tiştê çûyî. Çûyîn ew çûyîn e. Tiştê çûyî jî êdî hew tê. Çûna li pey tiştê çûyî jî paletiya pûş pê ve ne tiştê e. Di nava wê demê de baş hinî vê yekê bûbû. Wisa jî baş bawer bû ku yekser çavkanî û jêdera pê ewle ceribînên ku di vê demê de bi dest xistibûn, bû.

Carekê li pirtûka di destê xwe de nihêrî. Paşê jî li katjimêra xwe nihêrî. Diviya piştî katjimêrekê ew û hevalekî xwe li rawestgeha otobêsan hevdu bibînin. Lê fikar û metirsiya wî ew bû ku dê hevalê wî pîrsa lînûska winda jê bike. Ew jî nema zane ka dê çi bersivê bidê. Hê li bersiva vê yekê difikirî, rabû bi lezgînî ji malê derket.

Rohat dema ku gihîşt rawestgeha ku dê otobêza hevalê wî lê raweste, hê gelek wext ji hatina otobêzê re mabû. Fikara ka dê çi bersivê bide hevalê xwe hê jî mejiyê wî dilebikand. Hê di nav hizirîna vê yekê de diçû û dihat piştî bîst deqîqeyan otobêzê kişiya ber rawestgehê. Ligel çend rêwiyan hevalê wî jî jê peya bû, bi dilgermî û hezkirin hev hembêz kirin. Piştî ku xweşbeşî bi hevdu dan, bêtî ku wext ji dest biçe hema ket tengala hevalê xwe, ketin ser riya ku dê pê ve biçûna. Axaftina xwe ya mayî jî ji meşê re hiştin. Bîskêkê şûnde Rohat mîna ku bixwaze tiştêkî ji Rojhat re bibêje gavên xwe hinekî sist kirin

û ji nişka ve, vegeriya pêşberî Rojhat. Zûr li nava çavên wî nihêrî û jê re got.

- Nebî nebî tu der barê lînûsk û wêneyên di nav de pîrsan ji min bikî. Çi ku lînûsk û tevî wêne mehek berê di rêwîtiyekê de winda kir. Ev mehek sax e jî cih nema ku min serî lê neda. Ji ber bandora wê derûniya min serobino bûye. Xew bi çavên min nakeve. Bi rojenîvro li ser wê xewnerojkan dibînim, xwe bi xwe diaxivim. Yanê şet û hişwindayî bûme. Bi bilêvkirina pê re êdî nema karibû gotineke din li ser axaftina xwe zêde bike, peltekî bû û gotin di gewriyê de asê ma. Heta ku gihîştin nivê riya xwe jî Rohat gotineke bi tenê jî nekir.

Rojhat bi gotinên xwe yên tîrwate û xwedî naverokeke hewisîner dest bi axaftinê kir û got - Ne xem e. Qet hewceyî xweqehirandinê jî nake. Tu dizanî helbestvanekî gewre çi dibêje! Dibêje “Arîşe riya pêşîn a ku mirov digihîne rastiye ye.” Lewra as-tengî bêyî pêlekan nabin. Beriya ku em bigihîjin nava bajêr, cihê civanê divê em rîyeke navîn a çareseriya vê yekê peyda bikin. Lê dibetiyeke wiha jî heye, rast e belkî me lînûska winda jî peyda nekir. Ku me peyda bikira dê gelek baş bûya. Çi ku ger ew di destê me de bûya dê di vê civanê de ji me re navgîniya hevnaşîn û sazkirina pêwendîyeke her dem û misoger bikira. Vêca li gorî ku ev yek di destê me de tune, ya li ber me tenê riya tîgihîştina cewherê rastiya peyama li pişt wêne hatibû nivîsandin e. Lê taybetmendî û xisleteke van hevokan a jîbîrnekirinê jî tîgihîştin e. Bi şeweyê derbirînê pir girîng e, ji ber ku ev tê wateya ravekirin û rewankirina wan. Her ji ber vê yekê pêwîst e berê gavekê em ji wan hevokan sîdê wergirin. Dê ev ji me re rêzanî û pêşevaniya gihîştina puxte û ferisandina şîfreyên peyvên efsûndar bike.

- Gelo dibetiya gihîştina puxte û ferisandina şîfreyan çiqas e?

-Niha hin mijar û nivîştên ku hê li tu deveran nehatine bihîstin û xwendin hene. Hin ji wan nivîştan ligel mizgînê ne. Ger em bikaribin xwe bigihînin hin bendên wan, heke ew jî di şapata dawîn de li ber avê neçûbin. Wê çaxê jî gihîştina raza peyvên winda ji sedî sed e. Çi ku em niha li ser hin beş û bendên ku di wan nivîştan de hatine nivîsandin, rêwîtiyê dikin. Bi destxistina hin ji van bendên pêwîst jî dê rêwîti û lêgerîna me ya peyvên winda jî hêsantir bike. Divê şewê û rêbaza gihîştina rastiya van yekan jî, ev çawa dibe bila bibe em ji mizgînê hin bibin. Bi qasî ez pê dizanim nivîskar û darêjvanê pîraniya van bendan ew bi xwe ye.

- Lê ku ew jî pêk neyê?

- Wê wextê tenê rîyek li ber me dimîne. Ew jî dê bi encama hevdîtîne re diyar bibe. Yan na dê ev lêgerîna me heta bi hetayê bidome.

- Nexwe lingên xwe sivik bike.

- Fermo, em dereng nemînin.

Tirs sar e

Omer DILSOZ

Ev beşek ji dilerzika lehengê romana “Berbiska zer e”

Berjen ê ku dê bête bêseroşûnkirin û piştî salan hestiyên wî û bapîrê wî di çalekê de bêne peyda kirin (ku van rojan em gelekî rast tên), bi dilekî kel û germ, xweziyên xwe bo jiyanê diçîne. Dilê xwe bi hêviyan bar dike..

Lê, tirs...Tîrsa ku hestiyên ji dihelîne. Sar tê û tê...

*Sar e sar e sar e
Keyla Şîn sar e
Her dem sar e
Sar e sar e sar e!*

Temam e. Vê carê tirsê ez jî girtim nav şamperên xwe: Erê erê, vê carê tirsên ku ev çendek e li doranên me lotikan diavêjin, bi ser min de jî hatine xwarê. Mirovê ku xeyal û xweziyên wî hebin, ditirse, kesê bengiyê çavbelekekê be, ditirse, insanê kar û barê ji emrê wî mezintir û girantir danîbin ber xwe, ditirse.

Ji ber hindê, wê kêlîka behsê mektebê hate kirin, ez tirsîyam. Ne ne, ne tenê ji bo wê, ez ji ber ku nêzî rastiyan bûm û niha ez gihîştîme ber siya Sînemê, ez wekî bilbilekî ku danişibe ser pelên sorgulekê wisa nêzî dilê wê bûme, ji ber hindê ditirsim...

Ditirsim ku ev xewna min a xweş li min bibe jeng û jehr. Ditirsim ku ev tîrsa ku pêl bi pêl li doranên me digere jiyanê li me bike merg û mirin.

Ez ditirsim. Erê erê vê carê ew tîrsa ku her kesî/e dixwest me jê biparêze, a niha ez di kûrahiya dilê xwe de seh dikim. Çu tişt wekî tirsê bi mirovî venade, ne koremarê nav bestan, ne dûpişkê reş, ne jî marê bi şax û qilocê ku bapîrê min gelek caran behsa wî dike.

Tirs, sar e; welê sar e, ku hema bêje yekser pê dime midê xwîna ku li rehên mirovî digere û jiyanê li nava mirovî digêrîne.

Erê erê, ez jî îro ditirsim û bi hemû dilan xweziyan dikim ku riyekê peyda bikim û xwe û hezkiriyên xwe ji vê gêjgerînkê tirsê bifilitînim û wekî teyrekî wan deynim ser baskên xwe û bibime warê şîn.

Erê erê, bapîrê min her behsa warên şîn dike, dibêje; li bajarê Navçiya li lûtkeya çiyayên bilind ku bi qasî Bestanê ne, li wan deran warên şîn hene. Bi-

huştê ser erdê ew dever in û Xwedê hemû reng û cureyên kulîlkan dane van çiyayan. Ji rexeke ve sîsn û alal, ji rexeke dîtir ve nêrgiz û beybûn, ji rexeke ve asmîn û binevş, ji rexeke dîtir ve gulzer û masîcark... Ax Sînema min ax, xwezî ji xêra Xwedê re min kari-bûya wekî Siyabendê Silivî destê te bigirta û berê xwe bidaya warên şîn; Feraşîn ji xwe re bikira mesken, an jî dilê xwe bispirta rex û doranên Geraşîn, heke li wê derê jî stara me nebûya me dê xwe di dilê Kelyaşîn de asê bikira û ew welatê ku her dem û demsalê sar e, me dê bi eşq û evîniya xwe germ bikira.

Gelo bihuşt jî şîn nebe?

Erê erê, mela Sadiq jî weha dibêje, berê hin ayetên erebî dixwîne, dibêje, “Lehom cennat-ul tecrî min tehtîha-l enharû xalidîne fiha... (Alî-Îmran 198)” û dewam dike, paşê jî mane dike û dibêje, “Xwedê gotiye, dê biçine bihuştê ku di nava wê re robar diherikin...” hindî bapîrê min behsa warên şîn dike, ku ew jî dibêje di nava wan waran re avsark û avzêlên zelal diherikin, her der şîn, her der bi gul û kulîlk e, her ev ayeta mela Sadiq têtê bîra min...Û niha, ez gelek xweziya xwe bi wan waran tînim, Kelyaşîn, Geraşîn, Feraşîn, Bestana şîn, Sînema çavşîn; çavên wê jî eynî wekî wan waran e, ne dihelê tirs li vî jarê dilê min bihewe ne jî xem û kulek nêzî min dibe. Ax Sîne canê ax, Kelyaşîna min, Geraşîna min, Feraşîna min; ax ax, bihuştê dilê min, ev tîrsa bêyom ji ku derê hat û li dilê min nişt!?

Ka ji min re bêje Kelyaşîn, tu dikarî tirsên min berteraf bikî û min jî li lîs û hisarên xwe bistêrî!? Erê erê, ez ê jî wekî teyrekî xwe dadim şikêr û zînarên te, erê erê, ez ê bêm hisarên te Geraşîn û xwe lê asê bikim da ku çu tirs nekaribim bi ser min ve bîn. Ez zanim, teyr û tilûr ji her zîndewarî çêtir dinasin ka tirs tiştêkî çawa ye, çimkî, ew bilind difirin û bilind dadinişin, ew li bilindahiyên ji hemû tirsan wêdetir difirin...

Ji min re bêje sîsarko, teyrê bilindahiyên, ka ji min re jî ez dikarim tirsên xwe dawêşînim û bêm xwe bispêrim hêlîna te!

De ka bêje tirsê, tu ji qesta hatî warê min ne wisa? Tu tenê hêlek î û dê biçî ne wisa?

Tîrsê!...

De ka bêje...

Bêj....

Berdêlî

Îsmâîl DÎNDAR



Bihara salê, pêşîn li deştê xwe dabû der. Tîrojên rojê, axa sor avis kiribûn; qaql diqelişîn, karwanên mîroyan palûteya xwe kom kiribûn, xiltê kor komên axê mîna rastkêşekê li pey hev rêz kiribûn. Xweza, ji nû ve, mîna kulîlkeke nazenîn dibişkuvî. Lûtkeyên Çiyayê Bagokê mîna çêlekeke belek, bi deqên berfê, reş û spî bûbû. Çiya, hîna kirasê xwe yê kesk li xwe nekiribû. Loma jî bayekî kur û har bi ser gundê deştê, yê li kêleka xetê ve didêrand.

Sêvê, li ser pêlekana herî jor rûniştibû. Berê xwe dabû başûrê gund, bi awirên tûj li nav her du têlên xetê, li nav zeviyê mîna ku pîvazan tê de biçînin, bi mayînan hatibû çandin dinihêrî. Dema guhertina nobedarên xetê bû. Serê sed metroyekî carekê, cîba leşkeran, li ber tabiyekê radiwestiya. Leşkerek jê peya dibû, yek lê siwar dibû.

Şûr devê Sêvê venedikir. Di deh salên zewaca xwe de, ji xeynî her duyên ku kiribûne bin axê, bûbû xwediyê pênc zarokan. Weke îro di bîra wê de bû: Bavê gotibû:

- Min keça xwe da şêran û min çêlika şêran ji kurê xwe re anî.

Dayikê gotibû:

- Ma keça min diçe maleke xerîb, ew bû bûka apê xwe. Xwezî bi wê keça ku him bûka apê xwe û him jî berdêliya birayê xwe ye.

Weke leyîstikeke ku her roj li nav benderan dileyistîn bû. Piştî dezgîranê di heman heyvê de daweta wan kiribûn. Her malekê keça xwe xemilandibû, kiribû bûk û anîbû. Di navbera her du malên ku bi qasî sed metroyekî ji hev dûr bûn, keçên xwe bi hev guhertibûn.

Ji kêliya ku mêrê wê bi kirina birayê wê hesiyabû, ketibû hundirê xênî; mîna jîjoyê ku goştê marê kerekor bixwe û giyyayê gûrîz bi dest nekeve, dikir ji kerban bibêje teq û biteqe. Hedan bi canê wî nediket; ji ber pencereyekê diçû ber ya dî. Destê xwe dikir kulm; li deriyan, li diwarên kerpîçî didan. Geh rûdinişt, geh radibû; li hundirê xênî bêrawestan diçû vî alî û wî alî. Dilê wî bûbû êtûn û hatibû dadan.

Demancêya di nav çar potan de pêçayî, ji qula pişt

derî derxist, kir ber piştê xwe. Hat li ber hevsera xwe rawestiya:

- Sêvê, ev deh sal in, tu li ba min î. Tu dizanî ku rojê ji rojên Xwedê, bi qasî serê derziyekê jî min dilê te nehiştiye. Tu, dotmama min û diya pênc zarokên min î. Ez te nadim bi sed keçên siltanan.

Sêvê, her du destên xwe kiribûn paşla xwe, bi her du çavên mîna du tîran; li nav her du têlan, li cihê ku par mayî bi qaçaxçiyên ve teqiyabû û du ciwanên ji gundekî Torê, di wê teqîniyê de bûbûn piçik û parî, ziq lê dinihêrî. Guhê wê li mêrê wê bû, her peyv, yek bi yek, bi ezmûna salên ku bi hev re borandibûn dipîvan û di hişê xwe de bi cih dikirin, loma jî dilê wê dikir gupegup.

- Tu dizanî, par van wextan bû; li darî çavên te û gelek kesan, min ji birayê te yê xezeblêhatî re got. Qedera Xwedê ye li serê te. Şeş heb keç li ser hev, kurek nebû nesîbê te. Were em herin, li nav camêran bigerin. Berî ku tu kal bibî, em keçeke şîrhelal ji te re binin, da ku tu bêwerd nemînî.

Sêvê kesereke kûr kişand, bi desmala di destê xwe de, hêstirên hûrik ziwa dikirin:

- Heyran Tacdîno, ma ez pepûka Xwedê çi me? Tiştê ku birayê min kiriye, berî te, bi mirina min e.

- Çi got birayê te? Got ku ez zanibim wê mal û milê min, bi neyaran bimîne jî, ez yekê nayînim ser dotmama xwe. Çi be, çawa be emrê Xwedê ye.

Lêvên wî, gewriya wî ziwa bûbûn. Dixwest, dengê xwe bilind bike, biqîre lê dengê wî her diçû kêmbû:

- Lê a niha çi kir? Piştî ku Xwedê teala lê hate rehmê, kurekî mîna beranekî dayê, diçe keça xelkê ji bo kêfa xwe direvîne. Ma ev ê jê re bimîne. De îcar, va ye ez diçim; heta ku ez keçeke xama, ji xwe re nekim bûk û neyînim, vexwarina qurtek ava Xwedê li vê malê, li min goştê berêz be.

Hê negihîştibû pişt xênî, Sêvê dawa xwe kir devê xwe û ji nişkê ve ber bi zeviyê mayînan ve beziya. Hîna lingê rastê neçûbû wî aliyê têla biçûk, destê cîranên ku ji serê sibê ve li wan temaşe dikirin, gihiştin nav her du milên wê. Ji barebara zarokên wê ku

li dora wê bûbûn xelek û dengê giriye wan diçû ezmanê heftan; gundî bi yek carê xuriyabûn wê derê. Piştî sê rojan, tirimbêleke spî, hat li ber deriyê ku Sêvê û çend pîrekên cîranan dikirin pistepist zîq rawestiya. Tacdîn, li pêşiya tirimbilê li kêleka ajoker, hewiya Sêvê Siltanê li paş, di navbera du pîrekên navsere de bû. Tacdîn, ji tirimbêlê peyabû. Şûr simbelên wî nedibiri. Bi awirên tûj li der û dorê nihêrî. Destê xwe avêt ber piştê xwe. Demançeya zîvîn ya ku bi destên zîvkerên suryaniyan hatibû neqîşandin; li ber tava rojê, çirûsk jê diçûn. Çardeh caran, li ser hev agir ji lûleya hesinî derket.

Her sal du can zêde dibûn li mala Tacdîn. Sala ku Siltanê bûbû diya pênc zarokan, deh zarokan jî, ji Sêvê re digotin dayê û hey dayê. Tacdîn, şekir dianî, rûn diqediya. Rûn dianî xwê diqediya. Xwê dianî, sabûn nedima. Yek nedigiha yê dî.

Bi her zaroka ku li malê zêde dibû re, diviyabû Tacdîn bêhtir here û were. Di hin şevan de, du caran binxet, du caran serxet dibû.

Rojêke payîza dawîn bû. Çiyayê Bagokê dîsa bayê xwe yê qerisî bi ser deştê ve didêrand. Gund û bajar di nav keftûlesta haziriya zivistanê de bûn. Heft roj bi ser çûna Tacdîn re bihurîbûn. Lê pêjnek ji binya xetê nedihat. Ku tariya şevê gund û sînora radest digirt, bêdengî radibû govendê. Şik û tirs, dihatin, li mala Tacdîn, dibû mêvanê Sêvê û Siltanê. Êvara îne bû. Sêvê û Siltanê weke her êvara îne, şîva miriyan li feqîrên gund gerandibûn. Pazdeh zarok, di nav kûrahiyên deryaya xewê de avjenî dikirin. Her du hewî, her yek li ber pencereyêkê rûniştibûn. Çar çav, bûbûn çar gur. Çar çav, ketibûn nav hewldaneke bi rik, dixwestin perdeya şeva reşetarî biçirînin. Çar çavên westiyayî ku hêvî ji wan difûrî, di devê besta ku Tacdîn tê re diçû û dihat de, li pêjnekê, li mizgîniyeke xêrê digeriyan.

Pêşî, fişeka ku mîna tava heyvê sînora seranser ronî

dikir, bêdengiya şeva payîzî ya qerisî û tarî çirand. Dûre, gule weke tava barana biharî, bi ser bestê ve barîn. Mişk û mar, teyr û tilûr, gur û rovî, kew û kîvroşk, heta bi kûrmikên di nav axa sor de; xwe di nav hêlîna xwe de, bi tayeke giya, bi kevirekî biçûk, bi kêstekên axê ku ji wan re bûbû stareyek ve hişk zeliqandin.

Bi zeraqa rojê re, gava cîpa eskeran, termê ku bûbû mîna bêjîngê anîn li gastîna gund danîn; Sêvê û Siltanê ji deqên li ser destên wî, ji wan xêzên ku bi hûnera qereçiyên çêbûbûn, Tacdîn nas kirin.

Ava bestê diherikî. Roj û heyv, demsal û sal li pey hev dihatin. Têla xetê diriziya. Porê serê Sêvê û Siltanê spî dibû. Leşker bi kamyonan gilokên têla bi dirî ya nû dianîn ser sînora. Sêvê û Siltanê li ber tava rojê li kêleka hev rûniştibûn. Ji hiriya salê gore dirîsîn. Siltanê, li nav zeviyê di nav her du têlan de nihêrî û got:

- Têla bêxwediyê sînora wan riziyaye, ew ê dîsa nû bikin.

Sêvê, ji têlê wêdetir, li nav zeviyê mayînan dinihêrî, li besta ku bûbû jehr û herikîbû deryaya dilê wan:

- Her tişt dirize, her tişt kevn dibe. Tiştêk bi wan xopanên mayînan nayê. Ma ev çi qiyamet e ûû...

Siltanê, li xwe û hevpara qedera xwe nihêrî, li riwê qermîçî, li nav çavên bê hêvî:

- Xwezî, her tiştê ku kevn dibe, nû bibûya. Her tiştê ku çû karîbûya vegeriya. Bila Tacdîno sax bûya, bila ji şevê heta bi şevê, gezek nan bi destê min û zarokên min neketa.

Sêvê, li hewiya xwe, li birayê xwe, li deh zarokên xwe yên ji mêrê mirî jê re mayî fikirî:

- Xwezî Tacdîno neketa bin axa sar, ne tenê yek, bila heft hewî li ser min bianiya.

Pembûreş

Gulistan BARAN

korê welêt
destê sibê
pembû dizî ji deşta Sirûcê
canik û ciwanik li hev civiyan
bi lez
daketin konên qereçiyên
kon
bela
wela
vala

kirin
siwarên xezabê
sê stûn sêwî man li newalekê
sê çar mîx kutan li gundan
kesî korê welêt nedît
xeyidî şevêş ji destê sibê
pembû reşiya
li bextê
neyarê qewmê xwe

Dehla gilyasan

Ehmet TARÎ

Di quncikekî odeya rûniştinê de min piştî xwe dabû balifekê û bi nîvbaldarî rojnameyek dixwend. Ji aliyekî ve jî, ecêbmayî, min li karê rojane yê diya xwe dinihêrî. Bi qasî saetekê, bi wê extiyariya xwe, hilkîşîya ser sedirê, ji vir, ji wir toz girt. Paşê daket, ruyê sedirê vir de, wir de kişand û dûz kir, balîfên wê tekûz kirin rêzê û sekinî tetmînkari li wan nihêrî. Dûre ket binê wê, bi awa ku di teşteke gupiyayî de li dû xwe dikişand, binê sedirê û raxerê odeyê giş malîşt. Dawiyê rismê bavê min ê rehmetî girt û toza wî fitosane malaşt, perdeya pacê kişand da ku tav nekeve hundir, bêhneke kûr girt û di ber min re giran giran meşîya, çû odeya xwe ya din. Li wir bereke kevn ji ser malnivînkê girt, anî û di navbera her du deriyên odeyan de raxist. Dîsa çû binraxek û balîfek anîn. Binrax li ser kilîmê raxist û balîf danî serê. Piştî re dolbenda xwe ediland, di ber xwe de dua kir û ji bo bêhnvedana xwe ya nîvroyê xwe li ser binraxê dirêj kir. Çend caran di ber xwe de peyîvî, xwe vir de, wir de quliband û axirê ker bû. Ez jî vegeiriyam ser rojnameya xwe.

Pir neçû, dengê hat. Min nihêrî, Sultana pîr li ber derî sekinîbû û bi çavên xwe yên nîvbîn li ber xwe mêze dikir. Ji ber ku berê li vir çend caran li çaderiyê likumîbû, li wir dûr dûr mêze kir, der û dora xwe bi destan peland û di şemûgê re bi fesal derbasî odeyê bû. Bi gavên tirsonek çû hêdika li rexê dayê xwe berda ser kilîme, berê xwe da wê û piştî xwe ya pehn da dîwêr. Wer dixuya ku ji min ne haydar bû. Tûrêkî kaxezîn ê ku bi xwe re anîbû, danî kêleka xwe û bi destan li virê, wirê fistanê xwe yê fireh xist, li tizbiya xwe geriya. Pê re jî bi dengêkî tijî evîn dikir pilepil:

“Îfrîtên bejinbihost. Li min îşkence dikin, pê kêfa xwe tînin.”

Bi peyva Sultanê re diya min serê xwe rakir û di nav derî re bi awayekî mekanîk bangî zarokan kir:

“Kuro xwîşka Sultanê rihet bihêlin, ez ê guhên we bikişînim ha!”

“Erê erê pîrê, me tenê ji xwe re dilîst!”

Mirov hema hema dikaribû kenê wan ê bi tiqeti bibihîsta; di dengê pîra wan a xilmaş de tu tehdît tune bû. Wan ê cardin bi Sultanê kêfa xwe bianiya. Extiyar, qelew û nîvnabîn, Siltan gava ku birayê min û jina wî diçûn karên xwe, li her du kurên wan miqate dibû. Zarokan ji wê pir hez dikir, lê carinan xwe vedişartin û extiyara reben di meraqan de di-

hiştin; zanibûn ku wê yê bigota qey ew daketine kuçeyê û di vê germa havînê de, di kolanên teng î xu-loxwar ên taxê de winda bûne. Lê dîsa jî her kengê ku wan ev tevn li serê Siltanê biristina, wexta ku xuya dibûn wê ew hambêz dikirin, li ber wan digeriya û digot: “berxên min hûn çima li pîra xwe wisa dikin, ma qey gunehê we bi min nayê.”

“Xwedêyo çiqas germ e,” Siltanê got û xweydana li ser eniya xwe bi paçikekî malîşt. “Mala te hênîk e, li hember em dişewitin. Min hemû derî û pace vekirine, lê cardin jî tu feyde nake, em dipêritin.” Dengê wê nerm bû, giran dipeyîvî.

Demeke direj serê xwe bera ber xwe da û bêdeng ma. Gava di mijara hewayê de tu bersiv ji dayê negirt, babeteke din vekir.

“Tu zanî, di van çend hefteyên dawîn de gelek kesên din reviyane hatine taxa me. Ji her derê tînin. Gişk bi tirs in, wek siyê digerin. Mirov ne haydar e ku li der û dora te ne.

“Himmm...”

“Erê weleh.”

Siltanê tizbiya xwe ji berîka xwe derxist, cardin xweydana xwe malîşt.

“Çend roj berê, êvarekê, me hew bihîst ku gedeyek diqîre, dibêje: ‘lambeyê vemirîne dayê, vemirîne yan na ew ê cardin werin!’”

“Ev çi ecêb e, keçê,” zîlamê min got. “Zarokên piçûk ji tarîtiyê ditirsin, lê evê hanê ji ronahiyê ditirse. Tenê Xwedê zane vî sebiyê feqîr çi dîtîye ku ew qas bizdiyaye.”

Duh êvarê diya lêwîk li deriyê me xist. Hatibû piçek şekir deyn bike. Erê weleh, bi serê zarokên te carinan tînin tiştên wek ta û derzî, niqurçekek xwê, hinek şekir an çend darikên niftikan deyn dikin. Min ji jînikê pîrsî gelo ‘ew’ kî ne û çima lawê wê ji ronahiyê ew qas ditirse. Rebenê serê xwe bera ber xwe da, nexwest tiştêkî bibêje. Tenê gava min pîrsa xwe ducar kir, serê xwe rakir, bi nermayî tenê got ‘zarok ji eskeran ditirse.’

Ji nişka ve Siltan hêrs bû: “Ma qey van rebenan çi kirine ku misteheqê wî halî bibin. Tiştêkî wan tune ye; ne beroş, ne nivîn. Ban nîn e serê xwe tîxin binî. Deh, pazdeh kes di odeyekê de dihêwirin. Gişk bê xebat in. Her tiştên xwe li paş hiştine, ji tatêla canê xwe reviyane hatine. Ma çawa dikarin zilmeke wiha li van feqîran bikin? Li vir li vî bajarê ezîm, gedeyên wan ên dubohust şev û roj di nav benderên zibilan

de ne, li tiştên bi kêr digerin da ku bi çend qurîşan bifiroşin, pariyek nan bibin mala xwe. Xwedê me bistrîne, berî niha me rewşeke wisa nedîtibû. Dûre serê xwe bera ber xwe da. Hema ku mabû bigiriya. Diya min tu reaksiyon neda, di xew re çûbû. Lê Siltanê ev nedizani. Dom kir: "Min ji te ra qala Sofî kir? Ew jî ji gundê xwe reviyaye, hatiye. Ev çend meh in ku di xaniyê me de ji xwe re odeyek kirê kiriye. Bi tu kesî re tekiliya wî tune, extiyarekî di halê xwe de ye. Lewma di der heqê serpêhatiya wî de heta niha me tu tişt nedizani. Axirê, ew jî bi zorê, me pê da gotin bê ka çi bi gundê wî kirine. Gund giş şewitandine, tiştê nehiştine û nahêlin tu kes vegere jî. Pir xeman dixwe û tim dîlîz e, feqîro. Gava jî me re mesele got çend caran çavên wî tijî hêsir bûn.

Li her taxa bajêr kesên wek Sofî hebûn. Di kuçeyan de bêmebest digeriyan. Carinan li çarşiyên li fêkiyên helîsî digeriyan, carinan jî di hewş û heywanên camiyan de, yan jî di quncê qehweyekê de bi saetan rûdiniştin. Tizbiyên xwe bê hay di nav tiliyan xwe de badidan, digevizandin. Giran û nerm diaxivîn.

Axaftina wan tim li ser jiyana gund bû: Bayê bîskan, şîrîna newalokan, serbilindiya hilanîna debereke bi bereket, pez û dewarên bijûn.

Her ku çîrok qat bi qat vedibû min dikarî jiyana Sofî baniya ber çavên xwe. Bi şev, ji bêkesî û stûxariya xwe haydar, Sofî li ser mitela xwe, li stêrên nas dinihêrî. Helbet wan jî wek wî ji bo gundên şewitî, bexçeyên tarûmar, zewiyên terk kirî û palên çiya yên bê pez şîn digirtin.

Xew bi çavên wî nediket. Heta derengiya şevê li ser mitela xwe ya tenik rûdinişt, car caran cixareyeke stûr dipêça û vêdixist, bêhneke kûr jê digirt da ku bêhna duyên egzosan û ya lexema ku di nav taxê re diherikî bîtepîsîne.

Şevêkê, dereng ji nişka ve tirseke şênber tax dagirt. Birek polês ketin kuçeya nabos a li paş xênî. Ji malekê xortek girtin, bi tehn û niçan ew kirin trimbêlekê û birin. Tu kesî ji tirsan dengê xwe nekir, ji polêsan nepirsîn bê ew bi ku de, yan çima dibin. Pir

neçû li jêr, di kuçeyê de, çend ciwan peyda bûn. Li ber deriyê mala Siltanê li hev civiyan û bi dengêkî nizm î sil peyîvîn. Gava deriyê trimbêlekê hişk hat girtin û dengê gavên tund ber bi wan ve hat, di kuçeyan de belav bûn.

Di hewayê tîr û germ a wê şevê de kelmêş vizîn, nexweşek naliya, gedeyek qîriya û aş bû. Pir neajot dîsa şev ker bû, lê sofî hişyar ma. Rûnişt cixareyeke din pêça û bûyer mitale kir. Di navbera sorayiya agir û dûyê cigareyê de hişê wî cardin çû ser jiyana wî ya berê, ya li gund: Rojên geş ên biharê, hêwaya bi bêhna kulîlkan dagirtî, dengê se û dîkan, kalîna berx û mihan. Lê tu teselî tune bû, ew giş xeyal bûn êdî, ji wî hatibûn girtin. Niha bê hêz û bê îtibar bû. Bi roj di kuçeyande bê armanc wek xeyaletekê digeriya, bi şev jî li ser xênî heta destê sibê rûdinişt, cixare dikişand. Nizanibû çawa wextê derbas bike. Dilê wî pê şewitî, bê deng giriya. Gava stêrk pelîsîn Sofî di xew re çû. Pir neajot bi dengê dîkekî hişyar bû. Guhê xwe dayê. Ev dengêkî nas, dengê gund bû, bangî Sofî dikir. Ji nişka ve kêfa wî hat; niha zanibû wî yê çî bikira. Êdî raneket. Wê rojê Sofî bê sebir li benda êvarê ma.

Gava çoyê xwe hilda wext êdî bûbû esir. Siltan li ber deriyê mitfaya xwe rûniştibû ji bo şivê firingî hûr dikirin. Gava sofî di hewşê re bihurî Siltanê ew ferq kir.

"Ez ê qasekê derkevîm," Sofî gotê. Siltanê li pey wî destê xwe lê kil kir, lê Sofî nedît, ji hewşê derketibû. Ji firnê nanek, ji beqalekê jî perçeyek penêr û çend firingî kirin û ew kirin tûrekî plastik û xist berîka kûr a şalwarê xwe. Av xist şûşeyekê plastik a piçûk û ew şûşê jî xist berîka xwe ya din û meşiya. Li nav bajêr di ber firoşkarên gerok, boyaxkerên solan, dikan û erebeyên zirihpûş re derbas bû. Polê-

sên zîqnêr di quncên nepenî de bi dizî li der û dora xwe dinihêrîn. Li rastekê tanqek sekinibû, eskerên li serê li dora xwe dinihêrîn. Di rûyê xelkê de tirs hebû.

Di nav qerebalixa gumreh de Sofî niha extiyarekî anonîm bû, bala kesî nedikişand. Haya Sofî jî ji dora wî tune bû, gund bangî wî dikir. Bi her gaveke wî re êşa dilê wî kêm dibû.

Wexta gihîşt perê bajêr roj êdî çûbû ava. Ronahiya lambeyên dikanan diavet ser kuçeyên bi çal û kort.



Zarok di nav tozê de dilîstin, jinên bi çarşev li hev civiyabûn, bi hev re dipeyîvîn û car caran bi zaro-kekî nehs re dixeyîdîn. Ronahiya sar a lambeyên floransan xizaniya hundirê qehwexaneyên taxê zêdetir dida xuyakirin.

Li tixûbê bajêr sekinî û li ezmên nihêrî. Wexta xwe baş hesab kiribû; gava dinya bû tarî ew ê bigihîsta gundê pêşîn ê li ser rêya wî. Heke esker bihatina pêşiya wî û jê bipirsiyana, wî yê bigota ew dihere wî gundî cem nasekî xwe.

Pir neçû gihîşt texma gund. Ji ber kûçikan rêya xwe jê dûr xist. Niha tarîtiyê ew ji sîxuran vedişart, çol û çol rihet meşiya. Bi darê xwe erda nedîbar a di bin lingên xwe de disehand û dimeşiya. Di ezmanê kesk î sayî de stêrk diçirîsîn. Sofî bişirî. Sekinî û li yên nas geriya: Koma Sêwîyan, Rêya Kadizan, Leyla û Mecnûn, Ew ê ji Sofî re bibûna rêber, wan ê ew bibira gundê wî. Hemû nedîtin.

“Hîna zû ye, ber bi nivê şevê ew ê gişk xuya bin,” ji xwe re got. Ji nişka ve xwe sivik his kir. Gavên xwe şidandin.

Demek paşê seh kir ku erd di bin lingên wî de her diçe bilind dibe: Çokên wî ji hewldanê diqerimîn, bêhna wî diçikiya. Çend caran kuxiya. Gava gihîşt ser tepelê hewrêz rûnişt û cixareyek pêça. Li dûr, wek sorahiyeke belav bajar dixuya. Jê vir de, nêzik-tir, ronahiyeş geş tixûbê qişleyê, pîr û pergala hundirê wê û holika spî ya nobedar diyar dikirin. Sofî bi hêrs tîlên titûnê yên ku bi lîvên wî ve zelikîbûn malişt, û tû kir erdê.

Hêdî hêdî û bi sebir Sofî di tarîtiyê de meşa xwe domand. Bi darê xwe pêşiya xwe û der û dora xwe dipeland. Gava rûxarê erdê piçekî diguherî, Sofî dilikumî. Carekê saeta xwe ji berîka êlegê xwe derxist, anî ber çavên xwe û zîq lê nihêrî, lê nikaribû tişteki bibîne. Milên xwe hejandin û saet dîsa xist berîka xwe. “Wexta saetê ne girîng e, ya Xwedê bes e niha,” got ji xwe re.

Careke din vesihî da ku bêhna xwe bigire û hinek xwarin bixwe. Gava hîv bilind bû û zinarên pal siya-yên reş avêtin rûyê erdê, Sofî zanibû ku edî divê lêxe ber bi jêr ve here. Gelekî meşiya. Westiyabû û kûr kûr bêhn digirt. Xwezyarê cixareyeke din, beriya ku hewla dawîn bide û xwe bigihîne gundê xwe cardin bêhna xwe da. Nêzî rêya gund bû. Li jorê rê, di bin siya zinarekî de rûnişt. Ji berîka xwe qutiya xwe ya kevn a gupiyayî derxist, vekir û bi zewq tî-tûna tê de bêhn kir. Bi tiliyên xwe yên stûr cixareyeke hostakî pêça, vexist û çend bêhnên kûr li du hev lê xist. Di heman demê de Sofî dengê wesayîtekê bihîst; ber bi cihê ku xwe lê veşartibû ve dihat. Di pala nêzî wî de lîrzeya motorê guherî. Sofî cixareya xwe di axa ber xwe de bi dozîni vemirand, xwe da paş zinarekî û pa. Kamyoneke eskerî giran giran

hilkişiya, bi ronahiya farên xwe zinarên bilind ên li paş Sofî malişt û di fetloka nêzî wî re derbas bû. Di bin tenteya keten de Sofî du rêz esker ferq kirin.

Sofî piştî xwe da kevirekî û rewşa xwe mitale kir. Her tiştên wî jê girtibûn; debara wî, jiyana ku diza-nibû, dost û hevalên wî. Bi ser de jî niha wan ev ji cixareyeke şîrîn mehrûm kiribû. Cixareyeke din pêça û hêdî hêdî kişand. Lê niha bi tedbîr bû: Gava bêhn li cixareyê dixist agirê wê di kefa destê xwe de vedişart.

Beriya ku rabe, ji şûşa xwe hinek av vexwar û cardin ew xist berîka xwe. Gelek westiyabû, lê hewayaya paqij, kerîya şevê û dîmenên esrarengiz ên di bin tavehîvê de westa wî sivik dikirin. Li cihekî dûr dengê roviyekî hat. Sofî meşiya.

Gava giha gund li rojhilat ezman êdî vedibû. Ji kêfa dîbişirî û di kolanên nas de dilezand. Betilîna xwe ji bîr ve kiribû. Bi çavên tijî hesret li der û dora xwe, li malan dinihêrî wek ku bawer neke ku niha li gundê xwe bû. Mîna zarokekî navê xwediyê malan yek bi yek bilêv dikir: “Ev xaniyê Rizgoyê Boşatê ye, ew yê Sebrîyê Ewênî ye, . . .”

Ji gund, ku berê bi dengê zarokan, ê ewtîna kûçikan, lê û lo ya gûndiyan û wîçewîça çivikan dagirtî bû, niha tu seda nedihat, bûbû xirbe û hemû lawir ew terk kiribûn. Şewatê, sivêrneken qarûş, gişk şewitandibûn û dîwarên kelpîç reş kiribûn. Çend ban tenê mabûn, ên din gişk hilweşiyabûn. Dîwarê mala Sofî nivî hilweşiyabû û ji cihê deriyê hewşa wî niha valahiyeke mabû. Sofî tê re li hundir nêrî. Riwekên yawanî her dera malê vegirtibûn. Kezeba wî şewitî. Berûberê dîwêr meşiya û di cihekî re keys dît, ket hundirê hewşa xwe. Ew niha li malê bû! Şewitî be jî, xerabe be jî mala wî bû. Li vir zewicîbû, li vir kurê xwe mezin kiribû. Li dora xwe nihêrî. Deriyê odeyê şewitibû û çî jê mabû ew jî ji çarçoveyê derketibû, pal dabû dîwêr. Nepixînek di sîngê wî de peyda bû û ber bi jor ve hilkişiya, kelegirî bû, xwe bi zor ragirt.

Sofî pir westiyabû û xewa wî dihat. Lê hîna nikaribû raketa. Çû ser Kaniya Camiyê, bi can û dil jê av vexwar. Paşê saqoyê xwe derxist, zendên xwe badan, rûnişt û destmêja xwe girt. Piştî çû ket hewşa camiyê. Li wir berê xwe da qibleyê, niyeta xwe anî û limêja sibê kir.

Piştî nimêjê dûr û dirêj dua kir. Dûre vegeriya mala xwe. Li wir saqoyê xwe kir balîf û li ser sekûya eywanê xwe dirêj kir. Pir najot di xew re çû.

Gava hişyar bû roj hatibû nivroyê. Roja germ di ezmanê sayî de li ser gund çikiyabû diçirîsî. Bedena wî hişk bûbû. Xwe vir de, wir de bada, tevzî da xwe û cardin meşiya çû ser kaniyê. Li wir şûşa xwe bi ava teze tijî kir û serçavê xwe şûşt. Niha hişyar bûbû û piştî nivroya xwe difikirî. Sebir nedikir, dix-

west hema wê demê here dehla xwe bibîne. Lê berê gerek biçûya camiyê nimêja xwe ya nîvrojê bikira û dûre biçûya ser gora jina xwe.

Kêliya ku ji nav malan derket, Sofî bi îhtiyad dest bi raçava der û dora gund kir. Li rasta ku niha lê bû û di bin roja geş de ew bi hêsanî dikaribû bihata dîtîn. Bi çavên xwe jî bawer nedikir, ditirsiya ku wan ê ew bişehitanda. Lewma car caran disekinî, çavên xwe zûr dikirin û bi nêrîna xwe dûrahiya dora gund dimaliş, dût û dirêj vedinihêrt. Ji nişkavê li binê mezela du şikl ferq kirin. Hêz da çavên xwe û li wan nihêrî. Du esker bûn. Sofî li paş tumîkekî li ser totikan rûnişt û bi baldarî li wan temaşe kir. Li bin darekê rûniştibûn û piştî xwe dabûn qurmê wê. Tifingên wan jî di destê wan de bûn, nedilivîn. Sofî fêhm kir ku ji german di xew re çûne, lê dîsa jî nikaribû xwe têxista riskê û biçûya ser meze-lan.

Çavên wî li dimenê, hişê Sofî ket mitalan, li rewşa xwe fikirî. Eskeran mala wî, gundê wî şewitandibûn, ew bê rûmet di kuçeyan de hiştibûn. Li Koreyê şer jî kiribû ji bo vî welatî, ji bo van zaliman, lê mukafata wî jî ev bû. Ma qey edalet bû ev! Ji hêrsan dilerizî. Ax xwezî ew cardin ciwan bûya! Ew ê eynî niha, vê deqeyê derketa serê çiyayan. Lê çi fêde êdî pir extiyar bûbû. Axirê hêrsa wî daket, hêz da xwe, rabû û hêdî hêdî ber bi dehlê ve çû.

Sofî ji dehla xwe pir hes dikir. Jixwe ji wî re tenê niha ew mabû. Dehl ji gund ne pir dûr bû, di doleke piçûk de bû. Li wir Sofî ji darekê çû yeke dinê. Bi destan nerm li qurmê wan xist û ew mizişandin. Hemû bijûn bûn û berê wan boş bû. Kêfa wî hat. Kulmek gilyas berhev kir, rûnişt û piştî xwe da kurmê birqok ê darekê. Bi ava şûşeyê gilyas şûştin û firavîna xwe û gilyasên xwe bi dîlşahî xwarin. Hê jî westiyabû. Piştî xwarinê xuşîna pelên daran, dengê çûçikan û tîna tîrêjên rojê ku di nav pel û guliyên darê re disefîn dihatin ser wî ew hêmin kirin. Demekê ponijî. Lê pîr neçû, haydarê sebeba hatina xwe bû, rabû bi baldarî cardin yek bi yek çav bi daran xist. Li ser tu yekê şopa xesara heşareyan nedît. Çûçikan jî ji bo wî gelek gilyas hiştibûn. Piştî xwe vekir, li bin darekê raxist û bi çoyê xwe li guliyên wê xist. Ji wir çû bin dareke din. Li wir jî wer kir. Li ser piştî wî koma sor her diçû zêde dibû. Fêkî wek yaqûtan dibiriqîn, kêfa wî dianîn. Wek zarokêkî dikir ji kêfan bifire. Wî yê ji gilyasên xwe hinek bida Siltanê û hevalên xwe yên camiyê û ji wan re bigota ku Xwedê li gund miqate dibe û gava ku wî xwest gundî giş dê vegezin û ew ê ji nû ve ava bikin. Ket xeyalan. Dimenên gund ên berê hatin ber çavên wî. Cardin dilziz bû.

Sofî penêrê mayî xist nav nên û têxist berîka xwe û rabû. Hewrikên li ser şalwarê xwe dawêşand û tûrê

plastîk ku tê de xwarin anîbû bi gilyasan tijî kir. Gilyasên mayî jî bê dil avêtin. Fêkiyên bihurî û helisî û şax û guliyên ziwa ku ji daran ketibûn ji dora daran dan alî û bi guliyekî şopa xwe malişt. Çû ser kaniya nêzî dehlê, şûşeya xwe vala kir û bi ava teze ji nû ve tijî kir. Piştî xwe tekûz qat kir, li nava xwe girêda, tûrê tijî gilyas hilgirt û bi îhtiyad berê xwe da gund.

Di hewayê sakîn de dengê gurmîniya perwaneyekê hat. Pîr neajot helikoptereke keskeqehweyî di ezmanê şîn de xuya kir. Nizm difirî û ber bi wî ve dihat. Sofî xwe avêt nava devîyan û heta ku di dûrahiya ezmên de winda bû, bi çawan ew şopand.

Li diyarê gund xwe teland û li aliyê mezelan nihêrî. Dengê helikopterê her du esker hişyar kiribûn. Rabûbûn, cilên xwe dadiweşandin. Paşê çekên xwe girtin û bi rê ketin. Pîr neajot li pozê girê mezelan ew jî winda bûn. Sofî niha dikaribû serbest bigeriya. Rabû û çû demeke dirêj li ser gora jina xwe sekinî, fatîhayek xwend. Bi hezaran yadaşt hatin bîra wî, hêsir di çavên wî de kom bûn. Çend caran di ber xwe de got “ax Gulê, ax Gulê de ka rabe halê min bibîne. Min kur jî winda kiriye, dibêjin li çiyê şehîd ketiye. Li vê dinyaya kambax ez tenê mame.”

Destê wî ji goristanê nedibû lê êdî wext hatibû, gerek vegeziya. Sofî dizanibû ku ew ê nikaribe di vî roja geş de rasterast bimeşe here bajêr. Bi îhtiyat ber bi zinarên nêzî gund ve meşiya, li wir di devê şikeftê de rûnişt û pa. Piştî roj çû ava ji cihê xwe derket û berê xwe da bajêr. Rêya wî dûr bû, lê niha dîlşa bû, xem nedixar û xwe serkeftî his dikir. Beriya azana sibehê gihîşt bajêr. Di nêrdewanê re hilkişiya ser xênî û ket nav nivînan. Pîr neçû ket xeweke şîrîn.

Siltanê çîrok giran giran got û qedand. Beriya ku rabe got:

“Sê roj berê sofî winda bû. Me ew pîr meraq dikir, me digot qey tiştek hatiye serê wî. Duh ji nedîtî ve xuya bû. Texmîn bike bê bi ku de çûye! Duh êvarê heta destê sibê em rûniştin û me guhdariya wî kir. Guh muh nedaye eskeraan, çûye gundê xwe û ji dehla xwe tûrekî tijî gilyas anîye. Min ji te re jî çend heb anîn. Va ye di vî turî de ne. Niha gerek ez herim, mirov nikare wan efrîtan bi tenê bihêle.” Piştî bi diwêr girt, hêz da xwe û rabû. Di şemûgê de cardin sekinî, dût dût li ber xwe nihêrî û bi baldarî di ser şemûgê re re gava xwe avêt û derket. Diya min di dema vegotina çîrokê de di xew de bû û yek bêjeyek jî ji çîrokê nebihistibû.

Evînên dîjîtal

Berfo BARÎ



Fîrûze, nişteciha wî bajarî bû, malbata wê sed sal berê ji welateki dûr koçî bajêr kiribû. Bav û diya wê karmendên dewletê bûn. Keçik hejdeh salî bû, diçû kolejê, di pola dawîn de bû. Mala wan li taxa herî nûjen a bajêr bû. Ji hemû navgînên modern hez dikir, diçû ku di berguhên wê de mp3 hebû, telefona wê ya destan ji ber guhê wê nedihat xwarê, gava pê nediavîvî jî bê sekin peyama dinivîsand û dişand ji hevalên xwe re. Li malê jî di oda wê de kompîtûreke herî bi lez dixebitî, hebû. Bîst û çar saetan bi înternetê ve girêdayîbû û vekirî dima. Keçikê, nedixwest gava here ser kompîtûrê îcar jî çend deqî-qeyan li benda vekirina wê bisekine. Di kolejê de di nava sê salan de gelek hevalên wê yên mêr çêbûbûn. Lê her têkilî sê mehan jî dom nekiribû geh wê geh jî hevalên wê dawî li têkiliyê dianînin û ji xwe ne xema her du aliyan bû jî. Digotin: “Ew çû yekî dinê” Keçikê di têkiliyan de tu sînor ji xwe re danetanî, bi şev hetanî derengiya şevê jî nedihat malê, carinan jî telefonî malê dikir digot: “Ez îşev li mala hevala xwe me.” Bi gelek kesan re ketibû têkiliya cînsî, bihevşabûn gelekî li xweşa wê diçû, hemû navgînên modern seks dianîn hişê wê, telefon, mp3, plazma, kompîtûr, peyk, avahiyên 30 û 40 katî, tabelayên lazer, ronahiyên loş. Nayê hişê wê ku tu partiyek çî li malan çî jî li dîskoyan dibû bê seks derbas bibûna.

Piştî dawîya demsala kolejê êdî ji ser kompîtûrê ranedibû, di rojê de bi dehan kesan di facebook û MSN'yê de nas dikir, ev qasî bala wê çûbû ser wan ku her dem xwarina ku diya wê dianî sar dibû. Rojêkê dişa facebook vekir peyamek ji hevalekî wê yê berê hatibû, hê peyama venekiribû nivîsê mêze kir, wiha nivîsandibû: “Pir xweş bû, min jî belav kir” Keçik li benda vîdeoyekê an jî wêneyekî bû. Peyam hîlbijart, peyama vebû. Piştî sernivîsa “Pir xweş bû min jî belav kir” digotê “A vê lînkê jêr bitikîne” keçikê lînkê tikand, malper piçekî hêdî vedibû pêşîn îşareta lîdana vîdeoyê dît, lê jêr jî digot: “Ji kerema xwe re çend çirkeyan bisekine, bar dibe” dûre deng

hatê. Bi bîhîstina deng re veciniqî ev, dengê wê bû, dû re dîmen xuya bû mêze kir, kesên di dîmen de yek ew e û yê din jî hevalê wê yê sê meh berî bû. Piştî partiyekê çûbûn mala lawik bi hev şabûbûn û vêga ew dîmenê şîltazî bi hezaran kesan re hatibû parvekirin, xuya bû hevalê wê, ew şev ji berê de amade kiribû. Hemû rêbazên seksê yên wê şevê bi kar anîbûn hatibûn tomarkirin. Li jêrî vîdeoyê beşa şîroveyan hebû, lê mêze kir. Bi sedan şîroveyan ku hevalên wê yên kolejê nivîsandibûn hebûn. Yekî nivîsibû, “Ma çî qisûra me hebû ku te neda me jî” yekî din jî nivîsandibû: “Me jî tehm kiriye” hinekan nivîsandibû: “Gerek ew keçik were kuştin” keçikê jî tirsan û ji hêrsê kompîtûr û telefona xwe girt, mp3 jî guhên xwe derxist. Xwe li ser doşekê dirêj kir. Çavên wê bi posterên dîwar ket, Serdar Ortaç, Tarkan, Madona wekî ku pê dikeniyen ji nişka ve rabû hemû poster qelişand. Çû dişa kompîtûr vekir. Endamtiya xwe ya facebookê betal kir û kompîtûr girt. Hêrsê ew girtibû, kaseya kompîtûrê vekir, ewilî ram derxist şikand dû re hardîsk, herî dawîn jî parçeyek ji qerta bingeîn şikênd û xwe dirêj kir. Şevê jî diya xwe û bavên xwe re got ku: “Xwezil em biçûna taxeke dinê” mehek şûn de bar kirin û çûn taxek din.

Şêxmûs, li wî bajarî karkerê avahiyê bû, çend meh berê hatibû. Ji kesên jê dipirsîyan re digotê: “Ez ji bo kar hatime” lê di rastiyê de ew ji ber gefên kontra yên dewletê reviyabû. Ji ber welatparêz bû û di axaftinan de azadiya Kurdistanê diparast, bi kuştinê gef li wî xwaribûn. Ew jî reviyabû hatibû cem gundiyan xwe di karê avahiyên de dixebitî. Kesekî şermoke bû, zû bi zû têkilî bi mirovan re danetanî, newêribû bi tena serê xwe li bajêr bigere. Hevalên wî jî nedixwestin ku pê re herin cihekî, ji ber ku carekê bi hev re çûbûn parkekê û hevalên wî li bejna keçikên ku derbas bûbûn mêze kiribûn, ew hêrs ketibû o gotibû: “Va ye du roj e hûn hatine bajêr, we qûna xwe ji derpê derxistiye, hinekî bi edeb bin, hûn qebûl dikin ku xelk jî wiha li xuşkên we mêze

bike?” Li ser vî kes êdî pê re dernediket derve. Lê roj bi roj vî bajarî bala wî dikişand û bi taybetî keçikên vî bajarî. Di dilê xwe de carinan diaxivî: “Ku ne ji namûsê bûya û min şerm nekira, ez ê ji li hevaleke keç bigeriyama. Tobe tobe ez dîn bûme, ez tiştên çawa difikirim heta ku jinek nebe helaliya mirov gerek mirov lê ji mêze neke.” Xeynî keçikan navgînên modern ji bala wî dikişandin. Kî didît telefon di destan de, mp3 di berguhan de, hemû kesan qala kompîturê dikir, qala peyaman, malpe- ran û wan avahiyên ku bi navgînên dijîtal û modern hatibû xemilandin. Wî, roj bi roj kaşî ber bi xwe dikirin. Êdî ew wilo bûbû ku hemû xewnên wî li ser wan tiştan bû. Geh dibû kompîturvanekî herî jêhatî, geh alavekî muzîkê a nû çêdikir, geh dibû xwe- diyê avahiyeke modern, keçik li dora wî diçûn û dihatin. Rojekê biryar da ku bi tena serê xwe li nav bajêr bigere, cilê xwe yê nû li xwe kir çû ber awê- neyê tû kir destên xwe, tûka xwe di porê xwe de rast kir, ji konê karkeran derket çû rawestgehê, otu- bus hat, lê siwar bû. Hemû kesan qertên dijîtal nî- şanî makîneyê didan û derbas dibûn. Kêfa wî gelekî ji vî awayî re hat. Lê qerta wî tune bû, derxist pere da ajovan. Gava bi paşîya otubusê ve dimeşîya serê xwe bilind kir û li rêwiyan mêze kir, ewilî keçikek ber bi çavên wî ket, keçikeke porzer, kincekî ber- singvekirî li ser bû, piçekî ji memikên wê xuya diki- rin, ew jî zoq mabû lê mêze dikir. Di nava du hestan de mabû, ji aliyekî ve şerm dikir ji aliyê din ve ew singê spî û ew du giloverên wekî berfê tişteke di dilê wî de dipirpitand. Serê xwe pêl kir û çû li palkur- siya pişt keçikê rûnişt. Di destên keçikê de telefon û di guhên wê de jî mp3, li milê dinê mêze kir keçi- keke din weka wê bi telefonê dilîst, li yeka din mêze kir wê jî li muzîkê guhdarî dikir, wî ji xwe re digot: “Dibe ku ez hatibim bihuştê, hemû tiştên xweşik di vir de ne, keçik û alavên dijîtal. Her cara ku li keçi- kekê mêze dikir ew dişiband keçikeke ji xewnên xwe. Otubus gihîşt navendê ew jî weka hemû kesan peya bû. Kî ji otubusê peya dibû dest avêt telefona xwe û dida ber guhê xwe, wî jî xwe ji bîr kiribû destê xwe avêt berîka xwe, qaşo wê telefona xwe derxista, lê tişteke nehat ber destên wî. Çavên xwe ji ser keçikan nedida alî bi taybetî rûyê wan û me- mikê wan, ku bala keçikan nekişandina gelekî li memikên wan mêze dikir. Lê ku bala keçikê biketa ser wî, serê xwe pêl dikir an jî berê xwe bi aliyekî din ve dikir. Çiqas jî dengê jê re digot: “Kuro ma tu dîsa xurifi yî?” Lê wî bi xwe nikaribû. Li vî bajarî şeş mehên wî qediyabû. Gundiyên wî wê biçûna malê, xwestin ku ew jî were malê, lê wî got: “Ez ê meheke din ji bimînim, pereyan bicivînim hê werim. Wan henekên xwe pê kir: “Malmîrat hê tu şerm dikî li siya xwe mêze bikî ma tu yê çawa me-

hekê bi tenê îdare bikî? Hêrs ket û got: “De hûn bi- cehemin herin çî karê we bi min heye? Hevalên wî çûn, ew bi tenê ma li wî bajarî, êdî ji du tiştan hez dikir; yek xew bû ji ber ku di xewê de di jiyaneke di- jîtalî de dijiya û di wê jîyanê de dibû mîrê dijîtal, tiştê dinê jî ew bû ku rahêle qerta xwe ya dîgîtal û nîşanî makîneyê bide û di otubusê de li keçikan mêze bike. Dilê wî diqilqilî, ew ji diaxivî: “Ez ha- time 28 salan, hê destên min bi destên keçik ne- bûye, hê ez du peyvan bi keçikekê re neaxivîme. Ma heq e ku her kesek keçek, jinek di milê wan de ye û bi hev şadibin lê yê min rebenê Xwedê pisîkeke min jî nîn e.” Jixwe gava diçû navenda bajêr hişê wî ji serî wî diçû, keçikan mêran hembêz dikir, lêvên xwe dixistin lêvên hev, wê gavê jê bû ku xwe bikuje. Digot: “Ez, çima li vê derê xwe wekî cewrikekî kûçi- kan hîs dikim? Dixwest ku bikeve cihekî veşarî û bigrî. Di ber pencereyên mixazeyan de li amûrên teknolojiyê mêze dikir. Kompîtur, telefon, mp3 her yek ji wan dibû keçikek û jê re dikeniyên. Bi saetan li mixazeyan digeriya û diket xeyalan. Êdî li ku derê telefonê an jî amûrên dijîtal bidîta, ji wî re wekî keçikan xuya dibûn. Û keçik jî li ku bidîta ew jî jê re wekî telefon an jî amûrên din ên teknolojiyê xuya dibûn. Dawiya mehê çûn ofîsa şîrketê ku pereyên xwe bistîne û here malê. Ket hundirê ofîsê, silav da û li benda hesapkar ma da ku hesabê wî bike û pe- reyên wî bidê. Du keçikên di ofîsê de bi hev re dia- xivîn:

-Leyla, ez ê êvarê ji te re di facebookê de vexwend- nameyê bişînim. Tu jî bipejirîne em bibin heval.

-Temam Selma, ev facebook çî qas bi kêr tê, gelek keçikên hevalên min ji xwe re di facebookê de heva- lên mîr dîtine, welehî ez ê jî ji xwe re bigerim. Wê rojê Semîhaya hevala min di facebookê de mîrekî nas dike, mîr dibêje: “Ez 25 salî me” qewl datînin ku hev bibînin. Selma, diçe mêze dike ku mîrik 40 salî ye vedigere malê dîsa.

Hesapkar pere dirêjî wî dike û dibêje, “Kekê te go- tiye ku ez ê derkevim, ev rast e tu yê herî?” Na bi- rako! Min biryara xwe guherand ez ê çend mehên din ji bimînim.

Êvarê dikeve nav livînan ew gotinên wan jinikên li şîrketê ji guhên wî dernayên. Bi dilê xwe re diaxive: “Xwezil, min jî bi kompîturê zanibûya, belkî min jî di facebookê de keçikek ji xwe re bidîta.”

Roja betlaneyê derdikeve devre. Dîsa otubus tê, ew siwar dibe dîsa qerta xwe ya dijîtal derdixe û nîşanî makîneya dijîtal dide derbasî paşiyê dibe. Dîsa gelek keçik ber bi çavên wî dikevin û tev jî di destên wan de navgîneke dijîtal heye. Gava li derdora xwe mêze dike çavên wî bi afîşekê dikeve, li ser afîş dini- vîse ku “Şaredariya me, ji bo gel qursên pişeyî bê pere dide destpêkirin. Ev qursên ku me li jêr nivî-

sandine wê di meha Adarê de dest pê bikin. Sekreterî, grafik, îngilîzî û qursa fêrkirina kompîturê.” Roja din ew naçe kar û berê xwe dide avahiya şaredariyê, serî lê dide, qeyda xwe çêdike. Jê re dibêjin “Mehek şûn de were.” Piştî mehekê diçe qursê, li derî dide, piştî ku deng dibêje “Kerem bikin” ew derî vedike û dikeve hundir. Hundir tijî ye tenê cihekî vala maye ew jî cihê wî ye. Ji bîst kesan 15 jin û keç in 5 jî mêr in. Ew dîsa bi gavên xwe yên şermokî dimeşe, lê dengê şikala wî jê re wekî ku hemû keçên wê derê pê dikeniyên dihat. Rûyê wî sor bûbû, axirê xwe gihand cihê xwe û rûnişt. Ji wî jî xwiya bû ku kesên wê derê bi tinazî lê dinihêrin. Lê çiqas dem derbas dibû şerma wî ji winda dibû, êdî bê minet û bê tirs diket hundir. Qurs gelekî li xweşa wî diçû. Mamosteyê wan pêşî bi danasîna kompîturê dest pêkir û dûre çawa tê vekirin, bernamêyêb Windowsê, eksel, word, powerpoint fêrî wan dikir. Piştî sê mehan qurs ber bi dawîbûnê ve diçû. Êdî hatibûn ser mijara înternetê, ji xwe ew jî li benda vî tiştî bû. Ji serweran, ji modulan, ji protokolên, ji modeman hetanî gerokan û dawiyê jî malperan... Mamoste pirsîbû: “Gelo tu herî zêde dixwazî bikevî kîjan malperê?” Wî gotibû “Facebook û MSN’yê” lê sedema wê diyar nekiribû. Ew gelekî têdigihîşt û pêş de diçû, mamosteyê wî timî ew ji kesên din re wekî minak nîşan dida. Di dawiya qursê de ew bi 95 pûanan bûbû kesê herî serketî, gelekî kêfa wî dihat. Êdî dev ji gerê berdabû û hemû dema xwe ya vala li cafeyên înternetê derbas dikir. Sê meh bû ku hevalên wî çûbûn gund lê wî qet nedixwest biçe gund. Piştî karê wê şirketê qediya, ew û hevalekî xwe çûn xaniyek ji xwe re li taxa herî xizan a wî bajarî kirê kirin. Wî jî kompîtoreke erzan, yeka ku berê hatibû bikaranîn ji xwe re kirî û înternet girêda. Heta derengî şevê di înternetê digeriya, gelek bernamêyên din jî fêr bûbû, hêdî hêdî xwe fêrî malpersaziye dikir. Hemû bernamêyên grafikê bi kar dianî, dûre corel draw û php’yê jî fêr bû. Gera wî ya facebookê jî bê sekn û dewam bû. Lê hê jî di nava listeya hevalên wî de keçikek tune bû. Wekî ku di xewnên xwe de dîtibû ew bûbû şarezayê kompîturê. Karibû yek bi yek ji hev veke û saz bike. Cîranan kompîturên xwe yên xerabe dianîn cem wî ji bo ku çêbike. Wî dema ku kompîtorek vedikir wekî ku keçikek be destên xwe diavêt bişkokên wê vedikir. Bi nazenîni destên xwe di paşila wê de digerand. Dît ku gelek kar ji destên wî tên, rabû dikana tamîra kompîturê li wê taxa xizan vekir. Lê çavên wî bêtir li ser facebookê bûn. Dixwest bibe bernamêşikên, mehekê li ser bernamêyên hekirbûnê xebitî û di wê de jî bi ser ket. Di profila xwe de wêneyêkî ji rengê kesk, sor û zer pêk belav kiribû. Yekî profila wî hek kiribû û peyamek nivîsandibû “Kurê orispiyê em di

înternetê de jî kabûsê we ne, me ev profil jî daxilî erdnîgariya mîsakî mîlî kiriye” gava Şêxmûs nivîs xwend gelekî aciz bû. Gelekî hêrs ket. Sond xwar û gotê: “Ez ê tola xwe bistînim.” Hefteyekê di facebookê de Şêxmûs kesê ku koma wî hek kiribûn şopand. Di pazdehê sibatê de profil û koma wî kesê ku ew hek kiribû bi dest xist û rêveberiya komê wî girt destên xwe. Di serî de çî dirûşme û peyamên nîjadperestî hebûn jê bir û peyamek nivîsand: “Ez ji van rengan gelekî hez dikim, min tola kesk û sor û zerê stend.” Di nava endamê komê geriya gelek navên keşan hebû lê herî zêde navê Fîrûze li xweşa wî çûbû. Jê re vexwendnameyek şand, roja din mêze kir ku keçikê qebûl kiriye. Êvarê facebook vekir ewil li kesên ku çalak in mêze kir, dît ku di nava kesên çalak de Fîrûzeyê jî heye. Silavek jê re şand wê jî lê veğerand. Fîrûze pirsî:

- Rêveberê koma me tu yî?
- Belê ez im.
- De baş e, min got qey yekî hek kiriye?
- Na, ma kî dikare?
- Lê te çima îro ev reng di profilê de bi kar aniye?
- Li xweşa min diçin, reng mehsûm in, ez jî ji he-nûniyê hez dikim.
- Te berê bi endaman re têkilî danetanî, lê îro tu ve-bûyî...
- Belê rast e, lê min biryar da ji îro û pê ve ez ê tê-kiliyê bi endaman re deynim.
- De baş e, bi xatirê te, hevaleke min hat em ê sibê an jî rojeke din dîsa biaxivin
- Oxir be.
- Wî ji wê rojê şûn de bi hêviya ku ew û Fîrûzeyê pêrgî hev werin kompîtur vedikir. Çar roj şûn de pêrgî hev hatin.
- Silav rêveber
- Li ser çavan
- Koma me ji min re wek koma me ya berê xuya nake
- Çima?
- Berê te her sibeh wêneyê ala welatê me par ve dikir, lê edî tu vê nakî.
- Rast e, min weşan hinekî guherand, ji bo kesên wekî te yên kubar aciz nebin
- Spas
- Fîrûze tu çî karî dikî?
- Ez amadekariya zanîngehê dikim
- Baş e, serkeftin
- Lê tu çî karî dikî?
- Dikaneke min heye ez karê kompîturê dikim
- Tamîr an firotin?
- Her du jî
- Li kîjan bajarî?
- Stenbol
- A ez jî li Stenbolê me

- Kîjan tax?
 - Etîler
 - Tu li kîja taxê ye
 - Ez li Beyoxlûyê me
 - Baş e
 - Ez, timî ji te re dibêjim rêveber, gelo navê te çi ye?
 - Şêxmûs
 - De baş e Şêxmûs, ku kompîtura min xera bû, ez ê bînim cem te
 - Li ser çavan, ez dikarim werim li mala te jî çêbikim.
 - Min, henek kir, ev qas dûr e, tu yê çawa werî çêbikî?
 - Na! Tişteke nabe ma qey ez bi piyan tîm?
 - Tu zanî Şêxmûs, ji xwe zû ve ye ez ji kompîturê dûr ketibûm, bavê min mehek heyê ku ev kompîtur nû kiriye ji bo ku ez dersê bixebitim.
 - Gelo çima tu jê dûr ketibûyî?
 - Qet nepirse, tişteke hat serê min
 - Çi bû?
 - Dev jê berde
 - De baş e.
 Mehek qediyabû ku ew Fîrûze bûbûn heval, dêhna xwe dayê ku meraqa wî ya ji bo kompîturan kêmbûye, êdî wekî berê tiştên dijîtal bala wî nakişînin. Rojekê di saetê facebokê, silav da Fîrûzeyê:
 - Merheba Fîrûze
 - Merheba Şêxmûs, ez dixwazim tişteke ji te re bibêjim.
 - Kerem bike
 - Ez, dixwazim te bibînim. Sibê dema te hebe ez werim Beyoxlûyê li cafeyekê em hev binasin.
 Wî, bawer nekir, digot qey Fîrûze henekên xwe pê dike, bersiv neda. Piçekî sekîni, Fîrûzeyê jê re nivîsand
 - Ma dengê min nayê te?
 - Belê Fîrûze
 - Te got çî? Te bersiv neda.
 - Bibore muşteriyek hat, min ew bi rê kir.
 - Belê. Ez jî dixwazim te binasim.
 - Wisa be sibê saet di 12'an de li Cafeya Dijîtalê em hev bibînin.
 - Temam, baş e.
 Wê şevê xewa wî nedihat, şevêqê zû rabû cilên xwe ûtî kirin, xwe şûşt, li ber awênayê biryantîn bi porê xwe da, ji heyecanê dilê wî wisa lê dixist, te digot qey wext e bisekine. Saet di 12'an de çû cafeyê, çavên xwe li Fîrûzeyê gerand, lê wê çawa hev du nas bikirina? Li maseyan mêze kir, di qorzika cafeyê de keçîkek rûniştibû. Yeka kej, tişortekî kesk li ser, zoq ma li wê mêze kir, mêzekirina wî bala keçîkê jî kişand, keçîkê jî li wî mêze kir, wekî yek ji wî re bibêje here ew e. Şêxmûs çû silav dayê.
 - Bibore ez te aciz dikim, lê ez li yekê digirim niza-

nim dibe ku tu be jî
 - Şêxmûs tu yî?
 - Belê
 - De baş e, ez jî Fîrûze were rûnê
 - Baş e ku min tu dît.
 - Ji bo min jî baş bû.
 - Tu yê çi vexwî?
 - Capîçîno
 Şêxmûs di dilê xwe de digot: "Helahela capîçîno çi ye?" Jê re capîçîno ji xwe re çay xwest. Dest û lingên wî li hev diketin, cara ewil bû ku ew qasî nêzî keçîkekê dibû. Ditişiya ku tişteke biqewime û vê roja wî ya xweş biherime. Ew heyecan û mirûzê wî yê şermoke gelekî li xweşiya Fîrûzeyê diçû, wê fêmkiribû ku ji bo wê ew ketiye vê heyecanê.
 - Şêxmûs, rihet be ez te naxwim. Kî dizane heta vêga çend hevalên te çêbûne, Xwedê dizane te bi van awirên xwe yê şermoke dilên gelek keçîkan helandiye, ne wilo?
 - Ê ez jî li gora xwe heme.
 Piçekî bîna wî derketibû, dît ku telefona destên Fîrûzeyê qet bala wî nakişîne. Lê Fîrûze, awirê Fîrûzeyê bûbûn agir û bi dilê wî ketibûn. Dixwest bibêje: "Tu çiqas xweşik î" lê ew hêz di xwe de nedît.
 Piştî telefona hev girtin rabûn ji cafeyê derketin. Çavên Şêxmûs tenê li ser bejn û bala Fîrûzeyê bûn. Heta rawestgehê bi Fîrûzeyê re çû, gava ku otubusa wê hat çiqas dixwest ku maçekê bide wan lêvên wê yê pambeyî. Hê ew wisa di xeyalan de bû Fîrûze destê xwe dirêj kirê û xatir jê xwest.
 Ew wekî ku baskên wî çêbûbûn. Li gor wî êdî evîndareke wî jî hebû li vî bajarî. Qet li mixazayên ku di ber wan re derbas dibû mêze nedikir. Gava wan demên ku bi tenê digeriya û zoq dima, li memikên keçîkan mêze dikir, ket hişê wî, ji xwe şerm kir, serê xwe xist ber xwe û heta malê li kesî mêze nekir. Di nava mehekê de 3, 4 caran hatin cem hev li cafeyê. Tevî ku ji devê her duyan gotineke wî derneketibû jî li hemû derdorên xwe belav kir ku evîndareke wî heyê. Û wêneyên bi hev re kişandine nîşanî wan dida, heta telefonî hevalên xwe yê li gund kiribû û qala Fîrûzeyê kiribû. Rojekê telefon lêket, Fîrûze bû digot:
 Ev çend roj in ku kompîtura min xerabûye ku tu karibî were çêbikî.
 - Temam tu navnîşana mala xwe bide
 - Rahişt kaxizê, li ser wê navnîşanek nivîsand û ber bi Etîlerê çû.
 - Li jêr pê li zengilê derî da, dengê pirsî: "Ew kî ye?" wî dengê Fîrûzeyê naskir got "Ez im, Şêxmûs" Şêxmûs li asansorê siwar bû çû qata heftan li derê wan da, derî vebû Fîrûze bi hemû xweşikiya xwe li hemberî wî bû. Çavên wê, lêvên wê Şêxmûs vedixwendin govenda evîne. Biştî xêrhatinê Fîrûzeyê

Şêxmûs bir odeya ku kompîtur lê bû. Xuya bû ji xeynî her duyan tu kes li malê tune bû. Wî kase vekir û lê mêze kir. Her carê tiştek diceriband di her ceribandî de wekî ku Fîrûze di hembêza wî de be û destên xwe li ser destên wê digeland. Di dilê wî de birûskên eşqê dîteqîyan, xwêdanek bi eniya wî ketibû, bi axaftina Fîrûzeyê re bi ser xwe ve hat.

-Gelo wê çêbibe?

-Jixwe min hemû tiştên pêwîst bi xwe re aniye, ez dibêjim qey fana wê şewitiye, him bêhn jê tê û dora wê jî reş bûye.

Fîrûze xwe xwar kir ku li fanê mêze bike. Şêxmûs serê xwe bilind kir, çavên wî bi singê wekî berfa spî ket. Sêvên ku serê xwe li bersingê wê rakiribûn hindik mabû bikevin ser hinarikê Şêxmûs. Fîrûze, ew awirên Şêxmûs dîtibû, hêdî bi destên wî girt, serê wî danî ser singê xwe û dest bi hevşabûnê kirin.

Piştî her du westîyan, Şêxmûs axivî:

- Fîrûze ez ji te gelekî hez dikim û dixwazim bi te re bizewicim.

-Zewicandin û ez ha!

- Çima tu kenîya?

- Dev jê berde Şêxmûs, rabe kompîtura min saz bike û oxir be ji te re.

Şêxmûs, bi kêf rabû kompîtur çêkir, rakir alavên xwe ku here, Fîrûzeyê xwest heqê wî bide, lê ew pê re xeydî.

-Ma pereyên çî? Cihê pereyan di nava min û te de

nîn e.

Fîrûzeyê xwest ku bibêje çima, lê negot.

Hefteyek bû ku telefonî Fîrûzeyê dikir, telefon lêdîket lê kesî venedikir. Ev hefteyek bû ku di facebookê de jî xuya nedikir. Êvarê dîsa facebook vekir, dît ku şîroveyek di rûpelê komê de nû hatiye nivîsandin. Sernivîsa wê wiha bû: "Pir xweş e me jî bi we re par ve kir." Şêxmûs, peyama vekir tê de nivîsî bû: "Vê lînkê jêr bitikîne wî jî tikand. Malperê hêdî vedibû pêşî îşareta vîdeoyê dît, li jêr jî digote: ji kerema xwe re çend çirkeyan bisekine bar dibe." Pêşî deng hat bihîstin, bi bihîstina deng re vecinîqî wî ew deng nas dikir, dûre dîmen dît. Fîrûze bû, ew yekî şilftazî bi hev re şa dibûn, ew vîdeo li malperê porno-yê hatibû barkirin û di binê de bi sedan şîrove-yên pornografîk hebûn. Şêxmûs, serê xwe xist nav destên xwe û digiriya, kulmek li monîtorê da şikenand, kabloya wê tev qetand, dest bi hewar û girî kiribû. Hemû alav dişkênand, di nav dikanê de rûnişt û agir berî dikanê da, di nava nivîsê de dikan şewitî û ew jî tê de. Heta agirkuj hatibûn ji wî û ji dikanê tiştek nemabû.

Fîrûzeyê şeveqê ji paşila hevalê xwe derket, rakir çenteyê xwe berî ku here rawestgehê çû rojnameyek kirî, li rûpelê pêşî mêze kir, wiha hatibû nivîsandin: Li kuçeyê teng agir bi dikanekê ket û xwediyê dikanê jî di dikanê de şewitî, guman heye ku xwediyê dikanê bi xwe agir berdabe, navê xwediyê dikanê jî Şêxmûs Doxû ye.

Du helbest

Şabeddîn YEŞÎLMEN

Ramanên serhildêr

Hêvî û hestên min
ên serjêkirî
ên difîftin, radipelîkin di bîra min de
lê êdî
dem nema
û te jî ji min re tu tişt negot
-ku li deriyê vekirî digirim-
ramanên serhildêr
nahewin
û nayên zincîrîkirin jî
çî bikim

Nenihêrin

Dem divê
Nenihêrin ku
Rastî şandin goristana vir û derewan
Nenihêrin ku
Çem û golê dilan ziwa bûne
Bila neşikînin hêviyan
çolên qewirandî
ku ba û bager
ku wan li hev dizivîrîne
Yên daristana çapemeniyê ne
ev ba û bager
vir û derew in
Bila neyê jibîrîkirin ku
Gel yeman e
Mîr yeman e
Bersiva hemû pirsan zeman e

Jin di helbestên Cegerxwîn de -II- Mehmûd BADILLÎ

5^{em} - Jin û jin û mal û perwerdekirina zarokan:

Bêguman, her jin dixwaze ku maleke wê hebe û di hundirê wê malê de bi karûbarên xwe rabe û gelek lêkolînên derûnî û civakî çesipandine ku dilo-vaniya li cem jinê ji ya li cem mêr pirtir û geştir e. Îcar di warê perwerdekirina zarokan de, jin dikare bêtirî mêr barê xwedîkirina wan hilgire û dikare bêtir hezkirin û dilovanî û zîziyê bide zarokan û li wan miqate be.

Seydayê Cegerxwîn bi rengekî berfireh li ser vê pîrsgirêkê rawestiyaye û bi nerîneke hemdemî helwesta xwe daye xuyakirin, ta radeyekê ku li ber jinê dikeve, ew jina ku em ji wê çêbûne, ew jina ku me neh mehan di zikê xwe de hildigire, ew jina ku me bi şîr û şekir xwedî dike ta ku em bi ser lingan dikevin û dîsa dev ji me bernade, belê dilê wê tim bi me ve ye, lê mixabin her dem em zordestiyê lê dîkin, bi sê peyvan em wê berdidin, bê zagon û destûr em wê girêdidin, gelo kê ji me re ev sitem û lêdana ku em li jinê dîkin bi qeyd û bend kiriye? dibêje:

*Bê bend û zîncîr tu tê girêdan,
Bi her sê pîrsan tu tête berdan.
Tu me neh mehan çawa hildigrî,
Kê dirist kirye ji bo me lêdan.*(19)

Di vî warî bi xwe de, Cegerxwîn bi nêrîna xwe kûrtir diçe, dema perîşanî û bindestiya jinê vedi-gerîne sûcê pêxemberan, mîna Zeredêşt, Îsa, Mûsa û Taha..., ta radeyekê ku xwe ji wan rastir û mirovtir dibîne ku doza jinê bi dest xwe bixe û wekhevîyê bi cî bîne, ev nêrîn jî li ser bingeha ku em tev ji jinê çêbûne û hatine cîhanê ava kiriye, îcar çima wê jin kêmtî me be? Ya dîtir, ne tenê kêmtî mêr be, belê îro kar tê kirin ji bo hebûn û dana jinê wînda bikin, ango bêtir wê mirovan çêdikin, li gorî xwendina min jî vê yekê re, ez dibêjim belkî Seyda li vir çêkirina mirovê alavî (Robot) destnîşan dike, yan pîrsgirêka jibergirtina mirovî (klonaj) li ber destê me radixîne:

*Te ji sînga xwe em afirandin,
Em bê te îro çêdikin însan.
Zardest û Mûsa, Taha û Îsa,
Tu bindest hiştin, kirin perîşan.
Min ê doza te ji wan bigirta,*

Lê tev wînda ne bin erd û ezman. (20)

Seydayê Cegerxwîn, jiyana jinê û têkiliyên wê yên bi mêr re, bi zarok û mêvanan re di hundirê malê de, bi rengekî berfireh destnîşan kiriye, wek rêberekî malbatî, tenduristî û perwedeker, rê dide ber jinê û jê re dibêje li vir wîha bike û li wir wîha meke, ev tiştê hanê baş e pê bike, ew tiştê din ne baş e jê dûr here...

Hema di warê şûkirinê de, dibîne ta ku jin û mêr bi şadî û kêfxweşî bi hev re bijîn, divê ku bi dilê hev bin, divê ku guncawbûn di navbera her du alîyan de peyda bibe, dûtir zor û sepanîna qelen û pereyên pir, ji aliyekî din ve, rêya hîlbijartina mêr ji jinê re dide xuyakirin, divê ku xwende û birûmet û kêrhatî be, divê qenc li wî bipirsî, divê ku hezkirin, zanebûn, serbilindî, ciwanî, serbestî û mîrxasî...t.d, di kesayetîya wî de peyda bibin:

*Bi dil şoke carek ne zor û qelen
Bi hev re bijîn wî bi şadî û ken
Tu çavên xwe berde yekî xwendevan
Belê tev bide wî bi sal û mehan
Dilovan û zana û serbest û mêr
Di rojên şeran de bibî mêreşêr.*(21)

Dîsa Seydayê Cegerxwîn di warê şûkirinê de barekî pir giran davêje ser milê jinê, ku xweşkirina têkiliyan di navbera jin û mêr de, di destê jinê de ye, ji wê dixwaze ku her dem dilnêrm û devliken be û hezkirinê bide mêrê xwe tenê, her li vir dide xuyakirin ku keçanî cuda ye ji jinîtiyê, ango her du ne rengê hev in, her yek ji wan taybetiyên wê hene û her yek xweristîya wê cuda ye ji ya dîtir. Û pîrsa hezkirinê teqez dike ku divê ji her du rexan ve peyda bibe û divê mêr têbigihê ku jin kaniya jinê ye û wê bi xwe ew aniye ser ruwê cîhanê û qet jin û mêr nikarin dûtir hev bijîn, her du hêl jî niyazdarî hev in, civîn ji wan re dermanê her tiştî ye:

*Çîqa jê re dilnêrm û rûgeş bibî
Bizane dilê wî bi te xweş dibî
Ji wî pê ve dil med kesî, bûyî jin
Ji her du rexan ve divê hezkirin
Keçanî, jinîti, ne rengê hev in
Di jinê de çekin bi hev re tev in
Di jinê de mêr zanibe kaniye
Tenê zanibe ko te ew aniye*

*Tu pingavê jîn û tu derya evîn
Belam çare nîn e, divêtin civîn. (22)*

Di vî warî bi xwe de, Cegerxwîn dest daniye ser pîrseke pîr pêwîst û girîng di jiyana jin û mêr de, pîrsa têkilî û çalakiyên tuxmî (sex) berçav kiriye, wek rêberekî derûnî – perwerdeker xwe daye xuyakirin, şîret û serperîştîyê li jinê dike ku bi şev kirasê tenik ê xewê li bejna xwe bike û ken û maçan bide mêrê xwe, dema nivînê xwe bi serbestî pê re berde û tu carî nehêle nivîn sar bibe, divê di hefteyê de bi kêmanî du caran bê germkirin:

*Kirasê tenik wergire lê bi şev
Tu bişkîne jê re şekir lê bi dev
Tu pê re xwe berde ji heftê du car
Nivîna te jê re nebî kevnewar. (23)*

Di derbarê perwerdekirina zarokan de, Seydayê Cegerxwîn dest daniye ser pîrseke netewî ya pîr girîng, ji jina kurd dixwaze ku zarokên xwe bi zîmanê xwe xwedî bike û her dem hezîkirin û evînê di dilê wan de biçîne û ta ku bi rola xwe ya durîst rabe wek miroveke perwer divê berê xwe bide xwendina toreyê û dil bi vîn û evînê dagirtî be. Bêguman jina mirovperwer û qenc û birûmet dê karibe qencî û başî û hemû tiştên bikêrhatî û pak bide zarokên xwe:


*Bi kurdî biçûkan,
tu xweş hîn bike
Bi nazî tu zarê xwe şêrîn bike
Tu tore bixwîne, bi tore bixwîn
Bere dil tijî bit ji vîn û evîn
Tu têxe dilê xwe mirovperwerî
Çi qenc e ku dûrî neqencî herî. (24)*

Di warê danûstandinê de, Cegerxwîn hinek xû û kiryanan nîşanî jinê dike, mînak: Kenê bilind û bi hîrehîr, oxîrkirina mêvanan, rêxistina pîrsan, hevpeyvîn, neristkirina peyvên pûç û xav, guhdarîkirin...td:

*Bi hîr-hîr meken ger bi xwe karibî
Heye ko tu carek jî naçar dibî
Bi mêvan re derkev bi şadî û xweş
Heta ber derî jî tu pê re bimeş
Tu pîrsên şêrîn, hingivîn jê re bêj
Bi nermî bibêje, ne dûr û dirêj
Tu peyvan mebêje gelek pûç û xav
Bihûne, birêse, meke wek çirav. (25)*

Seydayê Cegerxwîn behsa rêz û rawazên xwarinê jî kiriye, di vî warî de rêz û rawazên şarewerî û şaristanî nîşanî jinê dike ku di jiyana xwe de bi kar bîne:

*Xwe hilke, vemale dema xwarinê
Mexe nêv piyanek ku tev naçinê
Li ser masê ku deynê, bike rengê bûk
Li hawîr tu deyne piyanên biçûk
Li rast kêr û kevçî, çetel deyne çep
Biçûk çêke parî bicû xweş di gep. (26)*



bike:

*Biçûkan li ser kursiyan deyne tev
Eger ko nikarî bixwî têxe dev
Gelek başe zarok digel we bixwîn
Ku mêvan hebin çêtire ko nexwîn. (27)*

Di warê tenduristiyê de, S. Cegerxwîn di hebûna fêkiyên piştî xwarinê de xweşiyê dibîne, lê ku fêkî peyda nebe, piştî bîneke fireh vewarina çayê girîng dibîne, bêguman çaya piştî bîneke fireh li pey xwarinê, armanc jê ta ku xwarin sûdeya xwe li mirov bike, çiku lezkirin di vexwarina çayê de, wê

Dîsa, di rêz û rawazên xwarinê de, rê dide ber jinê ku hemû kesên malê tev zarokan bi hev re li ser xwarinê bi-civin, lê gava mêvan hebin divê piyanên zarokan cihê bin, ango divê bi mêvanan re nexwîn û heger zarok biçûk bin divê jin bi xwe wan bi xwarin

bihêle ku vîtamîn zû bişewitin û wek ku tê zanîn ji hêla tenduristiyê ve, vexwarina çayê bi xwe pir bi sûde ye, li gorî lêkolînên nûjen, bîreweriya mirov çalak û xurt û geş dike:

*Li pey xwarinê fêkiyek ger hebî
Bixun ko li we ev xweşî zêde bî
Eger ko nebî çayekê çêbikî
Bere bînfîreh bî ku dest pê dikî. (28)*

Hema dîsa di warê paqijî û tenduristiyê de, Cegerxwîn hinek xû û kiryarên rojane nîşanî jinê dike, çî li bajar, di kon de, çî li gundan be, wek şûştina dev û diranan, şûştina dest bi sabûnê, her gav berî û piştî xwarinê, ev kiryarên hanê bêguman di jiyana her mirovî de pir pêwîst in:

*Devê xwe bi firçê bişo xuşke can
Bila bê qerêj bin ziman û diran
Bi sabûnê destan bişo pak û rind
Li bajêr bijî yan li kon û li gund
Divê paqijî tim li bîra te bî
Ji bo di malê xweşî zêde bî. (29)*

Di hundirê her malê de, nemaze malên me kurdan, bûk, xesû, jinbir, jintî û hewî hene û nakokiya navbera wan kevnare ye, bi sedema wê nakokiyê gelek caran xirecir û girkişandin û şerên pir dijwar û tund di hundirê malê de çêdibûn, ew şer û xirecira nav jinan diket nav mêran jî û gelek caran bi encama wan nakokiyên êl bi xwe diketin rûberî hev û mêr jî hev dikuştin, îcar Seydayê Cegerxwîn sedemên wan nakokiyên li nezani û nexwendina jinê vedigerîne:

*Xesû, jinbir û jintî û ew hewî
Ji bîra xwe bavêj nema lew – lewî
Bi hev re bijîn wek xweh û wek bira
Di malê xwendin hebî ew çira. (30)*

Di warê şûkirina pêşdemî de, Seydayê Cegerxwîn dest datîne ser êşeke pir kûr û dijwar, ew şûkirina pêşdemî ku di civaka kurdî de bi zora pereyan çêdibû, bêtî ku guh bidin nêrîn û daxwaza keçikê. Di helbesta “Fatê û Mela” de, kêferateke gur di navbera Fatê û mele de li dar dikeve, lê Seyda keça kurd dide xuyakirin ku hişyar bûye û nema bi wî rengê şûkirinê razî dibe, keç bi xurtî di ber xwe de dide û doza şûkirineke guncaw û bikêrhatî dike ji hemû aliyên ve, ji hêla temen, dilxwestin û hezkirinê ve, divê ku her du alî jî bi hev razî bin, angê ne bi zora pereyan yek xwe li ser yê/a din bisepîne, wek ku mele dixwaze bi zora milk û pereyan û bi

zora fen û xapên xwe Fatê ji rê bibe:

*Ez mela me, dewlemend im
Şêxekî pir mal û gund im
Ez li her der serbilind im
Ey delala bisk ji dam!*

*Sed tîfû ev mal û zêre
Dê vekim singê ji kê re?
Min divê yek xortemêre
Ez di jînê nû gîham. (31)*

Seydayê Cegerxwîn li ser zimanê kevokê “Jina Jinbî”, dilsoziya jinê di rêya çîrokekê re berçav dike, ku jin tevde ne wek hev in, “jin hene û jinkok hene”, angê jinên bi rûmet û bi namûs û pak hene û jinên vajî wilo jî hene, naveroka çîrokê ev e: Dibêje mêtêkî xwest jina xwe biceribîne bê ta kîjan radeyê jina wî pê re rast e û jê hez dike, gava çû nêçîrê tebayek kuşt û xwîna wî di nav lingê xwe da, dema vegeriya malê, jinê jê pirsî ev çî xwîn e? Mêr got: Min tebakê xwe jêkir, (tebak li vir sembola endamê şermê nêrînê ye), angê mêtê wê bê endam ma, rabû jinê pozê xwe jêkir ta ku jê re dilsozî û rastî û hezkirina xwe bide xuyakirin:

*Go: Min yeke neçê kir
Min tebakê xwe jêkir
Jina wî ya pir ciwan
Jê re wê got: Dilovan
Li ser soza xwe me ez
Tu kes naçî li nav rez
Ewlebûnê ku çêkim
Divê pozê xwe jêkim
Pozê xwe wê zû birî
Zor da hewar û girî. (32)*

Li gorî wan çîrok û malikên jorîn, Cegerxwîn dixwaze bide xuyakirin ku rastî, ewlebûn, bawerî û serkeftina têtikiliyên jin û mêr, ne tenê girêdayî ne bi têtikiliyên tuxmî ve “sêks”, angê têtikiliyên tuxmî (sêks) bi tena xwe rûmet û ewlebûnê naparêze, belê bi wan têtikiliyan re, divê ku hezkirin û rastî jî peyda bibin, ta ku ewlebûn û rûmetî jî peyda bibin.

Di warê jîn û jiyana jin û mêr de, Seydayê Cegerxwîn bi nerîneke hemdemî xwe nêzikî gelek babetan kiriye, di helbesta “Berî xwarinê” de dibîne ku maseya xwarinê bê jin û şerab bi kêrî tiştêkî nayê, mase xweş e heger jin û mêr tevde li ser bi-civin û xweştir dibe gava şerab jî bi xwarinê re hebe, ji ber ku jin jî wek mêr e, dilbij e, pir paqij e, bi pêdiviya jîn û evînê ye, ji bilî vê jî, dipirse ka

mirov ji bo çi dijî? Her divê jîna xwe xweş û dilxweş bike û şerab bi xwe dihêle ku yek serxweş û dilgeş bibe, eger gihîşt sînore serxweşiyê, dê cihan tev bi wê/î xweş bibe:

*Zêde xweş e masa mezin
Lê kom bibin tev mên û jin
Masa xweş e ko jin li ber
Cama şerabê deyne ser
Masa ko bê jin û şerab
Hêja ye çi ey malxerab? (33)*

Di biwara xweşkirina jiyane de, Cegerxwîn li dîlan û sema ku jin û mên, keç û xort, bi hev re saz dikin li ber dengê daholê, dengê piyano, dimeyzîne ku ew pir pê dilşad û kêfxweş dibin, ji aliyekî din ve, wan radajo ku herin sînemayê û li filmên şoreşgerî û civakî temaşe bikin û bila jin di kursiyê pêşîn de rûnên û zîlam li yên paş, di heman gavê de pêşniyarê dide ku dûtî filmên Kovboy herin ji ber bandoreke wan î pîs û kirêti li ser bîr û mejiyê mirov heye:

*Saz pir xweş e, jîna cihan
Pê re xwe berdin negihan
Fîlmê şorişgêrî xweş in
Çendan ji wan em bê beş in
Fîlmên civakî bermedin
Çawa ko danîn pêvedin
Bîlêt bikir li cîkî baş
Lê jin li pêş û mên li paş
Win dûtî Kowboyî herin
guh medne wan, tev bê ber in. (34)*

Seydayê Cegerxwîn navê jinê di navê Xwedê bi xwe de dibîne, êdî wê xwişk, dê, heval û kevanî dibîne, îcar ji mên dixwaze gava ku tevde herin cihekî, sersalekê yan seyraneke yan serdanekê, divê ku jinê bide pêş xwe. Ev nêrîn bi xwe watereke wê yî kûr û dûtî heye, ne tenê bi rêzgirtina jinê ve girêdayî ye, belê pîrsa piştgirtin û piştewaniya mên ji jinê re destnîşan dike, ango gava ku ji hêla mên ve piştgêriya jinê bê kirin, dê jin rengê çirayê ronahiyê bide:

*Jinê bidin pêş xwe bira
Dibî tu bêjî min: Çima?
Ez ê bibêjim dê ye jin
Sûnda me her dem pê ye jin
Navê wê nû navê Xwedê
Xwedê du navin: Xo û dê
Şêrîn bide pêş xwe bira
Ronî bidî rengê çira. (35)*

Bêguman pesn û peyvên xweş û şîrîn dilê her mirovî geş dikin, Cegerxwîn berçav dike ku bi şev civîn bêtir bi jin û mên xweş dibe, ev pîrsa ha pir girîng e ku daye xuyakirin, îcar ji mên dixwaze ku divê peyva xweş û şêrîn ji jinê re bibêje, ta ku dilxweş û rûgeş bibe, wê gavê germbûn ji çêdibe, îcar ji mên tê xwestin ku wê têxe ber singê xwe û bi hev re gêra tevdanê bikin:

*Win dê li vir bighêne hev
Civîn xweş e, bêtir bi şev
Xanim bila dilxweş bibî
Wek kareva rûgeş bibî
Pesnan bike jê re tu rêz
Wê têxe ber singê bi hêz
Hilkişê Sîpanê Xelat
Ser deyne ber, ew pût û lat. (36)*

6^{em} - Jin û rûpoş:

Li gorî şopandina me di dîroka jiyana jina kurd de, di civaka kurdî de, ji me re tê xuyakirin ku jina kurd qet xwe di bin perdeyê de veneşartîye û rûpoş dananiye ber çavê xwe û heger rûpoş li hinek deverên Kurdistanê di dema îro de peyda dibe, bêguman ew di bin bandora ola îslamî de derbasî nav civaka kurdî bûye.

Li hember rûpoşê, S. Cegerxwîn nêrîneke tûj daye berçavkirin ku rûpoş sedemên êş û nexweşiyê ye di warê têkilî û danûstandinê de û yek ji sedemên paşketina jinê ye di warê siyasî û komelayetî de, rûpoş jinê ji civakê dûtî dixê û dibe kelem û bend rola wê dimirîne û ji aliyekî din ve, xweşikbûn û çelengiya wê ji wînda dike, ev helwest û nêrîna hanêw di derbarê rewşa jinê de hemdem e û hevbeş e bi helwestên gelek nivîskarên re:

*Sed tif li wê perda te bî
Ko daye ber xalên di qer
Dîna li piştê perde bî,
Peyda dikî êş û keder. (37)*

Dawî :

Li gorî vê ger û şopandinê di gulistana helbestên S. Cegerxwîn de, di derbarê babeta jinê de, ku armanca me jî ji xwe ew bû, ku em helwest û nêrînen Seyda li ser kêşeya jinê bidin berçavkirin û bê çawa û bi çi rengî xwe nêzikî vê babetê kiriye. Di bawerîya min de, Seydayê Cegerxwîn bi nêrîn û helwestên xwe di derbarê jinê de, yek ji wan helbestvanên hemdem tê hijmartin, nêrînen wî pir pêşketî ne, bi rengekî berfireh û bi mîxasî, gelek pîrs raxistine, kêşeya jinê li cem wî wek yek ji kêşeyên girîng û pêwîst xuya dike, baş guhdan pê

kiriye û qenc li ser rawestiyaye.
 dîsa, li gorî vê xwendinê, ji me re hat xuyakirin ku
 ta kîjan radeyê bandora felsefeya marksî li
 Cegerxwîn bûye, hema em dikarin bêjin nêrîn û
 helwestên xwe tevde di derbarê kêşeya jinê de li ser
 wê felsefeyê ava kiriye û di hin aliyên din de ketiye
 bin bandora ola Îslamî jî, lê bi tevayî em dikarin
 bibêjin nêrînên wî di derbarê babeta jinê de hem-
 dem û zanistî ne.

Jêderên lêkolînê:

- 1- Cegerxwîn, Prîsk û pêtî, Dîwana yekem, weşanxana Deng, 1992 Stenbol.
- 2- Cegerxwîn, Sewra azadî, Dîwana duyem, weşanxana Deng, 1992 Stenbol.
- 3- Cegerxwîn, Kîme Ez, Dîwana sêyem, sala 1973, Bêyrûd.
- 4- Cegerxwîn, Ronak, Dîwana çara, weşanên Roja nû, çapa yekem, sala 1980 Stokholm.
- 5- Cegerxwîn, Zend – Avista, Dîwana pêncê, weşanên Roja nû, çapa yekem, sala 1981 Stokholm.
- 6- Cegerxwîn, Şefaq, Dîwana şeşa, weşanên Roja nû, çapa yekem, sala 1982 Stokholm.
- 7- Cegerxwîn, Hêvî, Dîwana hefta, weşanên Roja nû, çapa yekem, sala 1983 Stokholm.
- 8- Cegerxwîn, Aştî, Dîwana heştê, weşanxana Kurdis-tan, çapa yekem, sala 1985 Stokholm.

Têbînî:

- 1- Helbesta: Keça Kurd, Rû 132, D: 1em (Prîsk û Pêtî).
- 2- Helbesta: Keça Kurd, Rû 132, D: 1em (Prîsk û Pêtî).
- 3- Helbesta: Keça Kurd, Rû 132, D: 1em (Prîsk û Pêtî).
- 4- Helbesta: Şêrîn, Rû 133, D: 1em (Prîsk û Pêtî).
- 5- Helbesta: Jin û jîn û jîndarî, Rû 42, D: 5 a (Zend - Avista).
- 6- Helbesta: Jin û jîn û jîndarî, Rû 48, D: 5 a (Zend - Avista).
- 7- Helbesta: Ax şûfêra kolxozê, Rû 119, D: 8 a (Aştî).
- 8- Helbesta: Jin û mêr bi hev re di nav karde, Rû 108, D: 5 a (Zend - Avista).
- 9- Helbesta: Keça kurd, Rû 103, D: 3 em (Kîme Ez).
- 10- Helbesta: Keça kurd, Rû 103, D: 3em (Kîme Ez).
- 11- Helbesta: Jin û jîn û jîndarî, Rû: 42, D: 5 a (Zend -

Avista).

- 12- Helbesta: Xortên demuqrat, keçên demuqrat, Rû 340, D: 2em (Sewra Azadî).
- 13- Helbesta: Heştê adarê cejna jinên demuqrat e, Rû 349, D: 2em (Sewra Azadî).
- 14- Helbesta: Leyla Şehîd, Rû 59 – 62 , D: 6em (Şefaq).
- 15- Helbesta: Jin û jîn û jîndarî, Rû 43 , D: 5em (Zend - Avista).
- 16- Helbesta: Jin û jîn û jîndarî, Rû 43, D: 5em (Zend - Avista).
- 17- Helbesta: Jin û jîn û jîndarî, Rû 45,46, D: 5em (Zend - Avista).
- 18- Helbesta: Jin hene jînkok hene, Rû 110, D: 6em (Şefaq).
- 19- Helbesta: Erê Xuşkê, Rû 174, D: 1em (Prîsk û Pêtî).
- 20- Helbesta: Erê Xuşkê, Rû 174, D: 1em (Prîsk û Pêtî).
- 21- Helbesta: Jin û jîn û jîndarî, Rû 43,44, D: 5em (Zend - Avista).
- 22- Helbesta: Jin û jîn û jîndarî, Rû 44, D: 5em (Zend - Avista).
- 23- Helbesta: Jin û jîn û jîndarî, Rû 44, D: 5em (Zend - Avista).
- 24- Helbesta: Jin û jîn û jîndarî, Rû 46, 47, D: 5em (Zend - Avista).
- 25- Helbesta: Jin û jîn û jîndarî, Rû 46, D: 5em (Zend - Avista).
- 26- Helbesta: Jin û jîn û jîndarî, Rû 47, D: 5em (Zend - Avista).
- 27- Helbesta: Jin û jîn û jîndarî, Rû 47, D: 5em (Zend - Avista).
- 28- Helbesta: Jin û jîn û jîndarî, Rû 47, D: 5em (Zend - Avista).
- 29- Helbesta: Jin û jîn û jîndarî, Rû 48, D: 5em (Zend - Avista).
- 30- Helbesta: Jin û jîn û jîndarî, Rû 48, D: 5em (Zend - Avista).
- 31- Helbesta: Fatê û Mela,) Rû 97, D 4em (Ronak).
- 32- Helbesta: Jin hene jînkok hene, Rû 116, D: 6em (Şefaq).
- 33- Helbesta: berî Xawrinê, Rû 160, D: 8em (Aştî).
- 34- Helbesta: Saz û Sema, Rû 166, 167, D: 8em (Aştî).
- 35- Helbesta: Çûna nav mala, Rû 157, D: 8em (Aştî).
- 36- Helbesta: Çûna nav mala, Rû 159, D: 8em (Aştî).
- 37- Helbesta: Ev perde çi ye ? Rû 446, D: 2em (Sewra Azadî).

wêne pirtûk

Dostanî

Cîhan ROJ



Heger ku hûn kurd bin, ger tevgerek we ya erênî hebe, yan jî hûn xwedî ferasetekê bin, di nav jiyana rojane de, îhtimal e ku we jî ji yekî rojavayî ev gotin bihîstibe:

-Hûn hîç naşibin rojhilatîyan!

Metîn jî heman gotin ji dostekî xwe bihîstibû; li zanîngehê dostekî Metîn hebû. Rojekê li kantînê li ser maseyekê bi dehan xort û keçîkek rûniştî bûn. Keçîka ku te digot qey ji perê rojê de hatiye li ser kîjan maseyê rûništa dibû sedem da bi dehan kesên demokrat, şoreşger, bêalî li ser maseya wê rûnên.

Kesên rastgir, oldar nedihatîn ser maseya wê, lewre li zanîngehê belav bûbû ku ew keçîk bi yekî re bûye yar, têkiliyeke cinsî di navbera wan de qewimiye. Her kes bi kêf û henek bû. Keçîk wekî her car bêdeng bû. Ji nişka ve dostê Metîn xwest pesnê Metîn bide:

-Hê jî bawer nakim, ku hevalê min Metîn rojhilatî be!

Kesên li ser maseyê jî ji bo gotinên dostê Metîn bi-selîmîn, kêr zêde tiştên wisa gotin. Her kes li bendê bû renekî xweş li rûyê Metîn bide der.

Metîn sipasiya wan bike! Metîn tê derdixist bê di wê kêliyê de rengê wî çawa tîrş û tal bûye, lewre dilê wî diêşiya. Axînekê xwe li wî da der. Her kes bi mereq bû. Metîn carê li keçîkê nihêrî, di wê kêliyê de li ber çavên wî, ew û keçîk du mexdûrên li ser maseyê bûn. Keçîkê jî bi ecêbmayî û mereq li Metîn dinihêrî. Dengê Metîn nedihat terîfîkirin. Xîtabî

dostê xwe kir:

-Dostaniya te xweş e, tu dostekî ji dil î, lê tu nizanî bê bi wan gotinên xwe çiqas heqaretê li min dikî! Heger ku li ber çavên te wekî însanekî baş û delal im û tu bawer nakî, kurd im ev tê wê mehneyê ku kurd ne însan in! Bi wê gotina xwe tu min wekî xwe dihesibînî û dostê min, ev jî tê wê mehneyê ku bê tu çiqas xwe di ser min re digirî. Dîsa jî naxwazim tu biêşêyî, lewre ew kesên ku tu naxwazî min bişibînî wan tiştêk fêrî min kirine, ew jî ev e, ji me re digotin her wext bila gotinên we mê bin. Ew, şîreta wan nahêle gotinên nêr derbibim.

Her kes bêdeng bû. Di wê kêliyê de kilameke ku Metîn gelekî jê hez dikir bi ser kantînê ket. Ji bo morala dostê wî xirab nebe Metîn rê li sohbetê guherand, çî kilamek xweş e, got. Kilam bi dawî bû. Keçîka li ser maseyê rabû, ber bi xwedîya kantînê ve meşiya. Deng ji maseyê hîlbûn:

- Ji min re jî çayekê bîne.

- Bila çaya min ne girtî be.

- Çaya bê şekir vedixwim.

- Ji bo alîkariyê werim?

Keçîkê tiştin ji xwedîya kantînê re gotin. Dîsa destvala ber bi maseyê ve hat. Hê nehatibû ser maseyê dengê heman kilamê dîsa bi ser kantînê ket! Metîn li keçîkê nihêrî. Kenekî zirav xwe li rûyê keçîkê da der.

Kilam qediya. Metîn û keçîkê rabûn. Baran dibarî. Bi awayek bêdeng meşîyan.



Şev e Dilşêr BÊWAR

Şevyara min şev e

Tu bi honandina guliyên lorika xwe mijûl î

Ez di hembêza bajarê sawa û tîrsê de

Li pey şopa hişê pîvoka pîrsê ketime
Û

Kanî û rûbarên hêrsê

Kêrên ko di piştê hespê bîranînê de
dadiçikînin

Şevê

Tu bi firkirina xwînê re mijûl î

Ey welatê paşvala!

Di bin siya bîst û heşt sêdaran de

Hê jî peyvên serjêkirî diperpitin

Kurtedosye

Peyv, biwêj an jî mamikên zaroktiya nivîskar

- Nanxwirê cilqetên: Tiralê ku bi tenê dixwe û ve-dixwe, rave dike.
- Derbê ciyê xwe girt: Kar û peyva bandorker. Tiştê ku tam li dilê mirov dixwe.
- Ji qewla te: Awayekî, "wek ku te gotiye."
- Bi sorikan ketiye: Carinan mecazî jî tê gotin, wek "li ser êgir e" yan jî "xwirî ketiye canê wê/î." Mînak, filankesê/o wek ku bi sorikan ketibe...
- Te caw çêkir: Tirs, qîlqile û panîkê rave dike; "Wehew, te (we) caw çêkir!"
- Ma mera bavê te tê de şikestiyê: Yeke/î ku li karêkî zêde bicehdîne. Mînak; a/ê ku zêde cixareyê wexwe; "Ma gelo, mera bavê te (we) tê de şikes-tiye!"

Feratê DENGİZİ

Ji ber ku ez li malê biçûkê birayên xwe bûm û di mala me de jî her dem û her gav ji yê biçûk dihat xwestin ku bi ya yê ji xwe mezintir bike, gotina wan neşkîne û li hemberî wan bi rêz be. Her wisa çî bibêjin jî, divê ew bike. Gava pîrika min dihat mala me û ev rewş didît; her car serê xwe dihejand, li min dinihêrî û digot:
- Erê lawo, ji berê de gotine; "Xwezî ez hestiyê ber lingê sa bûma û ne biçûkê bira bûma"

Helîm YÛSIV

Ji bilî serpehatî û bîranînên bav û kalên dilşewat, di şevên zivistanî de, Şahnameya Firdewsî, baskê Rustemê Zal, bi tîpên erebî û bi kurdî dihat xwendin û min di zarokatî û ciwantiya xwe de guhdariya wê dikir. Çîrokbêjê efsaneyan, Ezîzê Xirbîhî, ji 365 rojan, 330 rojan li mala me bû û çîrok digotin. Dîsa Sofîkê Kewa, bi destpêka biharî re, ji bo bazirganiya kêran dihat gundê me û li mala me dima. Lê, bi rojava re, li keviya qesrê, li ser sifirnekan rûdinişt û destê xwe dikir kerika guhên xwe û ji Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Şêxên Xiznewî û hwd. qesîde dixwend.

Medenî FERHO

Elûl melûl
Kemkê kelûl
Zayê mayê
Du zirnayê
Zirna çekê
Pê pa lekê
Weylo vînê
Hate vînê
Kete vînê
Îkram BALEKANÎ

Kuro lawo cendirme
Kumsor û ewe* sirme
Îşev were mala me
Te re bikim qêxane**
Dixwî naxwî kêfa te
Bav keçikê nade te

*ewe: eba

**qêxane: Xwarineke ku bi hêk û dimsê çêdibe

Mehmet ONCU

*Tu di beng û hêwanê xwe de biquirî
*Qeda li dinê keve
*Bi serê kalê Şêx Zilfî
*Min niviştê xwe li malê ji bîr kiriye, hûn herin ez ê vegerim malê
*Tu xêr û wayê nebînî
*Ma qey çor pê ketiye nikare
*Nanê qotikî (nanê bajêr)
Mihemed RONAHI

Reşik

Ez reşik im.
Stranbêj,
Û reqsyan ...
Ji tayê pembo nermtir...

Seglawî

Barana NÛR

Ew roja ku li gorên we yên hilweşiyayî li çavên min ên tîr bawernekirî û li zarokatiya paşla min de veşartî hilat.

Ne ber bayê demê ketim û ne jî germahiya axê xwende bû, ax cemidî di nav destên min de. Lê her dem lingên min li ser sêla sor, golrengê kenê zarokan bûn xeyalên min.

Wekî rêwîtiyeke bêdawî, riyeke mişt stirî, kefenekî nederûtî, mêvanekî dereng mayî bû ew meşa ber bi asoyê ve.

Ji devê şûr û tîla mû... Hilma hebûn û tunebûnê bû. Li ber vê rastiya bê perwa mûcîzeyek bû. Wekî ku goşt ji neynûkê, hilm ji striyê biqete, hebûn û hinava min di sibatê re, ew sibata dojhî re derbas bû.

Her rûbar xumxuma herikîna xwe dike çeperên xwe. Her çivîk bi baskên xwe firê dikeve. Bi hestên xwezayî digihêje refên xwe. Îro li ber lehiyên xwînê û li ser axa sor berfinên rengê pêşerojê aj didin. Û ez wekî nobedarekî jiyana nû û giyana azad di dilê deryayê de, bi her gava we û ajdana hinava we hêviyên xwe av didim. Hêvîdar im ji hêviya dilê we me. Baweriya we bi ronahî ye. Ew roja ku her elendê ji nû ve li asoya we hiltê. Ku êdî dikarin binexşînî her bihusta jiyane. Navê xwe û hinava xwe bi hemî rengên xwezayê. Awazekê saz bikin bi ahenga siruştê. Ji dengê bilbil, payîzokên şevên zivistanê, ji şûva nava erdan, bêhna sincan, siya tuyan.

Ku bi lêv bikin. Bi deng û bi reng bikin law-ijên me bihîstî, bûyerên nebîrayî û kulîlkên di deriyê biharê de mayî çilmisî û ne ajdayî.

Wek gotina dawîn, diyarî hevalbendiya bîrnebûyî dikin hestên xwe. Ew xewa sê hezar sal di dilê we de, ew rûmeta ku wekî stêrkan diçirûse li ser eniya we. Ger çî dixwaze azadî û hebûna xwe, diyar bike meşa we. Navê biryara we be.

Dibe ku biryarek ji xwînê, ji barûdê û birînên nekewiyayî be. An jî keskahiya pelên zeytûnan, zelaliya asûmanan û paqîjiya baskên kevokan be. Lê dizanim ku dê espere be li aso biryara we. Jiyanek damezirîye di dilê we de. Wekî polayê av dabe kokên xwe. Digihîjin destpêka zayînê û şaxên we ber bi pêşerojê ve diherikin. Loma jî ne di şepêlên lehiyan de winda dibe û ne jî bi agir dihele. Ew hêza ku ne dûr dibe û ne jî diqete, ji aşitiyeke bi rûmet, ji evîn û hevaltiyê. Ne jî bîr dike mirovperw-erîya hemdem, xemgîniya dilê gelan û dilmertaliyê.

Wekî sonda ku her dem li ser lêvên we.

Çendî dibêjin “sonda me dê bibe karwaniya me.” Êdî her tişt li ser vê rastiye dadimezire. Her rastî li ser çawaniya vê sondê diyar dibe. Ne wekî Mec-nûnên daristanan û çolan bijîn ne jî bibin cihên goran. Ji bo ku êdî ne çarenûsa pejirandîbe temenê qediyayî, xwîna zû rijiyayî û mirina erzan.

Min li ser darên sêpiyan komkirin jiyane qurmiçî, nêrînên cemidî, hêviyên dardemayî. Li çolteran kom kirin gulşemiyên biyanî. Loma lepên qirejî, dirêjî asîmanan bûn û hemû dirindeyan konê mirinê, barê nifiran li derdora me danî.

Dizanim, dixwestin ku hebûna min li ber deriyê we bikin kendalê mirinê. Werisê we dale-qînin li ber sêdara min. Ji zû ve derfetê mirineke dilêrî ji destên min hatibû girtin û ez ketibûm arafê. Tixûba nifirlêbûyî. Bêyî ku bijîm, bêyî ku bimirim.

Di çarmîxa gunehkar û lanetbûyiyan de, nava lepên çavên nûjen. Dirindeyên şaristanî, ji bo berxwedariya dilê we yê bi kovan, ji bo hêviyên neşikiyayî, xeyalên jibîrnebûyî jiyân.

Hûn wekî a niha vejîyan ji xweliya xwe, ji xwînê, ji zipika eniyên nepêjiyayî... lê ez hîna siwara bahozeke ji agir im. Li ser piştê min tevkujiyeke bêwijdan. Rengê ewrên Helepçe tê de heye û çarmîxa nûjen, giyajehrîna Sokrates.

Li ser dostaniyeke dîrokî, hemdoziyeke bêdawî û daxwaziyeke ji dilê min e hevaltî. Naxwazim bi ser siya sêdaran bikeve ser pêşeroja we û li ser hebûn û tunebûna min diyar bike çarenûsa we.

Min xeyalên xwe çandibûn li şaxê çiya, di bin ezmanê şikeftan de, li bin dara tawiyê. Bi dîtinek dîlzelalî. Bi gotinek rasthevalî meşiyam li ser deryaya ji agir. Bi dengê min de lîlandina jinan olan da. Di dilcoşiya ciwanan, peroşa dilan min hat ser ziman. Li ser gelek bedenên ciwan gur bû agir û gelek caran bi şopên xwe hejiyan. Êdî bes e, bez û herikîna we ber bi rojê. Lewre êdî her roj di nava dilê we de hil tê. Êdî mirin wekî mêvanekî reben û jar e li ber siya me. Rengê we di giyana we de, li ser hîmên xwe vedide. Lê bes, naxwazim çûyîneke nebihîstî, tunebûneke ne biyanî be dawîya me. An jî dawîya me bibe dahatûya we.

Ji bilî wê, gotina Che rûmeta eniya me ye û dê hebe û her tim jî dê hebe ji bo me.

“Sazûmana li ser zordestî û derewan pêkhatî dê tîk biçe. Û dê ser bikeve sazûmana li ser dadmendiyê pêk hatiye.”

Xaçepirsa Sînemaya Kurdî Amadekar: Ozgur AMED

Xaçepirsa sînemaya kurdî

1) Hisên Hesên Elî di 2006'an de bi kîjan filmê xwe beşdarî Mihrîcana Fîlman a Berlînê bû û xelata "Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî" stend?

- a) Herman b) Zero kîlometre
c) Û nêrgiz bişkiyîn d) Azadiya biçûk

2) Derhênerê navdar ê ku di sala 1964'an de li baja-rokê Akrêyê li Başûrê Kurdistanê hatiye dinyayê û di 17 saliya xwe de ji Başûr bar kiriye, li Îtalyayê xwendîye û paşîyê çûye Fransayê û pirtûkeke bi navê "Tîfînga Bavê Min" nivîsandîye, kî ye?

- a) Bahman Ghobadî b) Hamîd Dabaşî
c) Jim Kennedy d) Hiner Saleem

3) Zarê (1926) ji bo kurdan wekî filmekî yekemîn tê hesap kirin. Ji ber ku kurd cara yekemîn bûne mijar di sînemayê de. Gelo kê ev film kişandiye?

- a) Hamo Beknazarian b) Atom Egoyan
c) Harutyun Khachatryanin d) Sergey Parajanov

4) Filmê bi navê "Dema Jin Hez Bike" a kê ye?

- a) Halîl Êysal b) Jînda Baran
c) Yuksel Yavuz d) Mizgîn Mujde Arslan

5) Ji filmên li jêrê kîjan ne filmê Halîl Êysal e?

- a) Neynika bejnê b) Tîrej
c) Berîtan d) Bawce

6) "Zero Kîlometre" di 2005'an de li ser sînore Iraqê hat kişandin. Ako di nav film de karakterekî girîng e. Ev film beşdarî Festîvala Cannesê bû. Dema ku beşdar bûn, surpîrezeke mezin çêbû li ser xalîçeya sor. Di fonê de strana kê hat lêdan?

- a) Mihemed Şêxo b) Kawîs Axa
c) Meryem Xan d) Hesên Cizrawî

7) "Mozart" di kîjan filmî de wek karakter ket nav sînemaya kurdan?

- a) Nîvê heyvê
b) Stranên welatê dayîka min
c) Dema hespên serxweş
d) Çima kes behsa pisîkên Îranê nake

8) Li kîjan bajarî festîvala filmên kurdan tune ye?

- a) Londra b) Parîs
c) Hambûrg d) Lyon

9) Di filmekî ku di sala 1925'an de hatiye kişandin, cara yekemîn jiyana du parçeyê Kurdistanê nîşanî me dide. Gelo we meraq kir ev kîjan film e?

- a) Strike
b) Give Us Air
c) Grass: A nation's Battle For Life
d) In the Mountains of Ala-Tau

10) Navê wî Mano Xelîl e. Filmekê wî yê li ser gerîla-yekî ye. Ev gerîla ji Îsvîçreyê hatiye çiyayên azad. Gelo te navê vê xebatê bîhîstiye?

- a) David û Çiya b) David Tolhildan
c) David û Rê d) David Şoreş

11) Di nava Sînemaya Tirkîyeyê de cara yekemîn bi kameraya xwe rastîparêzî xistiye nava filmên xwe û behsa civaka kurdan kiriye, kî ev?

- a) Huseyin Karabey b) Kazim Oz
c) M.Hadi Sumer d) Yilmaz Guney

12) Filmekî navdar e. Gelek xelat girt. Film li ser jiyana rojana ya kurdan ên ku komkujiya Helepçeyê dîtine ye. Derhenêr Jano Rosebianî ye. Navê filmê wî çi ye?

- a) Zarokên Halepçê b) Jîyan
c) Sor d) Hêvî

13) Ji nav van filmên jêr, kîjan ji serî heta binî bi kurdî ye?

- a) Meş b) Pres
c) Azadiya Wenda d) Vagona Reş

14) Ev film li ser jiyana kurdên ku çûne Ewropayê ye. Mijar penaberî ye. Vî filmî zagona penabertiyê di makekanûna Fransayê de guherandiye. Gelo hat bîra ku em behsa kîjan filmî dikin?

- a) Close Up Kurdistan
b) Fratricide
c) Welcome
d) The Last Seasons Shawaks

Bersivên xaçepirsa Mihemed Şêxo: 1-C, 2-B, 3-A, 4-A, 5-D, 6-A, 7-C, 8-D, 9-A, 10-B, 11-D, 12-C, 13-A, 14-C